## Kela Berxwedaniyê

# KATO

**Erdal Dêrik**

**Weşanên paristina gel (HPG)**

**Kela Berxwedaniyê**

# KATO

**Erdal Dêrik**

**Dîroka çapê: Gulana 2010**
**Cihê çapê: çapxana Roj**

## Pêşgotin:

Her serpêhatiyek ji serpêhatiyên gerîla, asoyê mirovan bi xwe re berbi rastiya jiyana gerîla ve dajo. Ew jiyane ku ji her rexê xwe ve tê heskirin û ecibandin. Her weha bi tevna xwe ya sipehî û şanaz, ji bona her mirovekî azadîxwaz û disoz bûye cîhûwarê vîn û evîneke azad. Ji lewra dema ku behsa jiyana gerîla tê kirin, di serî de rêhevaltî, xweşbînî, paqijî, xozanî û her weha berxwedan û qehremanî tê bîra mirovan. Ji ber ku jiyana gerîla di nava xwe de her tim rastiyên jiyana bi ked, xwîdan û xwînê hatî afirandin dihewîne. Vê jiyanê di hiş û ramanê her azadîxwazekî de şûneke rengîn hiştiye. Gerîla di her warê jiyan û xebatê de bû ye deng, reng û vîna gelê Kurd. Bi xwe re civakekî nû hûnandiye û afirandiye. Ango mirov dema tevlî vê jiyanê dibe, ji nûve fêrî rastiya xwe ya nepenî û wenda dibe. Weke zarokekî ji nû ve çavê xwe li jiyanê diveke û wan rastiyên heyî, yek bi yek weke tîjikên rojê himbêz dike.

Her weha jiyana gerîla weke wêneyekî ji nû ve hatibe xêzkirine li ser textê bêriyê û her rêhevalek ji evîndarê weletê agir û rojê dixwaze li xweşikbûna vî

wêneyî temaşebike. Ji ber ku çavê mirovan jê têr nabe. Her tim bi mirovan re dikene û dibeşişe. Weke din rastiya herî balkêş a vê jiyanê ewe ku mirov bi xwe her tiştê xwe peyda dike. Ji tinebûnê her tiştî diafırîne û xwe xwediyê vê jiyanê dibîne. Her gav hazir û amedeye ku ji bona vê jiyanê û van rastiyên heyî canê xwe fedabike. Bi hişmendiyeke nû gihiştî û azad, kesayeta xwe li gorî vê bawerî û felsefa heyî berbi guhertin û veguhertinekî nû ve dibe. Dijê hemû rengên jiyana desthiladarî, berjewendîparêz û mêtingeriya pergalên serdest e. Weke din her kêliyek ji kêliyên vê jiyanê di nava xwe de gelek macereyan dihewîn e. Her serpêhatiyekî bi serê xwe destane û evsaneyekî zindî ye. Her tiştê heyî di nava vê jiyanê de, bi xwe re coş, heyecan û arîşe yê avadike.

Gerîla bi hevalbendiya xwe nav û deng e ku mînakên wê di ti şoreş û tevgerên cîhanê de nehatiye dîtin. Ji ber ku gerîla xwe bi vê rastî, xweşikbûn û diristbûna hevalbendiya ku ji her milî ve jiyanê dixemilîne, xwe li ser piyan digre û her dem mîna avzêmekî xwe nû dike. Ev giyana hevaltiyê jî ji her gav û çaxan bêhtir wateya xwe û hebûna xwe di her kar û xebatê vê jiyana bedew de nîşan dide.

Ji ber vê yekê, nivîskarê me Erdal Dêrik, evîndarê Kurdistanê, rêwiyê rêya rojê û şervanê Katoyê, xwestiye bi rêya van serpêhatî û bîranînan rastiya vê jiyanê bîne ber hizrên me û me bixwe re bibe wan kêliyên efsanewî. Bi vî awayî çeper bi çeper pêşbaziya mirin û jiyanê di nava rûpelên vî nîvîsê de meyandiye. Bi henaseya azadîxwazekî û bi pênûsa evîndarekî, ji me re vê jiyana tijî hêvî, vîn û berxwedan bilêv dike. Weke nasnameya her azadîxwazekî, radixe ber çavan. Ango me bi xwe re





Hîna em li navsera Katoyê bûn. Dem jî ber bi êvarî ve diçû. Wê demê me jî cenazeyê tevayî hevalên şehîd sipartin axê. Wê demê hevalek mizgîniya hatina hevalên din da. Heval ji Mezrayê derketibûn û ber bi Katoyê ve dihatin.

Me teva berê xwe da hevalê ku dihatin. Her çiqas dilê me hatina van hevalan kêmekî şad bû jî, lê êşa veqetîna hevalên şehîd rê nedida ku coşa me bibe bişirîna li ser lêvên me. Min pir meraq dikir ka van hevalan çikirine û çawa paşde kişiyane. Hevalên ku hatibûn, dizanibûn ku gelek heval qutbûne û wê werin baregeha berê. Me dozdeh heval tevlî karwanê şehîdan kir û bi hatina ewqas hevalî jî, me berê xwe da asoyên dûr û kûr da ku em rojên azad hemêz bikin…

ji Başûrê Rojava bû. Xwişka hevalê Îsmaîl bû. Hevala Nêrgiz jî bi eslê xwe ji Sêrtê ji herêma Garisa bû.

Belê, wekî min anî ser ziman hemû hevalên şehîd bi xwîna xwe ya pakrewan xaka Katoyê careke din av didan. Dijmin jî wekî her car nêzîkbûnê xwe yê hovane û derveyî mirovahiyê bi ser cenazeyê hevalan de dida meşandin û cenazeyê hevalan parçe parçe kiribûn. Destê wan jêkirîbûn û çavên wan jî hatibûn derxistin. Tişta ku kiribûn ne di huqûqa şer û ne jî di tu hiqûqan de hebû. Bi çavnebarî wekî gurên har tevdigeriyabûn. Dîmenên ku dihatin ber çavên me, kîna me ya tolgirtinê bilindtir dikir. Lê di wê kêliyê de tiştekî ku me bikira tunebû, encax û encax me erka xwe ya hevaltiyê ku xatirxwestina dawiyê bû û di cihê ku ew lê şehîd ketinde, me li wê derê goristana wan çêkir. Lewra jî ez çiqasî bêjim ez ê nikaribim hestên wan hevalên şehîdketî bînim ser ziman û ez baş dizanim ku dilê her yek ji wan bi hestan barkirîbû, lê encax xwediyê hestan bikaribe hestên xwe bîne ser ziman. Lewra jî encax ji me ew bibîranîna berxwedana ku raberkirine anîna serziman û girêdana wan a hevaltiyê nûkirin û soza ku wan dabû û rêk û şopa ku di ber de şehîd ketine berdewamkirine. Her yek ji wan hevalan hêjayî navê xwe bûn û bi xwîna xwe hevaliya xwe parastin. Bedena xwe kirin sîpera paristina hevalan û bi pakrewanî tevlî kerwanê şehîdê bêmirin bûn.

***





direvîne berbi wan çeper û sengerên berxwedanê. Ew çeperên ku bi xwînê dengvedana dilan li ser textê bêriyê wek destan, evsane û serpêhatiyên qehremantiyê xêzkirin e. Ez bi hêvîme ku hûn bi xwendina van serpêhatiyan re hîn bêhtir rastiya jiyana gerîla nasbikin û hêviyên xwe bi henaseyên azadiyê avbidin.

**Hamid Dêrik**

**Îro 20’ê Adarê ye, sal jî 1996 e.**

Em sed heval in. Me di vê şeva pîroz a Newrozê de ji warê bilind û wargehên azadiyê, hesreta bi çiyê re yekbûn, her tiştî bi me da jibîrkirin. Em ê ji sibê cejna pîroz di sînga çiyan de pîroz bikin. Gelê me jî, wê cejnê bi agir û coş pîroz bikin. Em jî bi hesret, kêliyek şûnve xwe bavêjin hemêza xaka pîroz û li wir xeyalên sala dîtina gerîlayan ku dibe bibe rastî bînin cî.

Baran dibare, ewqas hûr tê mirov pê nerihet nabe. Berevajî wê li pêşiya me riyek dirêj heye. Em jî nû ne. Ji aliyekê ve, em fikarê meşê dikin û ji aliyekî din ve jî hêviya ku em ê bigihîjin hevalan fikarên me belewela dibin.

Li pêşiya me du tişt hene. Hetanî em xwe bavêjin berqefên çiyê ya ku yekê Ava Jiyanê ya ku bi biharê re har û dîn dibe. Ava di binê xwe de dikele û bi kela xwe hêrsa tolhildanê di hundirê me de diçîne bi herîkîna xwe. Kaniyên hêviyê di dilê me de çêdike. Belê ava Dîcle, ava mezin a ku xwe ji paytexta dilan ji Amedê gerandiye. Wekî ku silavên dila ji me re anîbe, di ber me re diherike. Îşev wê rê bide me û pêşiya me veke û em xatirê xwe ji başûrê rojava bixwazin û derbasî Deşta Bêxêr a Zaxoyê bibin û bimeşin, ta ku em xwe li berqefê çiyayê Bêxêr





derdorê rêka paşdekişandinê jî geriyan, ew hejmara ku me dizanî derbasî donzdeh hevalan bû. Her wiha her hevalek bi mêrxasiyeke mezin tevlî refê pakrewanan bûbû, her hevalek li cihekî û bi şêweyekî şehîd ketibû. Bê ku tu didiliyê jiyan bikin û heta dilopa xwîna xwe ya dawîn liberxwe dabûn û tevlî bihişta periyên şehîdan bûbûn. Li derveyî van pênc hevalên şehîd hevalê Sînan ê ku bi saza xwe bûbû şerkerê hozanbêj ku kurê hozan Comerd bû, bi israr di nava cengê de mabû û bi fîşekeke xedar stêrka wî ji ezmanan xuricî bû. Dîsa hevalê Hemza û Ferhad. Her tim çepera ku di bin êrîşa kobrayê de şer kiribûn. Lê sed heyf û mixabin gava di roja cengê de û di xulekên dawiyê de, piştî ku biryara paşdekişandinê hate dayîn û di dema ku em û dijmin di deriyê Moxil de bi bombeyan ketibûne nava hev de, wê demê ev herdu heval pêre negihîştin ku bikaribin ji wê çeperê zû derkevin. Ji ber ku devê çepera erd pir teng bû û rewş jî pir xeternak bû û lezgîniyek pêwîst bû. Lê herdu heval ew derfet nedîtin ku zû ji çepera xwe derkevin. Lewra jî çawa ku herduyan wekî cêwiyê şerker şer dikirin, wekî cêwiyan jî di çepera berxwedanê de şehîd ketin. Dîsa herdu hevalên din hevalê Serdar û Serhedê ku di dema cengê de em bi hev re di yek çeperê de bûn. Di paşdekişandinê de ew jî wekî hevala Nûjîn di encamê sûîqastê de şehîd bûbûn. Her wiha du hevalên jin ên bi navê Nêrgiz û Şervîn di dema ku heval bi giştî paşde dikşin û di encama parçeyên topên hewanan de şehîd dikevin. Hevala Şervîn ji Dêrika Hemko bû ango

kengî zû giloveroka xwe dagire, qet nediwestiya. Em westiyan, lê hîn ew digeriya. Careke din saetê zora me dibir. Êdî bawîşkên xewê dihatin me. Jixwe hîna me baş bêhna xwe venedabû. A rast xewa me tevan dihat, lê çîrokên hevalan ewqasî tijî hest bûn, xew ji çavên me direvandin. Lê pêwîst bû em bêhna xwe bidana. Wê sibehî çibibûna ne diyar bû. Lewra pêwîst bû em zû rabin û tedbîr û keşfa xwe bikin. Bi peyva şevbaş re em tev ketin xewê. Rojbaşa me ya serê sibê berî ku perdeya şevê xwe ji ser xwezayê vekşîne çêdibû. Her wiha piştî ku keşf hate kirin û şûnde, nû em ketin nava tevgerê. Îro rojeke tenha bû. Li vê derê û di nava vê xwezayê de tenê em û teyrik û hemû lawirên kovî hebûn. Lewra jî roj a me bû. Gelek kar hebûn ku em bikin, lê kar bê plan çênedibû. Piştî ku roj baş bilind bû û tam em piştrast dibûn ku di nav qada em tê de disekinin tiştek tuneye, wê gave me planê xwe yê xebatê çêkir. Di pêşya me de karê herî girîng ew bû ku, anîna cenazeyê hevalên şehîd bû. Pêwîst bû ku em şehîdên xwe bispêrin axê. Em bûn du kom û her komek çû cihê ku li şer kiriye. Me hevalên birîndar hiştin û çar heval jî li cem wan man. Gava ku koma me çû cihê ku şerê herî giran lê hatibû meşandin ango deriyê Moxilê, rewşa ku hebû û hejmara ku me dizanî ku heft heval li wê derê şehîdketine, lê hejmara hevalê ku şehîd ketine ji texmînê me zêdetir bûn. Tiştê ku me dizanî herî zêde pênc heval li wir şehîd ketibûn. Ew jî hevalê Hogir, Bahoz, Xişman, Nûjîn û Qendîl bûn. Lê piştî ku em derbasî cihê cengê bûn û me li nava çeperan yek bi yek nihêrt û piştî ku me li





bidin. Dibêjin ku, xweşiya tiştekî bi taybet ku bîranînên jiyanê bin mayinde ne. Piştî demekê xweşiya wê çêdibe. Ev tiştê niha ez jiyan dikim, gava ez tînim bîra xwe, em pir westiyabûn. Lê dîsa jî mîna ku tiştek nebûbe, her em dimeşiyan. Gelek tiştê rengareng çêdibûn bi ser westandina me de. Em dikeniyan, hûn dizanin çima? Ji ber ku em tev jî nûbûn. Derveyî qurye mesafeya ku ketibû nava hevalan de pir çêbûbû. Wekî trêneke ku vagonên wê ji hevdu dûr ketibin. Rewşa min li gorî ya hindek hevalan hindekî baştir bû. Bi berê seharê, me xwe gihande nêzî baragehên gerîla.

Koma me hêdî hêdî komî ser hev bû. Ji aliyekê, ji ber westandinê em xwe li ser lingên xwe nagirin, ji aliyekê din ve em her dikenin. Hûn dizanin vê carê çima? Hevalekî di nava me de bi navê Cemal, bêjinkurt ku me navê wî kiribû General, hingî bi şevê ketibû xwarê. Êdî mirov nedizanî ev General e an jî herî ye. Tevî çeka xwe di nava heriyê de bûbû wekî peykerekê. Hevalekî ji nava me bi henekî jê pirsî, rewşa te çi ye General; rewşa min herî ye, ka wêneyekê min bikişînin. Piştî tevayî hevalan komî ser hev bûn, pênc deqîqe mabû ku em bigihîjin hevalan. Jixwe qurye berî sê saetan gotibû pênc deqîqe maye. Lê em hêvîdar in vê carê rast be. Em ketin rêza xwe, fena leşkerên pir zîrek. Hevalên din di baregêhê de ketin merasîma leşkerî. Kêfa me eger sed bû, bû hezar. Piştî ku me çayek jî vexwar ji xwe te digot qey em nemeşiyane. Di sivîltiyê de dibêjin, tûzik dermanê dila ye. Di nava gerîla de, çay dermanê dila ye. Piştî nîvro hevalên kevn bi coşa Newrozê, xêrhatina me pîroz kirin. Hevalekî strana mirtoxe ku xwarina şoreşê ye ji me re got. Piştî ku

westandina me çû, em bi ser xwe ve hatin û me dîsa xwe amade kir da ku em bikevin rê û niha jî em rêwî ne.

***

Kî dizane?

Ji hev û din dûrketin bûye wekî parçeyek ji mirinê. Nizanim! Ne ev şensê her dilekî ditepite û lê dide an jî çarenûs e. Rastî ye an derew e. Ne diyar e.

Ji hev û din dûr ketin, di hundirê xwe de bi êş û hesretan tijî ye. Di dilan de birînên bêxwîn vedike. Carnan ji axîn û keserên kûr ji nav lêvan derdixîne û pê re jî rojên hatine jiyankirin, wekî xeyalan di ber çavan re derbas dibin. Lê nabin rastî.

Ji bêrîkirinan roj dirêj dibin wekî roja herî dirêj ê salê. Şev jî ne bi çîrok û ne jî bi çîvanokan naqedin û dem bi dem di nava damarên mejî de ev hevok derbas dibin; "Ma wê rojek were ez te bibînim"

Dayîkekê reş girê daye û bi hesreta dîtina lawê xwe yê çeleng û keça xwe ya bedew, bi bendewarî bi vê hevokê dilê xwe germ dike. Evîndar ji evîndara/ê xwe re di kêliya xatir xwestinê de vê hevokê ji hev re dibêjin. Ji bo hevdîtinê çav li riyan dimînin. Mirovekî penaber jî, bi hesreta axa welatê xwe ya ku di biçûkaniya xwe de, di nav gundekî çiya de derbas kiriye, bi hêviya roja vegerê li warê ku lê dayîk bûye. Axa wê hemêz dike, ew jî vê hevokê dibêje. Jin jî bi azadiyê re dipeyivin û bi xeyalên rojên xwedawendiya jin-dayîkê dixebitin û têdikoşin.





Ji şevan şeveke payîzê bû. Pênc roj mabûn ku roj û şev wekî hev lê bibin. Em jî 18 heval bûn, hijdeh dil bûn. Her dilekî wekî amûreke mûzîkê lê dida û gava bi hevre dihatin lêdan dibûn wekî orkestra dilan. Me wê şevê orkestraya dilan lê dida û her dilek hestên xwe yê cengê û tenêbûnê, berxwedaniyê û bêrîkirinê digotin. Her hestek hêjayî destanekê bû. Lewra şeveke payîzê têrî hestên me dikir. Ji ber ku her dilek ji van dilên çiyayî, çerxeke hestan diafirand. Carnan hestên bi êş û kovan bûn, carnan ên kêfxweşiyê bûn. Lê yê herî zêde yêê bêrîkirina hevalan bû û hestê herî giran ê ku em hestiyar dikirin ên wan her çar hevalên birîndar bû. Lewra encax birîndar bikaribin hestên xwe bînin ser ziman. Êşa birînê ew dikişandin. Belkî jî ew bi xwe jî nikaribin bînin ziman. Zehmet e û ne hêsan e.

Belê, li ber devê wê şikeftê, bi biriqîna stêrkên şevê re meydan bûbû meydana parvekirina hestan. Her ku hevalek çîroka xwe tanî ser ziman bi hemû êş û azarê ku hatî kişandin re û pê re jî bedena her yek ji me dikete nava kelecanên bêsînor. Çawa ku elementên daringan gava tevlihev dibin û carnan reng diguherin, difûrin, germ dibin û sor dibin; kela dilê me û kelecana me jî wekî van elementan dihate guhartin. Kela dilê me difûriya, lewra em bi sermaya şeva payîzê nedihesiyan. Dem çawa derbas dibû, em pê nedihesiyan. Mîlê saetê wekî peza ku ber bi berxika xwe ya biçûk ve dibeziyan tevdigeriya. Jixwe derziya saetê wekî ku ketibe pêşbirka beza sed metreyî,

hestan tijî bû. Tişta pir balkêş ew bû heçku hemû hevalan ji hev re sozdabûn ku wê vê rojê werin li hev bicivin. Meşa me wekî kîvroşkê ku ji lîsikê xwe dûr diçin û şûnde dîsa li lîsikê xwe vedigerin bû. Bêyî ku tu kes dereng an jî rêka xwe şaş bike, her kes berê xwe dabû noqtê da ku hevalan bibînin. Ji ber ku dilê gerîlayan bi hev re bû, lewra jî nêrînên me tevan ji hev pir cuda nebûn. Di rewşên wisa de piraniya nêrînan dişibin hevdu û her yek ji me gotibû wê heval vegerin vê derê.

Piştî ku em li hev civiyan, em tev li ser nêrîna ku heval eseh wê werin vê derê û hemû hemfikir bûne. Lewra me xwe bi qasî nîv saet ji nuqtê dûrxist û me xwe da nava Katoyê. Ji ber ku Kato ji bo parastinê cihekî herî baş bû. Her wiha bê ku em dem winda bikin em ketin tevgerê.

Hemû hevalên saxlem bi hevalê birîndar re bûne alîkar û karwanê me kete rê. Me xwe da cihekî ku şikefteke xwezayî lê hebû. Destpêkê me cihê hevalên birîndar xweş çêkir û me ji wan re erd hemû kire pûş û piştî wê jî tevahiya hevalên saxlem cihê xwe çêkirin. Jixwe ji bo hevalên saxlem cihekî wisa pir zêde pêwîst jî nebû. Her wiha berî ku tarîtî perdeya xwe bigire ser xwezayê, me cihê xwe qedandibû û me di her aliyî de tedbîrên xwe yê pêwîst girtin. Piştre jî me lîsteya xwe ya nobedariyê çêkir. Belê şeva yekem a hevalên qutbûyî destpê dikir.

***





Mirovên dîl, di nava çar dîwarên reş û tarî de, bi hêviya ku rojên azad jiyan bikin dibêjin. Ma gelo! Ez ê te bibînim…

Gerîla jî ji serê çiyayên bilind, ketine pêvajoya xelasiya ji zilm û desthilatdariyan û ji bo dîtina rêberê xwe yê ku ew gihandine vê astê û afirandinê bi devê çekên xwe pêlên deryaya reş didirînin ta ku xwe bigihînin rêberê xwe û hemêz bikin.

Armanc yek e, daxwaz yek e, hest û hesret tev de yek in. Ev daxwaza dila ye. Daxwazên dila di dilan de veşartîne. Ger em ji vê yekê re bêjin birîna bêxwîn, ma wê derman çi be?

Em hemû dizanin dermanê birînê bi xwîn, diyar in. Pispor û bijîşkên van birînan pir in û rêka wê jî bi dermanên li hev çêkirî peyda dibin. Lê birînên bêxwîn rihet nabin.

Li ser vê yekê min lêgerîn û lêkolînan kir û ez li vê têgînê di pirtûkan de geriyam. Lê min ne derman ne jî wate dît. Min rakire tûrikê xwe yê sebrê û min berê xwe da ber bi mirovan û ber bi mirovên xwedî ezmûn. Ji bo vê yekê jî ez meşiyam. Gava ku min xwe gihand, min careke din axîneke kûr kişand û ji xwe re got; piştî ku min ji mirovên bi ezmûn ku riyê wî jî ji tecrûbeyên jiyanê spî bûbû û li eniya wî gelek diyar bûn pirs kir. Min jî ji xwe re digot; êdî derd neman. Lê mixabin mirovê bi ezmûn jî berê min da riyeke dûr, deryayek bêbinî û warekî nenas. Ger min got rêka min yek e, bûne deh. Her yek jî ji ya dinê zehmetir e. Ew dem çîroka Lawikê Xerîb hate bîra min.

Ma hûn dizanin çîroka lawîkê xerîb çawa ye? Di nava bîranînên xwe yên Katoyê de, hema kurt be jî ez ê bêjim. Belkî bi sûd be.

Tê gotin ku Lawikê Xerîb ji bo ku bigihîne Cudiya mirada, çûyê Sefîneyê. Keştiya pêxember Nûh ku ji tofanê xelas bûye û li Cudiyê rawestiyaye ketibû rê. Lê kes nizane eslê vî lawikî çi kes e. Lewra jî jê re dibêjin Lawikê Xerîb.

Piştî ku çend salan dimeşe, bi pirsan û vir de wê de xwe digihîne çiyayê Cudiyê û bi qasî nîv saet maye ku xwe bigihîne ciyê ku keştî lê rawestiyaye, di vê navberê de rastî mirovekî xêrnexwaz tê -bi zimanê çîrokê jê re tê gotin şeytan- Di wir de kurtediyalogeg di navbera mirovê xêrnexwaz û Lawîkê Xerîb de çêdibe û mirovê xêrnexwaz dipirse;

-Lo lawiko! Te xêr e, tê bi ku ve biçî lo! Ma te riya xwe winda kiriye?

-Ez ê biçim ciyê ku keştiya pêxember Nûh lê aliqiye. Merem û mirada dilê min ev e. Ma gelek maye ku ez xwe bigihînim gelo?

-Ma ew çiqas e ku tu dimeşî?

-Ev heft sal e ez dimeşim û her pirsyar dikim.

-Biborîne lawo, ev heft sal e tu dimeşî, lê divê tu bi qasî ku meşiyayî bimeşî encax tu xwe bigihîniyê.





heval bin, bes bi gihîştinê re ji donzdehan pirtir bûn. Hejmara bûbû hijdeh. Dema ez çûm cem Sewra û Gulnaz wan, şeş hevalên din jî ku qut bûbû zivirîbûn. Di cengê de dijmin ketibû navbera wan û havalê dinê de, lê tişta baş ew bû ku her şeş heval rewşa wan baş bû û tu birîndarî nîn bû. Di nava wan hevalan de hevalekî bi navê Mahîr hebû. Hevalekî pir kevn bû, me jê re digot Mahîrê Qerebaba. Qerebaba navê gundê wî yê li Efrînê bû. Rûesmer û bejin bilind bû. Jixwe ji van rewşan re biyanî nîn bû. Jixwe mîna van rojan gelek rojên zehmet derbas kiribû. Bi me re gelek bû alîkar. Li cihê me û piştî ku hemû heval komîserhev bûn, dîmeneke pir xerîb dihate xêzkirin. Ger mirov bêje ev dîmen wekî tevneke ku rîsê wê veresiyabûyî ye, wê li cih be. Piştî ku em kombûn ev tevn wekî ku ji navê hatibe pînekirinê. Dinyayê! Hefteyek berê vir bi hevalan tijî bû, lê niha em hijdeh heval in. Di dilê her yek ji me de deryayeke ji hestan der bûye û her yek ji yê din cuda ye. Di hişê her yekî de pirsên bêbersiv digerin. Em bi giştî hijdeh heval bûn, ji wan çardeh heval saxlem bûn û çar jê birîndar bûn. Ger ev hevalê ne birîndar ewqas hestiyar bûne, Xwedê dizanî ka hestê van birîndaran çiqasî mezin in. Ger hestên hevalên saxlem derya bûn, ên birîndar bûbû zeryan. Her çiqas di dilê me tevan tijî kul û birîn bûn jî, lê di çavên hemû hevalan de hêviyeke xweşik xuya dikir. Bi taybetî piştî ku em gihîştin hev, bê ku tiştek bi tu kesî were, vê yekê em kêfxweş kiribû. Di her cara ku hevalek çîroka xwe tanî ziman, mirov dizanî bê ka çiqas îradeyek mezin dane nîşandan. Ji ber ku her çîrokek bi

me da hevala Sewra, em rabûn û me rêka xwe domand. Di rêkê de wekî cara ku min Mazlûm û Azad dîtî, min çîroka xwe ji wan re jî vegot û wan jî ya xwe ji min re gotin. Her yekî ji ya dinê bi bûyeran tijî bû, lê rewşa wan ji ya min zehmetir bû.

Tahtên Katoyê pir asê nê û rê nedidan ku em bi rehetî bimeşin û birîndariya hevala Sewra jî rewşa heyî hîn girantir dikir, lewra em hem dimeşiyan û hem jî heçî tişta hebû me vegotin, carnan bi dilgermî carnan jî bi dilsarî me pişta gotinan dişkandin ta ku me xwe ji nava tahtan xilas kir. Êdî noqte ji me ve diyar dibû. Wê hevala Gulnaz bi gihîştina noqteyê re histirek ji me re bi rê bikirana. Bi gihîştina ciyê civanê re tîbûna hevala Sewra xwe da der. Lê av ji bona birîndara an ji bona yên ku xwîn zêde winda kirine mirin bû. Her ku dixwest, min digot av nîn e heval. Lê çend meter jê rî me jî xuşexuşa avê dihat. Li hember israra wê û dengê avê pir hev negirt. Lê ka min ê çi bikira. Baş e ku heval zû hatin û me tavil hevala Sewra lê siwar kirin û me berê xwe da baregehê. Jixwe ciyê ku em lê sekinîbûn jî navê wê Kaniya Cemedî bû. Aveke wisa xweş, aveke wisa qerisandîbû, ne pêkan bû ku mirov yekser destê xwe tê bixistana û xulekek tê de bihiştana.

Baregeha me tam ne di nava Katoyê de û ne jî di nava tahtên asê de bû. Li kêleka Katoyê bû. Yanî wekî zarokê biçûk ê Katoyê bû. Hê saetek ji êvarê re mabû, em gihîştin baregeha xwe. Min digot qey em ê li baregehê donzdeh





Bi vî rengî mirovê xêrnexwaz, dilê Lawikê Xerîb sar dike û ji kerba re bêtaqet dibe û bi qeyrana dil li wê derê diçe ser dilovaniya xwe. Heta niha jî goristana Lawikê Xerîb wekî ciyekî pîroz tê hesibandin. Ji ber ku dilê wî paqij bû û daxwaza wî ji dil bû.

Belê, nîv saet mabû ku merama Lawikê Xerîb were cî û pêk were. Lê mirovên dilreş û tarî nehiştin ku merama lawik were cî û hesret û hêviya di dilê lawik de hîn jî li wê xakê bêhna xwe dide û xwe tîne bîra her kesî.

Piştî ku ev çîrok hate bîra min, min careke din rakir tûrikê xwe yê sebrê û min ji xwe re got; her çiqasî derd, kul, birîn hebin jî; bêguman bê derman nîn in. Wisa jî ez gihîştim vê baweriyê. Ger tu bixwazî bigihîjî merama dilê xwe, tê tu carî bêhêvî nebî. Dermanê hevdîtinê sebr e, têkoşîn e, bendewarî ye, ked e û hêvî ye. Wekî ku Roja me û mirovahiyê timî aniye ziman û em fêrkirine; “Hêvî ji serkeftinê bi rûmetir e”

Wê rojek were, avên zelal wê di cihokên xwe re biherikin. Mirovên xêrnexwaz û dilreş, wê li ber bayê hêviyê werin paqijkirin. Dayîk wê lawê xwe bibînin, evîndar bigihîjin evîndaran, penabar wê li xaka dê û bavên xwe vegerin û wê her kes bi azadî bijîn, têkoşer û şervan wê bi rêberê xwe re hevdîtinek bêhempa çêkin û li nava xaka pîroz, li paytexta dilan li Amedê bi tilîlî û pêşwaziya gel re wêneyan bikşînin.

***

Wê gora min be rojekê, ev axa sar.

Ew ê min hembêz bike di nava qelşên xwe yê tî û ziwa de û min veşêre ji dîrokê re.

Bi xwîna min wê tîna xwe bişkîne û bi xwêdana eniya min wê rewa bigre.

Hestiyên bedena min jî, wê ji axa sar re bibe hêz. Lewra jî ez natirsim ji mirinê.

Ji ber ku wê rojek were axa sar wê sînga xwe yî qelişî veke, bipeyive û bêje: "Li vê erdê û li xakê li ser sînga min a tî û qelişî şevekê lawikekî delal û xwînşêrîn hat ba min û li min bû mêvan. Saet derengî şevê bû, taveheyv jî tunebû, lê stêrkên asîmanan diçirisîn û bêdengiyek mezin hebû. Carnan deng û vizeviza bayê dihat û carnan jî dengê lawiran olan didan. Di vê navberê de lawikê delal xwe gihand min û bi xwe re diaxivî. Dengê lawik li min biyanî nedihat, lê min çikir û nekir min nekarî ez binasin, min ji xwe re got: "Ma gelo ev Brûsk e yan jî Hesen e" Hemû dengên min bihîstibûn. Min di xeyalên xwe re derbas kirin, lê min nekarî ez binasim.

Jixwe di van rojên dawiyê de jî dengê top û vîzevîza fîşekan bîrweriya min jî tevlîhev bûbû. Lewra jî min nekarî ez lawik ji dengê wî nas bikim û min xwe li hêviya hilatina rojê re girt. Tiştê balkêş lawik bi tena serê xwe bû û rêka xwe jî şaş nekiribû, xuyabû wî jî ez baş dinasîm.

Di wê rojê de ne li cem min, bi nêzîkahiya nîv saet li kêleka min dîsa dengê topên bêrehm dihatin, min ji xwe re got dîsa qiyamet rabû. Xwedê xêr bike! Lewra jî ev hizir





dilê dijmin dida, dijmin bi saetan di ciyê xwe de tevneliviya. Qendîl bi rojan nehiştibû ku dijmin xwe bigihîne çeperan.  Ax feleka bêbext, te Qendîlê delal ji nava me bir. Êdî soza me wê bi navê te û hemû şehîdan be Qendîl.

Bi dilekî şikestî ji cem wî birêketim da ku hevalên ku bang dikim bibînim û min berê xwe da wan herdu hevalê ku wekî min tenêbûn û bendewarî jiyanê dikirin. Min berya niha ji peyva şer gotibû ku di şer de her tişt çêdibe, lewma jî gelek caran rastî tahl e, lê rastiyeke din jî heye ku çiqas rastî tahl be jî dîsa wataya xwe diparêze. Ji ber ku gava stêrka mirovek bixurice, pêşî girtina wê zore, her çiqasî min êşa şehadeta Qendîl nedikarî jibîrbikim. Lê pêwîst bû henekî zû ez xwe bighînim cihê herdu hevalên jin lê ne.

***

Hevala birîndar a bi navê Sewra ku di rêveberiya eyaletê de cihê xwe digirt li ber tahtek rûniştîbû û lingê xwe yê birîndar dirêj kiribû û birîna lingê xwe bi şûtikeke reş girê dabû. Hevala Gulnaz jî ku bi eslê xwe tirk bû, li kêleka wê rûnişti bû. Gava ku çavên wan bi min ketin û yê min jî bi wan ket, kêmek bejî me êşên di dilê xwe de jibîrkiribûn.

Birîn zêde ne giran bû. Bi qewlê hevala Gulnaz ku hewl da bi min re kurdî biaxive "Tansiyona min duşmuş bûye", piştî ewqas rojan rûyê min bişirand. Baş bû ku min av bi xwe re anîbû. Piştî ku min çend kirteşekir avête nav avê û

Tenê ew şahidê cengê, berxwedanî, lehengî û mêrxasiyan bûn. Rengê tahtan ji libên fîşekan û ji parçeyên bombeyan belek belek bûbûn. Hema hem hevirê ku derb nexwarîbûn nemabûn. Gava ku em di nava cengê de bûn min ew guhartin pir zêde ferq nedikiribû, lê niha her tişt pir eşkere û zelal e û li ber çavan e. Jixwe ferqkirina vê jî di nava cengê de ne pêkan bû. Ji ber ku encax û encax mirov xwe diparast û şer dikir. Di dawiya wê de tiştek nedihate bîra mirovan; lewra ger gotin li cih be, xwezaya vê xakê jî hatibû guhartin û hîna şopên xwînê li ser gelek keviran neqşan çêkiribûn û bi xwe re wêneyek keskesorî li ser ax û keviran hûnandibû. Piştî ku min xwest ez ber bi cihê bersivdayînê ve biçim, ji nişka ve ez çi bibînim! Ez di cihê xwe de cemidîm û bi çavên zîq min mêze kir; tûka min min di qirika min de careke din ziwa bû û tevzînokên qeşayî bedena min ditevzandin. Wey Xwedê! Li pêşiya min cenazeyê hevalek. Kelegiriyeke pir dijwar û bi êş kete qirika min, lê min nedikarî ez bigrîm jî. Jixwe girî jî bê feyde bû. Ji ber ku di vê rewşêde girî wê bi kêrî çi bihatana. Bi çend gavan min xwe nêzîkî heval şehîd kir. Ez çi bibînim, hevalê Qendîl bû. Min tu carî bawer nedikir ku wê mirin bikaribe bi Qendîl. Ji çavên min rondik dibarin, çi feyde ye. Qendîl di oxira Kurdistaneke azad de, çiraya xw tefandibû.

Erê dinyayê, Qendîl jî şehîd ketiye. Bila stêrk, bila ew Xweda, bila ev taht, bila ev xweza heft rojan heft şevan şînê girê bide. Her cara ku hevalê Qendîl roketekê li nava





hate bîra min! Dibe ku ev lawik ji vê cengê hatibe, lê ma kanî hevalên wî yên rê?

Piştî ku lawikê şêrîn serê xwe danî ser sînga min, dem bi dem dengê nalînên kûr dihate min, vê yekê jî hîn ez ponijand û min got: “Ma gelo lawik birîndar e?” Bi guman, pirs û bersivan şev li min derbas bû û bûrî û ez mame li benda weriya hilatina rojê, ku ez bi rehetî bikaribim li ser û çavên lawikê mêvan temaşe kim, belkî ez binasim.

Wê demê kêlî bi kêlî stêrkan xatirê xwe dixwestin û şefeqa serê sibê bi hilatina tîrêjên rojê re hilat. Piştî ku min bi dîtina yekê re, li lawik mêze kir, ji qehra re qelşên sînga min zêde bûn. Wey mala felekê xirab be, lawikekî ciwan hê di temenê xwe yê 23’yan de ye. Ji birîna li ser sînga wî, xwîneke sor î zelal diherike û toza cenga giran li ser xwêdana eniya wî şil bûbû, hingê min lê mêze kir, min kir nekir min nenasî. Her çiqasî rengê rûyê wî dişibe Brusk jî, lê ez zelal nebûm. Wî jî, bi rûkenî li qelşên sînga min a tî tameşe dikir û wekî ku bibêje: “ Ez berê jî hatibûm li cem te bûbûm mêvan, ma te ez nas nekir? Navê min Brusk e, birînên min kûr in û ez pir tî me, ma tu dikarî ji min re avê bînî? Mixabin ne dest hebû ne jî ling hebû û ji pîrbûnê re jî çavên min baş nedidîtin. Tenê tişta li cem min hebû ku ez dilê xwe vekim û rojek were ez şahidiyê bikim. Ji ber ku min dizanî ku lawik movîka xwe ya jiyanê qut kiriye û hatiye birîn. Hatina wî ya li cem min jî ku ez wî hemêz bikim.

Min zanî ku Brûsk cengawerekî çiyayê bilind bû bi dehê cengan jiya bû. Lê nesîb hat ku îro li min bibe mêvan û

xatirê xwe yê dawiyê bixwaze, xwe û bedena xwe radestî min dike ku ez rojekê lê şahîdiyê bikim lewra jî ew namire û jiyan dike.

***

Tiştek wekî bîranînê gerîlayan xweş tune ye. Gava ku tê ser ziman û dema bîranîn têne gotin hestên mirov, xeyalên mirov diçe warê ku lê bîranîn çêbûye.

Şeva din em di manga xwe ya sê metre pan û pênc metre dirêj û naylonkirî û bi çiloyan rapêçayî de rûnîştîbûn. Li der û dora mangê, darên bilind ên mazî hebûn. Di nava pelên daran re stêrk li ezmanekî sayî diçirisin. Ew jî wekî ku bi hev re biaxivin û bîranînan bêjin tevdigerin. Lê dengê wan nedihate me. Nizanim çiqas dengê me diçû wan. Dîsa jî li kêleka manga me ya biçûk zinarên mezin hebûn. Dem jî werza payîzê ye û germahiya tebaxê me li pişt xwe hiştibû. Hewa kêmekî sar bûbû û bayekî hişk di kêleka mangê ku vekirîbû li rûçikên me dida. Lê tu caran bîranîn, sarbûnê nas nake. Ji ber ku naveroka sohbeta me germ bû û nedihişt ku em bi bayê ku dibalive bihisin.

Ronahiya çirayê, mangê ronî kiribû. Hêdî hêdî stranên Hozan Dîno lêdiket. Me carnan di ber re destê xwe û carnan jî serê xwe dihejand. Em jî di destpêkê de pênc hevalbûn û ji ber nûçeyên Roj Tv'yê dihatin. Hevalekî ji me rahişte pirtûka ku her şev dixwend. Pirtûk jî bi kurdî bû û navê wê jî "Ji ava Feradê dilopek" bû. Sarbûna hewayê, dilê me bire çayekê. Ji me hevalekî ev fedakarî kir û çû da ku çayê amade bike. Me destpêkê li ser gerîla û sarbûna hewaya payîzê bîranîn vegotin û pê re pê re em





Belê, a niha ez vê gavê ber bi wî cihê ku Xişman silavdayî ve diçim. Di her gavê de dilê min dike gurmegurm û hesteke pir xerîb bedena min dipêçe. Ez niha jî nikarin wan hestan bi vê pênûsoka zivav bînim ser ziman û bi van hestan ez gihiştim nava çeperan. Berî ez li nava çeperan bigerim ez derketim ser kevirekî bilind ku ji wî kevirî piraniya çeperan diyar dibûn. Du roj berê, her yek ji van çeperan qîzên bedew û xortên çeleng lê çeper girtibûn û bi xwîn û xwêdana xwe destaneke berxwedanêyê nivîsandibûn. Niha ev çeper xalî ne, ne heval û ne tiştek; tenê şopên berxwedaniyê û şahidaya tahtan a dîrokekê.

Li ser bangên min, destpêkê tu bersivek nehate. Bêdengiya heyî min xist nava gumanan. Lewra min bi dengekî hîn bilintir û bi qîr dîsa bang kir, haval… heval… Dengê min li nava tahtan deng vedida û li min diziviri. Heçku yekî din jî eynî wekî min bang dike û eynî peyv digotin. Belê dengvedana gotina heval… qut.. qut… û ne zelal bû. Li pey qêrînên min hingî ji min hat min fîtikeke xurt û tûj da. Di wê navberê de dengeke zirav hate guhên min û heval… heval… Dengek nazenîn… lê belê di navbera min û deng de qederek dûrbûn hebû ku ez xwe bighînimê.

Bi bersiva heval re ez ji ser keviran daketim nava çeperan. Di nava çend çeperan de ez geriyam. Qalikên vala yên fîşekên teqandî, di çeperan de li ser hev kom bûbûn. Mîna te erdek tov reşandibe û li kêlek wan pîmên narîncokan.

Her ku çûm ber bi deriyê Moxil ve çûm. Deriyê Moxil ciyê cenga çend roj berê bû. Hemû kêliyên wan rojan di hişê min de zindî dibûn. Civîna hevalê Cemal çêkirî hate bîra min. Her wiha gotinên hevalê Cemal wekî her car bi gotina "hevalno" dest bi axaftina xwe dikir û didomand û digot; "sibede bê guftugo şer şerê berxwedanê ye."

Belê ev gotina wî ya bi dengekî zîz û zelal di xeyalê min de xwe zindî dikir û a niha jî gava ez şer tînim bîra xwe ez baş fêm dikim ku axaftina hevalê Cemal pêk hatibû. Ji ber ku şerê ku hatî meşandin ne şerekî asayî bû, şerekî berxwedaniyê bû û dîsa jî her ku ez ber bi çeperên ku em tê de bûn diçûm, heçku ew kevirên çeperan bangî min dikirin. Gotinên hevala Nûjîn ku digote; "hadê çavên min" hêsr ji çavên min barandin. Dilê min diguvişî. Rûkeniya hevala Nûjîn û bişirîna rûyê, li ber çavên min bûn. Jixwe silava hevalê Xişman a dawîn li her devera Katoyê belav dibû. Bi her gavekê re, bi min re bû û tu caran ji bîra min nediçû. Ew silava dawiyê bû û ev silava girêdaniyê û serkeftinê bû. Ew silava Xişmanê çavbelek di rihê hevaltiyê de xwe nûdikir û ez careke din bibîrtînin. "Heval birîna min girana, hûn biçin, ez ê nehêlim ku dijmin bi birîna min şa bibin, silavên min li hemû hevalan bikin, Bijî serok APO" û xeleka bombê kişandibû. Niha jî rihê wi yê paqij li buhişta pakrewanan dijî, di dilê me de deng vedide û wê her vede.





ketin nava çalakiyên gerîla. Ji nava van çalakiyan mijara me hate ser cahşan. Bi taybetî ku di demekê de cahş pir çalak bi dijmin re dixebitîn, ji lewma jî bi vê nêzîkbûna xwe çek digirtin û li hemberî me bikardianîn. Bi taybetî li herêma Botanê ev yek derdiket pêş û cahş ji dijmin dijmintir bûn. Gelek caran cahş dîl dihatin girtin. Carnan jî nesîbê wan dibû mirin. Di nava şer de, carnan jî me pez ê wan ku ji wan re jiyanî bû, desteser dikir. Di vir de zehmetiya anîna pez, bi serê xwe mijarek bû. Di vê navberê de hevalê me yê ku çûbû çayê, çayê ji me re anî û me hinavê xwe pê germ kirin û sohbeta me dom kir.

Di nava me de ku em endamê taximekê bûn, hevalek pir kevn hebû. Ji Şaxê(Çatak) ku girêdayî Wanê ye bû. Navê wî Gabar bû û di 10 an 11 saliya xwe de, di sala 1989'an de tevlî refên gerîla bûbû. Ji wê demê û şûn de, li çiyan gerîlatiyê dimeşîne. Hevalekî bejna xwe kin û zeîf bû û pir lêvbiken bû. Hevalên di nava taximê de, pir jê hez dikirin û nirxek mezin didanê. Ji ber ku di jiyana xwe de jî pir mûtewazî bû.

Bi carekê re, ev pirs kete mejiyê min. Gelo hevalan di salên 1989'an de di nava gerîla de çawa perwerdehiyê didîtin. Di nava wan bê derfetiyan de? Min xwe negirt û ji heval re pirs kir. Ma perwerdehiya te ya destpêkê tê bîra te? Çawa bû? Ez pir meraq dikim.

Heval jî piştî kêliyekê dest bi ken kirin. Xuyabû piştî vê pirsê pir tiştê balkêş hatin bîra wî û kûr û dûr çû û bi qasî 17 salan bi şûn de zivirî, çû Botanê û Bêşebabê, Masîro û Gundê Ereb. Ciyê ku perwerdeya yekem car dîtiye û bi lêvkenî anî ziman. "Ez di biçûkbûna xwe de tevlî gerîla

bûm. Min tiştek zêde nedizanî û em di navbera 15-20 kesan ku piraniya wan ciwan bûn, di nava hevalan de diman. Me zêde tiştan nedizanî. Li ser vê yekê rojêkê gotin îro perwerde heye. –wê demê nedigotin "perwerde", digotin "egîtim"- me jî nedizanî perwerde çi ye? Heta me digot tiştekî pir xerîb e. Piştî ku em kom kirin, hevalekî riyê wî dirêj û bi simbil hat cem me û got: "Ka xelekek çêkin" Piştî ku me xelek çêkir, di nava me de ji piya sekinî û got; "Îro dersa me li ser kolektîvîzmê ye. Yanî hevkarî." Me jî nedizanî çi dixwaze bêje. Jixwe me zêde zimanê wî jî fêm nekir. Tenê tiştê ku min fêm kir, divê em alîkariya hev bikin. Piştî ku bi qasî pênc deqîqeyan axivî û bi şûn de ji me tevan bi dorê pirs kir. Ka we çi fêm kir? Her hevalek tiştê ku fêm kiribû gotin. Dor hate min, min pir şerm dikir. Di wê navberê de dayîka min hate hişê min û kelegirî bûm û di qirika min de bû girêk. Min rondik rijandin û ji dersê derketim û dûr ketim û çûm. Bi çûyîna min re hevalekî din bang li min kir. Xuyabû dixwest bi min re biaxive. Lê kela dilê min û kelegirîbûna min nehişt ku ez bersiva heval bidim û di vê navberê de û piştî kêliyekê dengê çekan hat. Du an sê fîşek li kêleka min ketin. Ev tişt pir bi zanebûn hatibû plankirin ku nîşaneya întîşarê bû. Lê haya me ji vê yekê tunebû û dengê fîşekan zêde bû. Tiştê ku hate bîra min jî û hemû hevalên nû em birevin. Me di hundirê xwe digot, dijmin em dorpêç kirin. Ev cara yekem bû ewqas fîşek ji nêzîk ve ez dibihîzim, hew mabû ziravê min biteqe. Em pir tirsiyan û me tenê çareyê di revê de dîtin. Piştî çend deqîqeyan qîrînek hat ji me re gotin, bisekinin û pê re jî dengê çekan rawestiya. Derûniya fîşekan hîn li ser me hebû. Dilê me zêde zêde lêdida. Xwêdanek sar bi ser me ketibû û peroşiyeke zêde em girtibûn. Piştî ku heval hat cem me pirsî, hûn çima





Min nêmêrga kin derbas kir û berê min kete kaşê diçe Kato û deryê Moxil. Ez katim şêveriyê û hilkişiyam. Di kaş de taqeta lezkirinê bi min re nema û her diçû çongên min sistdibûn. Danê nîvro bû û tava rojê jî germ dikir û her diçû disotand. Ji xwêdanê her derê min şilopilo bûbû; li nava milên min, li bin cengên min û li ser sînga min xwêdan bûbû nexşe. Heçku ji xwe re sînor çêkiribin, hîna jî deryê bersivan li pêşiya min venedibûn. Derî hatibûne miftkirin. Piştî ku gihîştim serê Katoyê, di nîvê kaş de li wê pala bi kevir û di nava hêlizên zerbûyî de, ez gihîştim wan hevalên ku bang dikin.

Du heval bûn. Yek jê hevalê Kerîm bû û birîndar bû ya din jî hevala Dorşîn bû. Hevalê Kerîm bi xwe jî ji gundê Garisa ji gundê Êrkendê bû. Lê hayf û mixabin birîna wî pir giran bû. Hevala Dorşîn hevaleke pir kevn bû. Di salên 92- 93'yan de tevlî gerîla bûbû. Di şer de xwedî gelek ezmûnan bû. Ew jî qesta cihê hevalan dikirin. Piştî min ji wan re rewşê û hevalên ku em gihîştine kir. Çîroka wan jî dûr û dirêj bû. Nedibû ku wisa li piyan û di vê rewşê de bahs bikin. Pirsa ku kirin, ma hemû hevala vegeriyane ciyê xwe… Hîn du hevalên keç li jor bûn. Bi tevahî çar heval bûn. Yek ji wan birîndar bû. Pêwîst bû ku ez biçûma pêşiya wan. Ev daxwaza hevala Dorşîn bû. Min ew şandin hêla baregehê û min hilkişîna xwe ya hevrazên Katoyê domand.

***

çend gavek pêşde neçûyîbûn bi carekê re! Qîrîneke kûr û dûr hate; heval… heval… Em sekinîn û me derdorê xwe qontrol kir, dîsa deng hat heval… heval…

Me hingî bala xwe da derdoran, lê bi çav me tu kes nedidît. Dengê ku dihat jî heçku yek di binê bîrekî de bang bike û dengvedana wî li her deverê hem belav dibû hem li tahtan olan dida. Heçku hawarek bû. Me got hebe tunebe heval me dibîne, lewra bi qîr bang dikir. Dengê ku tê jî ji milê deryê Moxil ve dihat, cihê qada cengê bû, lê hîn jî tu kes xuya nedikir. Jixwe dîtina wan bi çav ne pêkan bû. Ji ber ku tahtên Katoyê rê nedidan ku em hevalan ferq bikin.

Her wiha di nevbera ku em çi bikin û nekin de, min berê xwe da hêla ku deng tê. Min şaşala tijî av girt cem xwe û lezand. Her kum in dilezand xeyalên min jî dilezandin. Fikrên sosret dihatin hişên min û pirsên bê bersiv dîsa di serê min de diçûn û dihatin. Hestên germ bi ser bedena min de dihatin û her ku min dilezand min ji xwe re digot; heçku ev çend rojên derbasbûyî, jixwe ji pirsên bê bersiv re hatibûn veqetandin. Her pirsek li bersivekê digeriya û her berisvek pirseke din çêdikir; wekî xelakên zincîrê her tişt dihate jiyankirin. Di vê de felsefe hebû, zanist hebû, mîtolojî hebû. Di van çend rojan de ez bûbûm wekî feylesofê ku ji pirsan naweste û bi berisvan jî têr nabe û hîna ez dimeşim.





direvin? Yekî ji me got; “Lê em ê çibikin, ma ne fîşek tên.” Dîsa heval pirsî; “Ma hûn bilez in an fîşek?” hevalek din jî; “Wê demê divê hûn nerevin, xwe bavêjin erdê. Li ber berekî, kevirekî û dora xwe kontrol bikin. Hûn vê jî fêr bûn. Ji vê re dibêjin “întîşar”

Hevalê me dema ev tişt dianî ser ziman, di ber re keser û kenekî pê digirt û destê xwe li çonga xwe dida. Wekî ku bibêje em çiqasî nezan bûn.

Belkî jî wî bawer nedikir ku ewqasî sal bimîne. Van derfetên îro ku gerîla di nav de ye bibîne. Lê bû. Ez jî gava niha van rojan xeyal dikim. Îro û wê şevê dikim pîvan. Em li ber ronahiyê perwerdehiya xwe dibînin. Li TV temaşe dikin, hejmara me bûye bi hezaran. Tev jî bi çek û di ezmûnên şer û jiyanê de kûr bûne. Baş fêm dikim ku bedela vê yekê ne normal e. Bi hezaran xortên egîd û keçên hêja ku niha di nava xaka pîroz de razayîne. Bedena xwe kirine pireya derbasbûna azadiyê.

Bi bîranînan şev li me derbas bû. Bêyî ku em hay ji xwe hebin û bi kêf xweşî û bi gotina me ya her şev; “Şevbaş” em ketin xew. Gava min xwe dirêj kir, sohbeta me dîsa di nava mejiyê min de demekê ez mijûl kirim. Li ser vê yekê min di mejiyê xwe de kire biryar, da ku ez binivîsim.

***

Gelo!

Kî ne ew ê ku fêrî jiyana çiyan bûne. Her tiştê xwe bi hev re û bi çiyan re par ve dikin û bûne parçayek ji bedena wan û bûne mirovên hêviyê.

Ji riyên rast û deştê ketine nav riyên asê, bi kevir û dar, li ser riyên xwelî û xwar, bi kaş û nişûf de dimeşin wekî ku di pêşbirka hevdîtinê de bin. Li kêlaka kaniyên sar û cemîdî bêhna xwe vedidin. Ji ava serê kaniyê lêvên xwe yê nazik û tenik şil dikin û têhna xwe dişkînin. Porê xwe şe dikin. Ji qutîka xwe ya biçûk cixareyekê ji tûtûna Mûşê dipêçin û kenekî xweşik bi ser rûyê wan dikeve û piştî vexwarina çayekê ji çaydankê reş dîsa amadekariya rêwîtiyê dikin.

Di rêwîtiyê de xwêdana kedê ji nava eniya wan tê, dibe dilop û bi ser rûyê wan de diherike û li ser milê wan dibe nexşeyek hêviya pêşerojê.

Rêwiyê riya dûr, berê wan wê bikeve newalên kûr ên bi daristan.

Kê dizane?

Belkî jî berê wan bikeve warên bilind û keviyên berfan û bi qasî nîv saetê di nava berfînan de bimeşin. Wê demê wê silavekê bidin zozonên bi mêrg, çîmen, gûnî û gul de.

Ne diyar e ….lê … ev qismet e.

Di rê de roj biçe ava û xatirê xwe bi qasî deh saetan bixwaze, wê demê perdeya reş vebike û dem dibe dema rêwiyan wê bi rihetî bikevin nav liv û lebatê, şev ji bo





cihê ku Bargiran lê bû, me dît ku hevalê Bargiran pala xwe daye kevirek û gava çavên wî bi me ketin, xwest ku rabe. Cilên wî tev qetiyabûn, hîna toza cengê û xwîna birînê bi cilên wî ve mayî û hişkbûyî qalik girtibûn. Bi ser tenêbûna wî de, birîna wî ewqas meşeke dûr bi qûnxişkî hetanî vê derê hatiye. Bi tenê serê xwe, bi birîndarî, bi kaşanê, ser devkî xwe gihandibû baregehê û bêyî ku bikeve kemîna dijmin.

Piştî ku hevalan hevalê Azad bire noqtê, careke din hêstir anîn ku hevalê Bargiran jî siwar bikin û wî jî bibin noqtê. Di wê navberê de, min sêv û karçikên ku berhev kiribû jê re amade kirin. Gelek bê taqat mabû. Jixwe me pir zêde pirsan jî jê nekir. Ji bona ku birîndarî û êşa ku kişandiye pê bidine bîrkirinê, me bahsa cengê nedikir. Piştî ku min rewşa fêm kir û li halî wê mêze kir, min fêm kir ku tiştên ku min jiyan kirine û tadeyiyên ku min kişandine ne tiştek bûn. Hevalê Bargiran tu caran hêviya xwe winda nekiribû û rih û baweriya li cem wî bû li lûtkeya herî jor bi stêrkan re di nava pêşbaziyan de bû. Sê roj sê şev bi birîndarî, birçî û tî meşiya bû û xwe gihandibû hevalan. Lê digel her tiştî, her çiqas ne nedixwest em cengê bînin hişê wî, wî her her pirsan ji me dikir ka çi bû, çi hate serê me. Dixwest çîroka her hevalekî hîn bibe. Me jî soza ku em bigihên noqtê jê re bahs bikin da.

Piştî ku hevalan hêstira me yafedekar anîn, me hevalê Bargiran lê siwar kir û me berê xwe da noqtê. Hîna em

kirin rûyê wî wekî gulekê vebû û bi kelegermî û bi hesteke tijî hevaltî em yek biyek hemêz kirin, Her wiha bêyî ku em rûnên hema li ser piyan me rewşa wî pirs kir.

Hevalê Aras em dibersivandin. Heval mesela me dirêj e! Min axaftina wî birî û min jêre got ma bi tenê bûyî? Na heval ez ne bi tenê bûm. Ez û hevalê Xebat Cizîrî ne. Em bi hev re di roja cengê ya yekemîn de di nava leşkeran de man, lê rewşa me baş e. Ji wê çaxê û şûnde em herdu bi hev re di nava Katoyê de di nava leşkeran de mabûn. Me qet tevger nedikir heta ku operasyon bi paş de kişiya. Hingî em hatin baregeha kevn, me got belkî heval hatibin, lê mixabin hin tu kes nehatiye, ji bilî we.

Ma ka heval Xebat? Hevalê Xebat li wan deran digere, ez jî hatim vê derê min got belkî ez hindekî erzaq bibînim, lê tu zanî min çi dît? Hevalê Bargiran. Te got hevalê Bargiran! Ma hevalê Bargiran sax e li ku ye? Va li vê derê ye li ber tahtekê ye, lê birîndar e.

Em çûn cihê ku heval Bargiran lê bû, min her tişt bawer dikir, lê min qet bawer nedikir ku Bargiran bi saxî bighêje me. Ji ber ku gava em di cengê de bûn, Mazlûm ji me re got ku birîndarî maye di nava leşkeran de. Gelo çawa kiriye heta ku xwe xelas kiriye, çawa bi birîndarî ji Katoyê daketiye vê derê. Kî dizane ka niha çiqasî zehmetî kişandiye û çawa kefenê mirinê qetandiye. Lê wekî min got, min di şer de her tişt texmîn dikir, lê Bargiran sax e û şehîd neketiyê min ev yek texmîn nedikir. Piştî em gihîştin





rêwiyên çiyan wekî bav û dê ne. Taveheyv dibe ku hebe. Belkî jî tunebe. Lê stêrk wê hetanî şeveqa serê sibê bi rêwiyan re rêwîtiyê bikin. Stêrkên şivanan û leyla û mecnûn wekî ku bi wan re nava sozdayînekê de bin û bi biriqandina xwe reng bidin, rêwîtiya van gerîlayan silav bikin.

Demsal çi demsal e ne diyar e!

Ger bihar be, şev kurt û roj dirêj in. Wê her der hêşîn be, robar wê biherikin. Xweza jî wê bi xeml û xêz be. Di nav de jî cî bi cî û dem bi dem dibe ku li ezmanên sayî ewr kom bibin xwe li serê Cîlo, Herekol, Ararat û Mûnzûrê bigerînin. Belkî jî baraneke hûr bibare û bêhna axê jî xweş bibe.

Di vê demsalê de qaz û qulêngên deştê wê ber bi warên bilind ve bifirin û bar bikin. Wê hêlînên xwe li cihê bilind çêbikin û ji jor ve wê temaşeyî rêwiyan bikin.

Ger ev rêwî rêwiyê Botanê bin, bêguman wê silavke şoreşgerî li 24 kaniyokên Feraşînê û hevalên li wê derê bidin. Ji ava wê vebixwin û bi hevalên li wan zozanên wekî derya fireh in, li ser rêwîtiyê biaxivin û bîranînan ji hev re bêjin. Wê dilê wan şad bibe. Gerîlayê li wir jî wê ji wan re bêjin; rêka we vekiriye, li pêşiya we Gola Nismo heye. Silavên me jî bi xwe re bibin.

Serkeftin be heval!

Xuyaye meqsed û merema dilê van rêwiyan; wê warê fermandarê mezin, ciyê ku pêngava cejna gerîla lê hatî

avêtin, warê fîşeka yekemîn lê hatiye teqandin Gabar e. Wekî ku hevalekî bi nav kirî –bihûşta windabûyî- a niha piştî ku rêwiyan wêneyên bîranîn li kêleka Gola Nismo kişandin û berî ku bigihîjin "bihûşta windabûyî", wê bi qasî şevek du şeva li Bestayê rawestin.

Bestaya ku hawirdora wê çiyayên bilind in, Herekola Mîran di vir de wekî kelayeke xwezayî bi gerîlayê xwe ve serî bilind kirine. Herekol di dîroka bav û kalan de bi destan û çîrok e. Îro jî ev destan bi lehengî û berxwedanî mînakên van rêwiyan e û mîna Şehîd Rêsûlan nûjîn dibin û mirov pê serbilind dibe.

Rêwiyên me wê li kêleka ava Hêzila tûj û dijwar li ber siya darên gûz û çinaran bi rihetî wê xewekî bêhnvedanê bikin û ji wê û şûn ve bi carekê wekî ku bifirin xwe bavêjin warê egîdan Gabarê. Gabar ku her tim ji dijmin re bûye cihê tirs û xofê, mirov dibêje qey xwezaya Gabarê diyariyeke ji gerîla re. Rêwiyê me jî wê li vê derê bi cî bibin. Her gerîlayakî ku Gabar dîtî, ne mûmkun e ku jê hez nekiribe û pê ve nehatibe girêdan. Bi taybet ku di nav de geriyabe.

Tu ji kîjan alî temaşe bikî bike, ji şer re erdnîgariya wê yeke yek e. Ji bo debara jiyanê têra xwe bi mêwe û fêkî ye. Ji xwe de belesebe egîdan ev der nebijartiye.

Li vê derê, rêwîtiya vê komê diqede û jiyan û şer dikeve rojeva wan.

Komên din ê rêwiyan rêwîtiya wan hîn dirêj e. Rêwiyên wan kilamên Serhêdê bi germahiya dilê xwe yê wekî agir





ne ew her çar heval bi tenê ne. Em bûne pênc heval. Pênc dilê ku eynî bêrîkirin û hêviyê dijîn û eynî hest û hezkirinê dijîn. Em bûne wekî pênc tiliyên destekî û bi hev re tevdigerin û dimeşin û şîrove û nirxandinan dikin. Hestên xwe bi hev re parve dikin. Min ji wan re behsa hevalê Xişman û Nûjîn dikir ku di dema cengê de şehîd ketin. Her ku em diaxivîn hem dilê me diêşiya hemjî derdê dilê me dihatin der û berê me her li Katoyê bû. Li cihê ku em ji wê derê birêketin ji berya cengê, li cihê ku şahî lê hatibû lidarxistin. Berî ku em xwe bighînin wî cihî, ji nişka ve hevalekî pişt me got ka biseknin! Bigotina ka biseknin ez û Mazlûm di cihê xwe de bi matmayî cemidîn. Çi bû gelo? Em sekinîn û me bi hev re got: Xêre çi bû? Ciyê ku bi destê xwe nîşanî me da, me yekser berê xwe da. Meraqa her diçû zêdetir dibû. Bi dîtina me re Mazlûm xwe negirt û bi kerba dilê xwe yê şewitî qîr kir, heval… heval…

Belê! Ew hevalek bû û bi tena serê xwe li wê mêrga ku nêzîkî baregehê bi tena serê xwe dimeşiya. Lê kî bû? Çi dikir, me nedizanî. Her tişt îro pir ecêb bû, kî dizane ka çîroka wî bi çi awayî ye gelo? Wekî ya me ye an jî hîn balkêştir e. Bi kîjan hestan dagirtî ye? Lê hîna em nizanin ka kî ye? Min ji Mazlûm re got, hebe hebe rewşa wî hevalî jî wekî ya me ye û di vê kêliyê de hevalê ku me dît, bi bêrîkirineke ber bi me ve beziya. Piştî ku çend gav di nava me de man ku bighêje me, me ew nasî. Navê wî Aras bû, bixwe ji Başûrê Mezin bû. Piştî ku gihîşte me, em silav

tunebû, lê dîsa ez bêjim xilasiya me tesadif bû. Her cara ku dengê leşkeran dihat, me xwe ji cengê re amade dikir da ku bi xwe re gelekan bibin. Ji ber ku cihê me ji pevçûnê re qet nexweş bû, belkî em mehkûmê binkeftinêbûn. Lê ne xem bû. Niha jî gava ez dibêjim ez naxwazim wan kêliyên zehmet û nexweş bînim bîra xwe…

Min axafina Mazlûmê ciwan birî û pirseke din avête nava axaftina wî! Ma tu agahiya we ji hevalan çênebû? An jî we tu şop ji hevalan nedidît? Na tu agahiya me ji hevalan nîn e, hevalê Mazlûm wisa bersiva min da û axaftina xwe domand, ji roja ku em qutbûyî ne me tu tevgerek nekir. Lê berî du şevan ango şeva ku hûn ketibûn cengê de, dengê gelek çekan ji jêr û ji milê gundê Marînosê ve dihatin, lê me fêm nedikir ka çibû. Bi pêşbîniyeke mezin a me danî ew bû ku hevalan di wir re çûbin. Lê em nizanin çi bûye. Wekî din tu agahiyên me nîn in. Gava Mazlûm çîroka xwe vedigot, li ser rûyê wî dîmenê kovanî û êşê diyar dibûn. Hesret û bêrîkirina hevalan di çavên wî de diçirisîn. Min rewş û derûniya ku wan jiyan dikir kêmekî ba jî fêm dikir. Rewş û derûniya wan ji tenêbûn û nerehetiya wê ne cudatirî ya min bû. Ji ber ku ew jî wekî min ji gelek tiştan bê agahîbûn û bêrîkirina hevalan di dilê wan de bû. Min dizanî ka çiqasî zehmetî û êş kişandine, çiqasî bi sebr li ber xwe dane û çi îrade dane nîşandan.

Wan digot qey ew her çar tenê di cengê de qut bûne. Min jî digot qey ez bi tenê me, lê wa xuyaye ne ez bi tenê me û





wê silaveke ji dil bidin Araratê. Biçûk û mezin. Wê demê Ararat jî, wê ji kêfxweşiyan di hundirê xwe de bikele.

Wê rêwiyê me li Dambat û Tendûrekê bêhna xwe vedin û dem bi dem ji me re nûçeyên xweş û mizgîniyan birê bikin.

Gelê meyê paytexta dilan, gelê Amedê li hêviya rêwiyê xwe yê ku wan pêşwazî û hemêz bike. Bi tililî û qêrînên serhildanê xêrhatina zarên xwe yên gerîla bike. Rêwî jî li vê derê bi devê tivingên xwe piştgiriyê bidin qêrînên zarokên sê salî û kalepîrên heftê salî. Wê av bikevin cihokên xwe, masiyê bi avê wê kêfxweş bibin.

Rêwiyê me yê Zagrosan ji zû de gihîştine hevalên xwe yê li Çarçela û Govendê û hev silav kirine.

A niha jî em werin koma rêwiyên rêka herî dûr, warê zîlanan. Rêwiyên Dersîm û Mûnzûrê li vê derê ji çem ê Mûnzûrê herikîna xwe didomînin. Şalûl dem bi dem riya rêwiyan kontrol dikin û li hêviya rêwiyane ku bi wîqewîqa xwe mizgîniyê bibin hevalên wan ên li çavlirê. Hesreta gihîştina warê zîlanan, westandina rêwiyê wê derê ji bîra dibe. Hemû hêvî ne. Xem ê nekişînin kêmek maye hûn bigihîjinê.

Dilê bi hêvî be, wê bigihêje merama xwe û dilê tevayî rêwiyên azadiyê bi hêvî ne.

***

Îro roja ku muzîka xwînê wê were lidarxistin. Yekîneyên gerîla hemû alavên xwe amade dikin ku tevlî mîhrîcana cenga çiyê bibin. Koma berê niha jî gelek mîhrîcanên bi vî rengî dîtine û beşdar bûne. Bi kurtasî di van mîhrîcanan de bi ezmûn in, lê dîsa jî provayên xwe bê rawestan didomandin. Ji bona serkeftina di pêşbirkan de ku di saetên nivî şevê de werin lidarxistinê bi dest bixin, çend rojên dawîn di nava amadekariyan de ne û bi liv û lebat in.

Çawa ku di şahiyên sersalan de, asîman bi kulîlkên hewayî dixemilin, wê wisa jî îşev Girê Sînek ji fîşek û guleyên roketavêj û bîksiyan werin xemilandin. Wê xumînî û gumînî, bi tevahiya şevê dewam bike û dengê tilîliyên gerîlayên keç û xort xwe li asîmanê heftan bide. Bi van guleyan wê navê orkestraya binivîsin û binexşînin û orkestraya jiyanê ji bo vê şahiyê, gerîla bi maneya şer de xwe xweşik dikin û dixemlînin. Rextê xwe dijdînin û çekên xwe paqij dikin. Cil û bergên xwe girê didin û provayên xwe bi hev re par ve dikin. Tev jî ji bona ku orkestraya wan a ku li dar bixin bê qusir û serkeftî be. Ji bona serkeftinê jî, di hemû alî de xwe temam kirine. Bi rihê apocî xwe tevlî kirine. Bi şêwazê egîdan wê êrîş bikin û bi rihê zîlanan û bêrîtanan, xwe pêkanînên çalakiyê de girêdane û bawer kirine. Niha jî dem hatiye ku, keçên bedew û lawên çeleng bikevin rê.





hûn û hûn… pirs li ser pirsê. Mazlûmê ciwan bersiva pirsên min dida.

***

Piştî ku em di şeva yekê ya cengê de ji Katoyê derketin û paşde kişiyan, em her çar heval pêş de hatin û piştî ku em gihîştin Mezrayê, em qederekê li ser vê rêkê li hêviya hevalan man. Lê her ku dem bihûrî tu heval diyar nebûn, êdî me nedizanî em bi ku ve biçin. Şev jî pir dereng bû. Jixwe me baş nedizanî ka dijmin ku derê girtine û ku derê negirtine û hemû rê li ber me pir bi rîsk bûn.

Lewra em li Mezrayê man û me xwe da dolikeke biçûk ku darê biyê tê de pir bûn û me histira xwe li cem xwe girê da û ew li erdê dirêj kir da ku tevnegere. Em li wê dolikê man. Me nedizanî ku ew girê tu vê dawiyê çûbûyî leşkeran ew jî girtibûn. Ji ber ku em hemû bi qasî deh deqeyan di binya cihê leşkeran de bûn û gava ku bû sehar me dît ku derdorî me hemû leşker in. Wê gavê êdî nema me xwe tev da. Her kêlî dibû ku leşker bi ser me de bihatane. Gava ku hûn li Katoyê ketin şer, me li wir temaşeyî we dikir û em pir xemgîn û dil melûl dibûn. Ji ber ku me nedikarî tiştek bikira. Bi hezaran leşker û em jî cebilxaneyeke kêm di cihekî asê de. Gelek caran refê dijmin bi ser me re û bin me re diçûn û dihatin. Me jî gotibû heta ku leşker bi me nehisin em ê tevnegerin û me ev yek pêk anî. Her wiha heta ku operasyon paşde kişiya em li wê dolê bûn. Min got ya tu tiştek ku me bikira

bi dîtina min a ji hevalan re careke din çerxa jiyanê gera xwe domand û stêrka min a jiyanê geş bûbû û diçirisî. Wê gavê pela min a dara jiyanê qayîm dibû. Ez ê çîroka tenêbûna xwe ji wan re bibêjim. Jixwe piştî ku me silav dane hev û me hevdu hemêz kir, ji min pirsîn? Tu çi dikî? Ma tu bi tenê yî? Çima tu bi tenê yî? Ka hevalên din? Pirsên wan ji pirsên min zêdetir bûn. De were bersiva wan bide. Em bêhnekê li bin dara gûzê rûniştin. Birîndariya hevalê Azad didomiya. Nizanim heçku canê wî wekî miqnatîzê bû parçeyek ji ku ve dihat li bedana wî radigirt. Lê vê carê ji kevirekî mezin de ketibû û birîndar bûbû. Ji ber ku xwezaya hişk gelek caran ji bo me gerîla nabe evantajeke baş. Me kêm bedel di vê xwezaya hişk de nedane, gelek heval bi berfa dijwar re xatir xwestine û gelek heval bi ava har re û bi pêlên çeman re bi taybetî di biharand e bi herkîna çemên dîn bûyî re berê xwe dane deryaya şehadetê û li wir bûne mêvan. Gelek jî di kendavên asê de xişikîne û di asêbûna kendavan de mane mêvan, lê ya baş ew bû ku Azad ji mêvaniya dawiyê xilas bûbû. Ew jî di kendavê de ketibû.

Piştî me bêhna xwe veda, em ketin rê û em ber bi baregeha xwe ya ku berî cengê em lê bi cih bûbûn ve meşiyan. Di rêkê de min çîroka qutbûn û tenêbûna xwe ya du şev û du rojan ji hevalan re digot. Bi dilêşî min dianî ziman. Di ber re jî wan ji min pirs dikirin û min jî bersiva pirsê wan yek bi yek didan. Piştî ku çîroka min a bi keder qediya, îcar min ji wan pirs kir ka ew li ku derê bûne. Û





Belê, rastiyeke gerîlayan heye. Ji aliyekê ve, wê çûna cengê çêbibe; ji aliyê din ve jî girtina govend û dîlanê şertekî dualîteyeke xwezayî di nava xwe de dihewîne. Kêfxweşiya gerîlayan di asta jor de ye, jixwe tu dibêjî qey diçin seyranê. Ne ceng e, bi stranên şahiyê berdewam dikin. Her hevalek li çavên hevalên din temaşe dike û di dilê xwe de dibêje; “Gelo tu yê bizivirî” Lê tiştê herî pêwîst ji bona serkeftinê, gerîlayan her tiştî dane ber çavên xwe û ji bona serkeftinê ji her rewşê re amade ne. Her kes dixwaze di koma êrîşê de ciyê xwe bigire. Bedela me bahskirî jî, nêrîna herî dawîn di damara mejiyan de derbas dibe. Bi rastî, rihê li ser gerîlayan, mejiyan radiwestîne. Di dûmahiya govend û dîlanan de, dirûşmeyên; “Bijî Serok Apo!” û “Bi can, bi xwîn em bi te re ne ey Serok!” bi yek dengî bilind dibe. Tevahî heval, ketin rêzên komên ku ciyê xwe tê de girtine û kom ketin rê. Ber bi sahaya mîhrîcanê bi rê ketin.

Lêdana gurê şevan ku di çavên xwe de tûj in, di gihîştina hedefa xwe de astengiyan nas nake. Plankirina çalakiyê pir zelal e, ji bo wê jî dudilî bi hevalan re çênebû. Bi giştî jî çalakî berfireh bû. Du komên êrîşê, du piştgirî û du jî yê parastinê. Komek xweberdan(sızma), komek kemîn û komek jî teqemenî danîne. Min jî ciyê xwe di koma alîkariyê de digirt. Fermandarê koma êrîşê ya milê me, navî wî Têkoşer bû. Di temenekî xwe yê pir ciwan de bû, temenê wî derdora bîstî hebû. Bi porê xwe yê zer û çavên xwe yên şîn, pir çeleng bû. Tim û tim lêv bi ken bû. Hetanî em çûne çalakiyê jî, ev ken li ser lêvê heval winda nedibû. Di wextê çûnê de, vî hevalî rakire darekî û got; “Ev dar wê bi kêrî me bê.” Xuyabû hevalek xwedî ezmûn bû û di şer de mabû. Wî darî, ji bona têlên li derdora gir rakiribû.

Her ku em diçin nêzîkî gir, em hîn zêdetir bi baldarî dimeşiyan. Bi dengekî pir hêdî di guhê hev de em diaxivîn. Em li xişîniya lingê xwe miqatebûn. Ez vê jî bêjim, dilê me jî hindekê zêde lê dida. Ev tişt jî aliyekî cuda yê meseleyê ye. Encax mirovê ku ev tişt jiyan kiribe, wê bizanibe çima lêdana dil zêde dibe. Me bi baldarî û hişyarbûna xwe, xwe gihande hedefê. Saet tê dozdehan. Çend deqîqe bi şûn ve, koma me ya alîkariyê ciyê xwe girt. Koma êrîşê jî berdewam kir û em lê bendê ne. Destê hemû hevalên di komê de ne, li ser tetikan e. Bi çav û guhên vekirî em li hêviya destpêkirina çalakiyê ne. Hevalên êrîşê jî, xwe gihandine mesafeya lêdanê. Tevahî heval li hêviya talîmata destpêkirina pêşbirkê ne.

Di vê navberê de, ez dixwazim tiştekî din jî bêjim. Berî vê çalakiyê, gerîlayan çend caran ev gir tacîz kiribûn. Bêyî ku êrîş bikin, zivirîbûn wargehên xwe. Ev tişt dijmin xistibû xefletê. Ji bo wê jî, teqîna destpêkê bi roketavêjê çêbû. Dijmin got qey dîsa tacîz e. Jixwe mîna ku me got, hevalan xwe gihandibûn çeperan. Tabî di vê navberê de ez vê bêjim, gerîla di avêtina bombeyan de pispor in.

Dema bi pêlkirina tetikê re roketavêj hate avêtin, fermandarê ku li gir e, wisa diqîriya; "Korkaklar gelin, adamsanız gelin." Wan dîsa tacîz fêm kir. Bombeya yekem hate avêtin û tam kete çeperê û orkestraya şer û xwînê destpêkir. Piştî ku mewziya yekemîn ket, êdî kî dikare pêşiya gerîla bigire. Gotineke gelêrî heye, wiha tê gotin; "Hetanî gur tevayî kerî belav neke, dev jê bernade." Yan jî heta çila temam neke, kerba wî nakeve. Her deverên gir bû gule û agir. Qarewara leşkeran diçû heta cem





Azad anîne. Li gorî vegotina hevalê Azad bi kerengên biharî hefteyek li ber xwe daye. Azad heft rojan bi birîndarî û bi tena serê xwe li ber xwe dabû. Vîna giyana Apociyan dida nîşandayîn. Ez niha çiqas bêjim jî ez ê nikaribim êş û zehmetiyên ku wî jiyankirine bînim ser ziman. Lê rastiyek ji nava rastiyan raxistibû li ber çavan, ew jî vîn û berxwedana ku hatibû raberkirin bû û niha jî vaye li pêşberî min li ser hêstirê ye. Hevalên din jî hevalê Xabûr bû û şervanê çend mehan bû û yê din jî niha navê wî nayê bîra min. Her çar ketine rêzê û ber bi min ve tên û berê wan li Katoyê ne.

Piştî ku min heval dîtin, ji kêfan re heçku baskên min çêbûn û hew mabû ku ez ez bifirim. Ji evîna dilê xwe re min xwe nedigirt. Dîtina hevalan gelek ji min re xerîb dihat, fena ku ji nû ve jidayîk bûbûm. Ez yekser derketim ser rêka pêşberî wan. Bi derketina min ji nişka ve, her çar heval wekî qalibekî cemidî şeqizîn. Bi çavên zîq û matmayî li min mêze kirin. Heval matmayî man. Di nava vê matmayînê de ber bi wan ve meşiyam. Meş û beza ku tevlihev bûbû, ya bêrîkirin û hezkirinê bû. Ez bi kelakela dilê xwe yê bi şewata kezebê ve dibeziyam. Heçku dinya hemû ya min be. Bi gihîştinê re min Mazlûm hemêz kir. Min dixwest ji kêfan re qîr bikim. Ev hevdîtin di jiyana min de ya herî xweş bû. Her wiha min bi vê dilgermiyê hevalê Azad û herdu hevalê din jî hemêz kirin. Di bedena min de kelegermiyeke ewqas şêrîn geriya, wekî axa ku zûde baran nedîtibe û bi giyan bibe, wisa li min jî hatibû û

bûm; ka heval in an jî cahş in. Di riya xam de dimeşiyan. Lê hê jî min ew ji hev dernexistine. Pirs di serê min de wekî gulebaranê dibariyan. Piştî ku hindek din nêzîkbûn, dengê qerebalixa wan zêde dibû û digotin ço… ço… ço…, carnan jî digotin wişe… wişe… ya zelal bi wan re dewar hebûn. Li pêş histirek hebû û li serê jî her hal gundiyek bû. Na na, ev heval bûn, heçku barek li ser pişta min daketibe, ez wisa rihet bûm.

***

Belê! Yên ku dihatin ne dido bûn, çar kes bûn. Çar heval bûn. Hevalê pêş Mazlûm bû, lê ne ew Mazlûmê ku di cengê de fermandarê me bû, ew yekî dinbû, lê navê wî jî Mazlûm bû. Yekî ciwan bû temenê wî herî zêde bîst sal hebûn, herî dawî ew ji qada Gerzanê hatibû û tevlî yekîneya bi tevger a Botanê bûbû. Yê siwarî hêstirê bûbû jî, min xweş dinasî. Navê wî Azad bû. Di operasyona Bestayê de, ku 50 hezar leşkerên dijmin tevlî bûbûn e, hevalê Azad jî di yekîneya me de bû û di nava wê operasyona berfirh de di rojeke ku em ketibûn pevçûnê de birîndar bûbû. Ji ber ku nedikarî bi yekîneya xwe re bimeşe, em mecbûr man wî bi tena serê xwe di cihekî saxlem de veşêrin û xwe ji cihê pevşûnê dûr bixin. Belê! Di wê operasyona berfireh a ku di 11’ê Avrêlê de dest pêkir û di 14’ê Avrêlê de em ketin pevçûnê de û hefteyek domiya, Azad bi birîndarî û bi tena serê xwe di nav operasyonê de mabû.  Piştî ku operasyon bi şûn de zivirî heval çûne





dayîkên wan. Yên ku mirin jixwe mirin, yê din jî reviyan û yê man jî ji tirsa dilên xwe hema li derdora xwe eletexmînî gule direşandin. Piraniya çeperên gir kete destê hevalan. Tenê du an sê çeper mabûn. Ew jî ji ber ku dijmin, wan giran tev da ber hawan û obîsan. Ji ber ku bê hêvî mabûn û dixwestin bi vê taktîkê çend leşkerên mayî jî xelas bikin.

Hevalan çardeh çek rakirin û pêre jî doçkayeke A-6 û hawanek jî di nav de gelek çekên giran jî hevalan dest dan ser. Ji bilî çekan gelek alavên leşekerî hatin desteserkirin. Piştî çalakiyê hevalan xwe bi paş ve kişandin û bi tevahî 30 leşker hatin kuştin û gelek birîndarên wan hebûn. Wisa jî pêşbirk, bi serkeftina gerîlayan bi encam bû.

Belê, tiştê ku me êşand, hevala Têkoşer, nekarî vê serkeftinê bi fizîkî bi me re parve bike. Guleyeke xayîn û rênenas xwe li sînga heval xistibû û bû bedelê vê çalakiyê. Dîsa keça bedew hevala Têkoşîn a ku bi rihê xwe yê fedayî bi ser çeperê de diçû, bi teqîna bombeyekê beşdarî karwana şehîdan bû. Ev dilê me hîn bi êştir kir. Hevala Têkoşîn, bi xwe ji Mêrdînê bû û piştî şehadeta wê, navê wê li gir hate kirin.

Rastiya şer gelek caran tiştê ku mirov naxwaze jî dike. Wisa ku Têkoşer û Têkoşîn, bûn sembola Girê Sînek û navê wan bi xwînê li ser xakê hate nivîsandin.

***

*Heval Zinar, di pêkanîna erkan de, bi biryar bû*
*Heval Gabar di pêkanîna çalakiyan de bi israr bû*
*Heval Mazlûm di rihê ciwantiyê de mînak bû*

*Bi dilekî êş û birîn ez we bibîrtînim hevolno!*

Me hevdu li Qendîl û Heftanînê nasî. Di bihareke şîn û xemilî de, li ber qiraxa aveke şîn, bi beyaniya serê sibê re, me silav da hevdu û got; "Hûn bi xêr hatin hevalno! Bilbilan ji awaza dengên xwe, xêrhatina we dikirin. Avaşîn, Ava Xabûr jî bi pêlên xwe hûn silav dikirin."

Xwezaya Heftanînê ji rengê xwe yê bihûştî girt, bi hatine avê hevalno! Dara pelçîmên xwe teqandin û kêfxweşiya xwe, xwe didan nîşandan. Belê, sê bazên xaka dayîka pîroz, di temenê xwe yê ciwan de, li wir li hev civiyan, coş û şahiyan xistin nava koma me ya gerîla. Di temenê xwe yê ciwan de, xwe amade dikirin û tev bi moralbûn, ji ber ku em ji bona pratîkê derbasî zozana dibûn. Li ber keviyên berfê, di nava berfînan de bimeşin û di mêrgên şîn de li ser kaniyek sar avek vexwin. Bêhna xwe vekin, qewdek gul jî bidin dest hev û pê re jî, hêrsa dilê xwe di pratîkê de rihet bikin. Em li ber qiraxa wê avê meşiyan, li ber agirên êvarê, me çîrokên gerîla û bîranînên xwe gotin. Em bi hev re lîstin û keniyan.

Belê hevalno!

Bîranînên me, îro di mejiyê min de, lê ji dilê min diçin û tên. Wekî bahozek lê dide, tenê mane bîranîn. Heval Zinar; şeş salên xwe tijî kiribû di nava gerîla de. Li Amanosê tevlî bûbû û di sala 2003'an de derbasî Botan, Colemêrgê bû û di wê zivistanê de, li zozanên bi berf em bi hev re mam. Şeş mehan me bi hev re jiyan kir. Ew mayîna me li bakur, pir kêfa heval xweş kiribû. Herî tiştê balkêş ê hevalê Zinar, bêhnfirehî ya ku di nava xwe de





kes tê de bi cih dibûn. Ez pir bi hişyarî li nava çeperan digeriyam, lê li derveyî qutîkên konserveyên vala û şaşalên avê min tu tiştek nedît. Wekî din min sê konserveyên nevekirî û çend parçeyê nanê somin ê hişk dîtin. Min ew girtin û careke din binişûvîve min ber bi mezrayê ve xwe berda. Piştî ku min desmala xwe tijî sêv û karçik kirin, hingî ez hatim li bin siya dareke gûzê bêhna xwe veda. Niyeta min ew bû ku hetanî ku ez hevalan bibinîm li vir bibînim.

Saet dihate dehan, roj qederekî bilind bûbû, di vê navberê de min gorê xwe yê ku şend roj bûn min neşiştibûn avek li wan kirr û li ber tavê raxist û ji wê û şûn de min xwe bi komkirina gûzan ve mijûl kir. Gûz hîn baş çênebûbûn, ji ber wê destê min ji ber ava qalikên wan reş dibû. Lê dîsa karekî baş ê mijûlkirinêbû, hîna ez bi komkirina gûzan ve mijûl dibûm, ji nişka ve perda guhê nmin bi dengê mirovan hejiya… erê dengê mirovan bû. Ev du şev û du roj bûn li derveyî axînên dengê xwe min çi deng nebihîstibûn, lê ev dengê ku tê ne dengê axînên min bûn, ew dengê mirovên dinê bûn. Gelo ev kî bûn? Heval in an jî dijmin e? Ez hîn nizanim. Bi lez û bez min xwe gihande çeka xwe û ji wê derê dûr ketim û min xwe gihande wan darên biyan û bi çavên zîq û beloq min berê xwe da cihê ku deng jê dihat. Hîna deng tê, bes bi rihetî diaxivin. Yanî wisa metirsiyeke wan nîn e, qe nebe ji hêla min ve wisa xuya dike. Her ku deng nêzîk dibû, rewş zelaltir dibû. Ya baş bi kurdî diaxivîn, lê dilê min ne rihet bû. Ezbi guman

xwe û li binya siya Gûzê rûniştim û min xwe di bin siya wê re û li ber wê ava ku diherikî kêmekî li ser piştê dirêj kir. Pê re jî min bê navber Sêv û Karçik dixwarin, lê tama wan ne weka yên gava din bûn û te digot qey ne ji yek darê çêbûne. Ji ber ku tiştê kêm her dem bi tahm in. Her hal ji ber vê bû. Her wiha bi vî rengî min pirsgirêkek din a ku min jiyan dikir çareser kir. Ew jî birçîbûn bû. Êdî zikê min nedikir qurequr, wê gavê êdî birçîbûn nedihate bîra min. Lê pirsgirêk û hesreta herî mezin ew bû ku ez hevalan bibînim. Ev ji min re bûbû kul û ji kûrahiya dil de ez diêşandim û kuleke bê derman bû. Gelo! Ka niha çi dikin? Vê pirsê ez di hundirê xwe de wekî kaniya biharan ziwa dibe lê dikirim. Her çiqas dilê min li cem hevalan bû, wisa jî çavên min jî bi bendewarî li wê rêka zirav bû. Mixabin heta niha tu pêjn ji hevalan tunebû. Min wê demê rakir çeka xwe û şiva dara xwe ya biyê girt destê xwe û berê xwe da wî girê li ser Mezrayê ku leşker di operasyonê de sê şev û sê rojan li ser lê mabûn. Gir pir zêde bilind nebû. Bi tevahî mirov dikaribû di bîst deqîqeyan de xwe bigihandina navsera wî. Armanca min ew bû ku ez biçim wê derê di ber çavan re derbas bikim û hêdî hêdî ez bi wî kaşî ve hilkişiyam. Di di destekî min de dûrbînoka min a yekçavî û di destê din de jî şiva dara biyê bû û ez bi jor de hildikişiyamta ku min xwe gihande navsera gir.

Li ser wî girê ku kêmekî fireh bû, hemû derdora wê bi çeperan hatibû pêçandin. Her çeperek herî kêm çar–pênc





digirt bû. Bi sebr bû û dilê însanan tu caran jê nedima. Dikete dilê her kesî û kenekî wî yê pir xweş hebû. Şêwazeke wî ya nerm û vekirî hebû. Hevalê Zinar pir ji teknîkê hez dikir. Xwedî helwesteke pir zelal bû. Di jiyanê de, dema xwe dinirxand û vala derbas nedikir.

Hevalê Gabar û Mazlûm jî, nû tevlî hêzên li Colemêrgê bûbûn. Hevalê Mazlûm, pir ciwan û qeşeng bû. Pir meraqa pratîkê dikir. Kenê wî û qerfên wî di jiyanê de, ciyekî taybet digirt. Çi karekî biketa pêşiya hevalê Mazlûm, jê piştrast bû. Bi dînamîka xwe ya ciwantiyê, di kesayeta wî de, pir aşkere xuya dikir. Hevalê Gabar jî, taybetmendiya wî ya herî pêş, pir germ bû. Hêrsa wî ya çalakiyê, zehmet e mirov bîne ziman. Bi taybet gava ku dijmin didît, çawa ku xwê birînê dişewîtîne, tehamûla wî jî nîn bû. Kîn û hêrsa heval jî, li beramberî dijmin ewqas dijwar bû û wiha digot; “Çi dibe bila bibe, divê em çalakiyekê bikin.” Hevalê Gabar, ji şehadetên ku li Çiyayê Reşkê çêbûbûn, pir bi bandor bûbû.

Belê hevalno!

Her sê heval, di bendawariya helandina berfa zozanan de bûn. Her roj berê xwe didan zozanên jorîn û digotin: Kengê ev berf bihele û em ê bikevin rê û bi sebreke konên xwe li zozanan vebigirin. Roj hate ku karwan bi rê bikeve. Bi coş û şahî me dîlan girtin. Coşa me di asta herî jor de em bi rê ketin.

Me gava xwe ya yekem ji nava darên berû avêtin nava gûniyan. Bihara zozanan nû destpêkiribû. Li milekî keviyên berfê û li aliyên din jî mêrgên hêşîn. Belê, zozanan

rengê xwe, cilê xwe yê bûkanî danîn û xemla xwe ya xwezayê ya biharî li xwe kirin û di nava wê xemlê de, her sê heval bi sekna wêneyekî ku nayê xeyalkirin meşiyan. Ne nivîskar dikarin wê xemlê binivîsin û ne jî nîgarkêş dikarin vê dîmenê nîgar bikin. Encax her sê heval dikarin bizanibin di nava dilê xwe de çi veşartine. Tahma jiyanê û jiyan bixwe di hundirê xwe de bi cî kiribûn. Girêdana van hevalan, bi hevaltiyê ve, wekî girêdana zarokeke bi dayîka xwe re girêdayî be, ewqas mezin bû. Di meşê de, coşa van hevalan gihîşte asteke pir bilind. Bi taybet me çayek ji ava zozanan li ser qirşik, hêliz û gûniyan çêkir û vexwar. Ev rewş, bi taybet bi hevalê Gabar û Mazlûm re pir bi wate dihat. Ji ber ku hêviya wan pêk hatibû.

Em derbasî herêma xwe ya Şaxê(Çatak) bûn. Li wir jî, em pir bi hev re geriyan û me karên hêja kirin. Bi heval Gabar re em ketin çalakiyê. Wekî ku min berê jî gotibû, tehamûla heval li hember dijmin nemabû û bi rihê êrîşê tijî bû.

Lê mala felekê xera bibe!

Di carekê de, xiyanetê serê xwe deranî, destê xwe avête dilê paqij, dilê ciwanan. Ji bona xwe bi dijmin bide pejirandin, dikaribû destên xwe bavêjin jiyana hevalan. Ew hêmanên xwînrêj, bi her sê hevalan re derbasî Wanê bû û li wir xwe avêtibû hemêza dijmin. Her sê heval jî, piştî demekê nameyek bi rê kirin û gotin; “Hevalno! Ev deh roj in hêmanê xwînrêj xebera me jê nîn e. Em li benda 20’ê îlonê ne. Hedefe me amade ye.” Ji ber ku HPG, di 20’ê tebaxê de biryara “bêçalakîbûnê” girtibû. Heval jî, li bendê bûn ku ev dem biqede û çalakî bikin. Li ser vê bingehê jî, bîranîna şehîdbûna hevalê Cuma Elî ku li





Dîmenê Mezrayê pir xweşik û delal bûn. Bi taybetî piştî ku min fêm kir ku operasyon bi giştî paş de çûye, dîsa dîmenê heyî di xeyalê min de xwe neqiş dikirin. Rûbarê avê yên ku ji sînga zozanên bilind bi jêr de xwe berdidan diherikîn; ne yek û ne didu. Di her dolikekê de robarek diherikî. Dîsa wan darên gûzan yê ku şaxên xwe bi jêr de berda bûn, li binya xwe sihekî wisa xweş çêdikirin, dîtin û gotin nabin yek. Mirov nedizanî here di bin kîjan darê de rûnê. Her yek ji ya din xweşktir bû; lê dema min ê rûniştandinê tunebû, lewra ez nesekinîm û yekser min berê xwe da cihê ku darên sêv û karçik lêbûn. Ji ber ku ez gelek birçî mabûm, min kêmekî jî dilezand. Di rêkê de min şivedarek ji biyê jêkir û ez pê meşiyam, wekî gopalakî min bikar anî da ku ez hîn xweştir bimeşim û bi vî awayî min xwe gihande darên sêvan. Darên heyî bi sêvan tijî bûn. Sê–çar cureyê wan hebûn; Sêvtirşik, Sêvê sor hebûn, her wiha… hebûn û hebûn. Lê ji ber ku piçek bejna min kurt bû, di jêkirina sêvan de min gelek zehmetî kişand. Darên heyî qurmê wan zêde ne qewîm bûn. Min hewl neda ez derên ser daran jî. Ji ber vê yekê min bi şivê dara biyê qederek sêvên sor ji xwe re werandin û destê xwe yê gijbûyî dirêjî wan sêvan dikir û min ew sêv wisa gez dikirin, kirteûkirt li derdora serê min olan dida. Ewqas sêvên bi tam. Bawer bikin, ne mûmkûn ev sêvên wisa bi tahm, li derê hebin. Belkî ji min re wisa dihat. Min sêv li ser sêvê fît dikir. Piştre min berê xwe da darên Karçikan û min qederek kom kirin. Her wiha min çend lib Karçik jî xwarin û min qederek ji sêv û karçik xist nava desmala

A Rast dilê min ne rehet bû, lewra careke din jî min ji serî hayanî binî gav bi gav her der di ber çavan re derbas kir. Dîsa min tiştek nedît. Gava min tu dîmenên leşkeran nedîtin, hem ez kêfxweş dibûm, hem jî ez biguman bûm. Ez kêfxweş dibûm, ji ber ku min digot baş e tu leşker li herêmê nemane. Lê gumana dilê min jî digot belkî xwe veşartibin û ew jî niha keşf dikin. Kîjan rast bû min nedizanî, lewra hîn bêtir sebr ji min re pêwîst bû. Hetanî ku ez rewşê zelal nekim ez ê nekevim tevgerê, ya rastjî ew bû. Piştî demekê min careke din keşf kir. Dilê min li ser girekî pir nerehet bû û min digot ger ku leşker hebin jî eseh li wir in; lê piştî ku min cara dawiyê keşf kir, min dît ku refek ji qijakan li ser gir lîs girtine, geh difiriyan geh datanîn. Hingî ez kêmekî rehet bûm û gumanên dilê min li ber bayê çûn. Ji ber ku ger li wir leşker hebana wê refê qijakan tunebana. Ev yek li gorî tewriya şerên kevn jî dirust bû, lê min pişta xwe tenê bi qijakan jî germ nekir. Lewra min got; ez bibînim bila hindek din dem derbas bibe, qe nebe bila herî kêm saet bibe heşt. Wê demê ger heta wê çaxê min tu tişt nedît. Îcar ez dikarim bikevime tevgerê.

Piştî ku çirkînî ji saetê hat û mizgîniya heştan da hîna li derveyî refê qijakan tiştek xuya nedikir. Min çentê xwe da pişta xwe û hêdî hêdî min xwe ber bi Mezrayê ve berda. Di her çend gavekê de min li ser lingan bi dûrbînoka xwe, pêşiya xwe dimeyzand û dîsa meşa xwe berdewam dikir, hetanî min xwe gihande nava Mezrayê.





Elbakê şehîd ketibû, her sê heval çalakiya xwe ya ku biryara wê dabûn, di 17’ê îlonê de kirin. Hêrsa dilên xwe, ji lûleyên tivingan bi fîşekan bi rê kirin ser dilê dijmin.

Mixabin piştî sê rojan, xebera şehadeta her sê hevalan gihîşte destê me. Hêmanê xwînrêj, fena ku xencer di pişt me de biçikîne, hevalan xistibû bin şopandinê û di 20’ê îlonê de, her sê hevalên me beşdarî karwana nemiran bûn. Çavên ku dualîteya di dîrokê de derketibû, berxwadanî û xiyanet, îro jî xwe dubare kir.

Oxir be hevalno! Rêka we, berdewama Egîd, Mazlûm, Zîlan û bi hezaran şehîdan e. Girêdana we ya hevaltiyê, biryara we ya çalakiyê, wê di aliyê jiyana me de bibe mînak û riya me ronî bike. Hûn çavkana roniya jiyana me ne.

***

Wekî duh di hişê min de ye. Sal 1996 bû. Çend roj mabû ji cejna Newrozê re. Li başûrê rojava xebatên di nava gel de bi coş berdewam dikirin. Amadekariyê cejna Newrozê bi hemû leza xwe didomiya. Xuyabû îsal wê coş pir mezin û xweş derbas be. Herî kêm di çirûskên çavên zarokên de ev coş dihate dîtin.

Di nava amadekariyan de, nûçeyeke ji coşa Newrozê bi coştir gihîşte me. Gelo ma dibe nûçeyeke ku ji coşa Newrozê xweştir hebe? Qey heye!

Ji bo mirovekî gihîştina hêvî û daxwazan, bêguman coşa herî mezin e. Bi taybet gava nûçe di naveroka xwe de hevdîtina Rêber Apo bihewîne, ava çem û robaran sekînî.

Em birin cîhaneke kûr ku bi hest û hezkirinê tijî ye. Her hevalek ji me kete nava pirs û bersivan. Di mejiyê xwe de ji heyecan û kêf û eşqê, em ketin nava lebikandinê.

Gelo em ê kengê biçin? Gava em Rêber Apo bibînin em ê çi bikin? Gelo çawa ye? Em ê çawa bikin û çawa nêzîk bibin? Wê çi ji me re bêje? Em ê çi bersivê bidin? Ez dibêjim em ji ber ku komeke ji yazdeh kesan pêk dihatin, derveyî me jî heval hene. Çûna me jî xatirxwestina dawîn ji Rêber Apo re ye û em ê derbasî qada gerîla bibin.

Bi rastî jî pêşbîniyeke pir zehmet e. Pêşbîniyeke ne bi nivîs û pel û pênûs e. Pêşbîniyeke bi hest û raman ku jêre dilekî fireh û têkûz û vekirî dixwaze. Herî kêm li cem min ji min re wisa dihat.

Dem teng bûye, pêwîst e ez hindekî lez bikim. Ji ber ku em ê bi trênê biçûna Helebê û divê ez ji trênê dereng nemama û ez ketim rêwîtiya diyar. Her kêliya ku dibûhurî, heyecana dilê min zêde dibû, hevalên em bi hev re ne jî, bi giştî di nava vê heyecanê de ne. Tevayî heval cara yekemîn e diçin cem Serokatî.

Her ku em diçin, dualîteya coş û heyecanê di hundirê me de lêdida. Em niha li Helebê ne. Li ciyê hevdîtinê ne û hejmarek pir kom bûye. Tev jî keç û lawên di temenê xwe yê ciwan de ne. Tev hatine ji bo soza xwe ya dawîn bidin û soza xwe nû bikin…

Dem êvar e û gotin, wê Serokatî saet di şeşan de were. Bes em heta nehê şevê sekinîn. Li ciyê hevdîtinê hevalek wê em pêşwazî bikirana. Dema em li benda Serokatî bûn, em





dengê qêrîniya çeqel û lawirên biyanî dihatin. Ne havalek hebû ku ez derdê xwe jê re bêjim ne jî karek hebû ez xwe pêve mijûl bikim. Tenê ez û mêrgên zozanan bûn. Mêrgan jî rengê xwe yê xweşik ên biharê winda kiribûn û rûyê erdê li gelek cihan terikî bûbûn. Bi ser de jî gava ev cenga giran hat, bedewbûna xwe ya mayî jî berze kir. Gelek deverê heyî jî bûbûn agirê cengê û wekî teniya sêlê şewitî bûbûn. Agir bi pûşê hişk û guniyan ketibû. Gava min lê mêze dikir, agirê di dilê min de gur dibû. Xwezaya delal, ma çi gunehê wê hebû ku were sotandin. Her wiha min destê xwe dirêjî çenteyê xwe yê ku wekî mala min bû kir. Min çadir û kefiya xwe ya bi rîşikan badayî deranî. Sarebayekî ji Mezrayê ve dihat rûyê min dialastt. Min ji serma laşê xwe diguvaşt û çadiroka xwe ya belek bi xwe de kir û di nava hizrandina de ez bi xew ve çûm.

Ji bêtaqetî û westandina cengê du roj û du şevan hingî ez bi xwe hisiyam ku tava rojê çadira min germ kiriye û bi xwe re jî bedena min germ kiriye. Wê gavê guvaştina bedena min xwe berda û bêyî ku ez tu tevgerê bikim min destê xwe dirêjî dûrbînoka xwe ya yekçavî kir û yekser min berê xwe da cihê duhî min ew refê leşkeran lê dîbûn. Bi nihêrtina yekê re min tu tişt nedît, yanî min tu leşker nedîtin. Hindeke din bi sebr min temaşekir. Vê care jî min tiştek nedît û min ji xwere got: “Bi ku ve çûn ew bêbavan.”

Tenêbûna min jî ewqasî bêxîret bû ku nedikarî bersiva min bide. Jixwe heçku lal be nediaxivî, jixwe ez ji tenêbûnê aciz dibûm. Bi ser de jî gava xwe qure û giran dikir ez li hemberî wê hêrs dibûm. Heta gelek caran min erza wê jî dişkand, lê ewqasî rûyê wê qayîm bû qet li ber xwe jî nediket. Wer xwe bi min ve dizeliqand, min dikir û nedikir dev ji min nediqeriya. Xuyabû ku li tu cihê ku pêve biçûya tunebû. Çima na, ma wê yekî wekî min li ku derê bibîne. Lewra saniyekê tenê jî xwe dûrî min nedixist. Pir tirsonek bû. Tenêbûna bêxem ewqas bi min ve hatibû girêdan, heçku ez her tişt wê me. Di hemû liv û tevgerê min de bi min re bû. Heta gava ku min li saetê jî dimeyzand wê jî di bin çavan re lê dimeyzan. Jixwe gava min li saetê dimeyzand û bi taybetî ew saniya qure li ber çavên min wekî marekî reş lê dihat, min digot ez ê wê li erdê bidim û biperçiqînim. Jixwe derziya saetoka bejinkurt heçku xwe avêtibe erdê, nedimeşiya heta ku gavek bi pêş de davêt. Dilê min tijî xwîn dikir, lê ez çi bikim ewqasî nefsmezin û qurebû ku hestên wê tunebûn ku dilê wê bi min bişewite û bilezîne. Lê min saet li erdê neda û min dizanî ku ew ne bi kêfa xwe ye û ferman jê re wisa hatine dayîn. Ew jî wekî min leşkerek bû, bi emir û fermanan ve girêdayî bû.

Belê!

Li wê palê, li nava wan giyayên zerbûyî de ez bi cinên şevêre bûme mêvan. Bi ser tenêbûna min de dem bi dem





bi wî hevalî re ketin sohbeteke kûr û behsa bîranînên xwe kir. Piştî demekê fermandarê Helebê, der barê hevdîtinê de em agahdar kirin. Bi agahîdayînê re piçek be jî heyecana me sar kir. Lê lêdana dil pir zêde bû û tu guhartin çênedibû.

Saet ber bi nehê şevê tê… Ji nişka ve fermandar got; “Şiyar bin!” Em tev rabûn ser piyan. Di vê navberê de, bi gavên bi pîvan Serokatî kete hundir. Ger şerm nebe, ji kêfan re, minê xwe biavête hembêza Serok.

Piştî Serokatî derbas bû, ji me re got “şevbaş û kerem bikin” Serokatî li ser kursiyek rûnişt. Wê demê serma girtibû û kêmek nexweş bû. Lê, dîsa wî digel nexweşiya xwe civîn bi me re kir. Serokatî zêde neaxivî, tenê hevalan temaşe kir. Ji ber ku ev şêwazeke Rêber Apo bû û berî ku şîrove û dahûrînan bike, destpêkê hejmara hevalên keç û xort xwest. Tesadûfeke balkêş bû, hejmara keç û xortan mîna hev bûn û bi tevahî em 50 kes bûn. Li hemberî vê yekê, bersiva ku Serokatî da; “Ev edalet e û wekhevî ye”

Belkî min destpêkê zêde wate neda vê nirxandinê. Ji ber ku min naveroka wê nedizanî. Lê ez hinek ponijîm, piştî ku li nirxandinê warqilîm, ez gelek di bin bandora vê yekê de mam.

Dora şîrovekirin û dahûrîna salê hatibû. Serokatî li ser pêngava biharê rawestiya û li ser çûna me ya gerîla nirxandinên wisa hêja kirin ku, hê jî ew nirxandin riya min ronî dikin. Serokatî digel nexweş bû, sê saetan şîrove kir û rastiyên şer raxiste pêşberî me. Di dema nirxandin û şîroveyên xwe de, yek bi yek hevalan di ber çavan re

derbas kir. Xuyabû ev jî şêwazeke Serokatî ya naskirin û dahûrîna kesayetiyê bû. Di tevahî nirxandinên xwe de, dixwest ku em bi rengekî şênber nêzîkî rastiya şer bibin.

Bi giştî tiştê ku ji me dihate xwestin, em soza jiyanê bidin, ne ya mirinê. Ji ber ku pêwîstiyê me yê jiyanê didît. Yek şêwaza din ê Serokatî, yek bi yek bi hevalan re danûstandin bi pêş dixist, da ku asta amadekariyên hevalan binase. Gava ez niha tînim bîra xwe, ez hê nû aliyê wê yê jiyanê derdixim zanebûnê. Ji ber ku Serokatî nedixwest yekî ku di warê derûnî ne amade be û bi dilê xwe nîn be bişîne qada gerîla. Bi giştî ji nava tevahî hevalan, du-sê heval li cem xwe hiştin. Ji ber ku ev heval jî, pêwîstiya wan perwerdehiyê hebûn.

Serokatî, piştî ku bi hemû hevalan re diyalog danî, piştre bi me hemû hevalan re, wêne kişand û bi hêviya ku em xwe biparêzin û serkeftinê ji me xwest û silaveke germ xatirê xwe ji me xwest.

Belê çar saet bû. Fena xewneke ku hay ji xwe hebim. Çawa hat û çawa qediya min fêm nekir. Îro jî dema ez tînim bîra xwe, tenê axîn û keserên kûr, mîna tevzînên sar bi ser can û bedena min de têne xwar û ez bi vê birînê jiyan dikim.

***

Ez ê vegerim Zapê, armanca sereke ev e. Em ê li wir bi cî bibin û perwerdeya xwe ya leşkerî bibînin û fêrî jiyana gerîla bibin. Em ê çekan biteqînin. Jixwe em hatine ku em bibin gerîla.





nelivînim wê tu bandoreke wan li ser min çênebe. Ji ber ku êvarî bû, min bi ku ve bixwesta ez ê biçûyama. Li gorî meşa leşkeran û birêveçûna wan û cihê ku pêve diçûn, heçku ew jî paşde vedikişiyan. Berê wan li cihê ku qereqoleke b inavê Peyanis ve bû. Qereqol jî herî kêm bi meşê şeş-heft saet bûn. Her wiha texmîna herî zêde ez xistim bin bandora xwe ew bû ku ev refê ji bona kemînan mabûn bû. Lê piştî ku dîtin mana wan wê bêencam be niha paşde diçin. Heta dibe ku ev hêzên mayî yên qerqolê bi xwe bin, lewra ez mam di bêdengiyê de. Leşker jî her ku diçû, ji min dûr diketin. Her çiqasî dilê min dixwest refê leşkeran gulebaran bike jî, lê mijiyê min bêdengî diparast û digot: “Lêdana te wê zêde encamek negire, belkî tu leşkerekî– du leşker bikujî an birîndar bikî, belkî jî qet tiştek ji wan neyê. Lê lêdana te wê operasyonê dirêjtir bike û dirêjkirina operasyonê jî di rewşa heyî de pir zêde bi kêrî me nedihate. Ew di riya xwe de, ez di riya xwe de tarîtiya perdeya şevê tevnên xwe dihûnand. Ez mecbûr dimam ku xwe ji Mezrayê qederekê paşde bikşînim. Min xwe da paleke ku operasyon hebe jî kes wê palê texmîn neke. Ez di halê xwe de mam, refa leşkeran jî di halê xwe de çûn. Li wî palî giya û gûnî hebûn û dîsa tenêbûna min di tevayiya şevê de dibû mêvanê min û min bi mêvanê xwe re her tişt parve dikir. Ji derveyî pirs û bersivan tiştek tunebû ku ez xwe pêve mijûl bikim. Min ji tenêbûna xwe pirsî!

Ma gelo ew leşker çûn an na?

Bi dîtinê re ez bêhemdî xwe di cihê xwe de rûniştim. Cihê min vê care ne kevirê Katoyê ne, lê belê dare biyê ne û şaxên xwe bi jêr de berdabûn. Ez pir matmayî mam. Min ê çawa ev refên leşkeran hetanî niha nedîtibû, çawa ev ref ji ber çavika dûrbînoka min re çûne û nehate dîtin. Ez rûniştim û min derdora xwe di ber çavan re gerand û min ji xwe re got: “Ev refê leşkeran ên ku ez dibînim ne xewn e? Na ne xewn e, ji ber ku ez nenivistî me heyanî ku ez xewnan bibînim. Ma ne gava din min av vexwar û min lotik didane xwe û qebqeba kewan dihate guhên min. Hîn jî tê, hîna xwêdana westandinê bi eniya min ve heye û bedena min, navmilê min hîna şil in ji xwêdanê. Na… na ev ne xewn e. Ev rastî ye, erê rastî ye, ma ne ez wan bi çavên xwe dibînim, vaye dimeşin, erê dimeşin, ji jêr di astengê re yek bi yek derdikevin û çentê wan li pişta wan e. Ez dikarim wan bijmêrim, ha yek-du–sê-çar…

Refekî sax e, ji sedî zêdetir in. Nû ji gelî, ji gundê Marînosê ve ber bi Katoyê navîn ve di wê rêka xiloxaro û bi kaş de dimeşin. Lewra ez di cihê xwe de mam rûniştî û çitinî ji min nehat; min bixwesta jî tu liv û lebat ji min çênedibû. Ez bi çi xeyalî dimeşiyam, çi hate pêşiya min.

Sêv û gûzên ku min xeyal dikirin bûne refê leşkeran, ez hindekî li ser leşkeran ponijîm. Çima ev ref bi firokeyan bi paş de neçûne? Çima mane hetanî vê gavê? Wê çibikin gelo? Her wiha gelek pirsên din çêdibûn. Di navbera min û leşkeran de dûrbûna qilêşê zêdetir bû, lewra ger xwe





Her tiştek di nava çiya de cuda ye. Di hundirê çiyan de mirov xwe azad hîs dike. Wekî teyreke baz bi serbestî difire. Bêyî ku mirov xwe di bin desthilatdariyê de hîs bike. Bi nêrîneke azad û wekhev jiyan dimeşe. Zagonên ku têne bikaranîn, zagonên komûn in. Gava mirov van tiştan tîne ber çavên xwe û van tiştan bi xwezaya çiyan re dide ber hev, xwezaya paqij dilê xwe vedike. Wê çaxê mirov bêyî ku hay ji xwe hebe, bi vê xwezaya çiyan re dibe yek û dibe parçeyekî ji vê xwezayê.

Ev tiştê min anî zimên, aliyekî rastiya jiyana çiya ye. Aliyên dinê wekî bîranîn, şer, hevaltî, girêdana hevalan bi hev re û hwd. her têgînek ji van têgînan bi serê xwe mijareke taybet e. Bi cildan pirtûk li ser hatine nivîsandin.

Ez vegerim çiyayê Zapê. Ê ku ji me re bûye pir meraq û meram, ka çawa ye? Ez dîsa bibîrbînim wê bi kêr bê. Em di biharê de ne. Bihara çiyayê Zapê, xemleke bûkanî dide xwezaya wê, ji aliyekê ve herîkîna ava Zê ango Zap ketiye lezbûnê. Wekî ku di pêşbirkê de be. Bi xwişka xwe Dîcle û birayê xwe Xabûrê re. Ji milekî din ve, dar jî kêfxweşiya xwe tînin ziman, wekî zarokê nû bi nû fêrî gotinan dibin. Wan jî nû bi nû pelên xwe dibişkuvandin û dixwestin pareke wan jî hebe di xemla bûkaniyê de. Aliyê dinê jî, ji ajalên kovî pezkovî jî, ji wargehên xwe derketibûn û di nava di gir û dolên van çiyayan de lotikan davêtin. Siworî têjikên xwe nû bi nû çêdikirin û bi jiyana xwe ya jiyana gerîlayan re, bi kêfxweşî didomandin. Di gelek ciyan de li Zapê em rastî vê rastiyê hatin. Jixwe tu dibêjî, qey hatine kedîkirin.

Dîsa jî dem bi dem, karxezaliya pezkoviyan di dawiya mehên biharê de, karikên xwe tînin dinê û dizên. Tiştê herî balkêş a van pezkoviyan ev e, gava ku dizên, tenê du saet jêre pêwîst e da ku bikevin gera jiyanê. Li pey dayîkên xwe dikevin rika asê û fêrî ezmûnên jiyanê dibin. Koma me ya gerîla jî, ji aliyekê ve dişebe van karikên pezkoviyan. Em jî nû hatine nava çiyan û dixwazin fêrî jiyanê bibin.

Me behsa av, dar û ajalên kovî kiribû. Niha jî em werin warê bilind, keviyên berfê, kulîlk û berfînan. Wekî keviyên berfa Kurê Jahro, wekî gulên şilêr jixwe xaka Kurdistan û çiyayên wê, ciyê van gulan e. Li cîhanê wekî van gulan li tu deverê gulên şilêr nîn in. ji bo wê jî, hêjaye mirov bîne ziman û wêneyek li kêleka wê bikşîne. Niha jî em nebêjin, çima warê bilind, çima Kuro Jahro? Ji ber ku, ger Zap bi tiştên me anî ziman û xwezaya xwe ve wêne be, warê bilind jî dibe pirvaz û ev jî qîmeta wêne hîn buhatir dike.

Li ser van hemûyan de, ya ku hîn bêtir bi wate dikin gerîla ne. Gerîla, ev parçeyê xwezayî, hebûna van çiyan jiyan dikin û bi wate dikin. Li kêleka ava Zê, her carekê tu lê temaşe dikî û keç û lawên gelê me, tê de dibîne, di keviya vê avê de govenda şahiyê lidarxistin û wekî bilbilan bi hilatina tîrêjên rojê re dikevin liv û lebatê û reng didine xwezayê.

Me ango koma me ya gerîla, bi çavên xwe bûne şahîdên van rastiyan. Van rastiyan jî hêvî, xwestek û wate da jiyana me. Bi me re girêdana bi mirov û bi xweza, bi mehan rengê rastîn derxiste pêş me.





sar û cemidî bû jî, lê nedikarî kerba dilê min û hestê bêrîkirina min a ji hevalan re sar bike. Hemû hest û xeyalê min li cem hevalan bûn. Tenêbûna ez di hundirê xwe de wekî findekê dihelandim. Îcar ez ê çi bikim? Çi bikim… ha erê min gotibû ez ê biçim ser rêka ku ji Marînosê ber bi Mezrayê tê û ji wir jî tê Katoyê. Jixwe rêka di nava Mezrayê re derbas dibe, lewra ya herî baş ez biçim li wir, li wê derê darên fêkiyan hene. Gûz, Karçik û Sêv hene. Jixwe ez ji birçîna bêtaqet bûme. Ji ber wê ya herî baş ez bikim berî ku tarîtiya şevê rûyê erdê bipêçe, ger tarîtî bibe ez ê bi zehmetî bikaribim fêkiyan bibînim. Min wê gavê bi lez xwe ber bi jêr de berda. Di wê şiverêkê de min lotik didane xwe. Heçku dinya hemû ya min be. Ger ez bibêjim rewşa min ji ya çûka ji qefesa hesinî azad dibe û bi firê dikeve, wê pir zêde nebe. Ji kêfan re ez bi giraniya çente û çekê nedihisiyam. Ez dimeşiyam û min ji xwe re xeyalên pir xweş û xweşik çêdikirin. Bi van xeyalan ve ez gihîştim darên destpêkê yên Mezrayê. Lê ev der ne dera fêkiyan bû. Dar darên biyan bûn, hindek pelên wan zer bûbûn. Di nava zozanan de hebûna darên wisa dîmenekî gelekî xweşik dida hawîrdor. Vê dîmenê dilê mirovan şa dikir. Lê mixabin ez bi romantîka vê dîmenê pir zêde di vê gavê de hestiyar nedibûm. Ji ber ku van daran pêwîstiya min pêk nedianîn. Bi hêviya dîtina darên fêkiyan, ez di nava van hizr û xeyalan de bûm, ji nişka ve ez çi bibînim! Ev çi ye? Ev kî ne û ji ku derketin? Ji bona xatirê Xwedê ma niha wextê van bû.

Kê bawer dikir ku çend saet berê ev girê xuya dikin tev tijî leşkerbûn û duh ev der tijî heval bûn, cengeke giran û bêhempa li dar bû, dengê topan bû û bi xwe re jî dûmanek reş û bêhna barûdê dianî. Li ser vê xaka bi xwîna ku sor diherikî, kî bawer dike ku li vir şerekî bêhempa û berxwedaniyê hatiye meşandin. Di vê cenga berxwedaniyê de çend berxwedêr şehîd bûn û ev xak bi xwîna xwe neqişkirin. Wekî Nûjîna delal û Xişmanê çavbelek, kî dizane? Belkî jî hindek lehengên din jî stêrkên wan xuricîbin. Jixwe dayîka gelek leşkeran mane bê lorîk, evîna evîndarê gelek leşkeran di vê cengê de sar bûn û bê evîndar man. Kela gelek dê û bavên leşkeran wê bi birînên zarên wan der bibin. Bekî jî niha gelek ji wan leşkeran di nexweşxaneyan de sêkerata mirinê dikin.

Bi van hiziran re min hêdî hêdî çentê xwe da pişta xwe û min destê xwe avête çeka xwe û xwe binişûvî ve berda. Berê min li Mezreya Marînos ve bû. Carnan bi bez, carnan bi lez û carnan jî bi meş. Di dawiya dawiyê de min xwe gihande keviya ava ku di ber Katoyê re diherikî bêyî ku ez çentê xwe ji pişta xwe bikim. Min yekser bi devkî xwe dirêj kir û min devê xwe xiste nava wê ava sar. Qurt ha qurt, heta ku ji min hate min wê hunguvî vexwar, wekî zarokê ku naxwaze devê xwe ji pêsîra dayîka xwe derxe, min jî nedixwest ku devê xwe ji nava avê derînim. Bi vexwarin avê re, wekî miriyê ji nişka ve bi ser xwe ve were li min hat. Piştî min têrî xwe av vexwar, min zanî ku piştî her tengasiyekê firehiyek heye. Her çiqas Ava Rûbarî





***

Berî derbasbûna dilê Kurdistanê Botanê rawestgeha pêşîn Heftanîn e. Lewre ez jî li vî dilî me.

Bi gotina bav û kalan, dibêjin ku navê Heftanînê ji vê çîrokê mirov dikare bigire dest. Heftanîn bixwe navê gundekî ye ku di nava herêma di navbera Cudî ta Metîna, di nava van rêzeçiyayan de ciyê xwe girtiye û li ser sînorê bakur û başûrê Kurdistanê ye.

Li bakurê Kurdistanê li milê Qilebanê, ciyekî zozanî ku bi avên xwe dewlemend e û niha jî navê wê li ser e. Jê re dibêjin Tenîn. Ev der ciyekî pir xweş e. Bi taybet jî bi mintiqa bavê kalan ku ciyê çêrê û xwedîkirina sewalan e. Ev jî bi xwezaya kurdan re ku ji neolîtîkê mayî ye dibe yek.

Lê bi sedema ku pevçûnên eşîran li vê herêmê, parçayek ji gelê me yê vê derê, mecbûrî koçkirinê bûne û ber bi başûrê Kurdistanê ve çûne û di nava van rêzeçalakiyan de gundekî ava kirine û navê Heftanîn lê kirine. Yanî –ev cih heft caran ji Tenînê xweştir e- û di wê demê de û vir ve navê herêmê û gund bûye Heftanîn.

Herêma Heftanînê di nava Têkoşîna Tevgera Azadiya gelê kurd de, ciyekî xwe yê pir girîng û watedar heye. Mîna her deverekê, li Heftanînê jî berxwedaniyên bêhempa hatine meşandin. Gerîlayan bi xwîna xwe, bi xwêdana eniya xwe ev herêm kirin wargeheke bihûştî.

Gerîla berî ku dest bi şerê çekdarî bikin, li vê herêmê bi cî bûye. Femandarê mezin û şehîdê nemir rêheval Egîd bi xwe jî li vê herêmê maye. Ji ber ku xweza û erdnîgariya Heftanîn bi zirûfê gerîla û şer re, tim û tim roleke navendî lîstiye.

Li Heftanînê, ava Xabûr pir bi nav û deng e. Jixwe ser kaniyokên ava Xabûrê, ji bîst û çar kaniyên FaraşîHnê diherike û herikîna ava Xabûrê wekî damarê xwînê ji dil belavî tevayî laş dibe. Ev wisa xwedî wateyekê ne û ev jî xeml û bedewiya xwezaya Heftanîn hîn rengîn dike. Dîsa jî ava Hêzil ku dibe sînorê bakur û başûr, Cûdî û Heftanîna delal ji hev diqetîne.

Ji milekî din ve, Kela Şabanîkê û Sîlsîleya Kêrê(Toros) jî, ji vê derê dest pê dike û dibe xeta Heftanînê ya başûr. Ji aliyê xwe yê bakur jî; girên mîna Kêla Spî, Kêlka Sînor, Deriyê Dawetiyê û Zozanên Gêra Berana ya ku bi bilindiya xwe û berfa xwe çarçoveyeke gelekî xweşik ji Heftanînê re çêdike û hêjayî ku mirov wêneyekê wê bikşîne û têbixe nava albûma xwe û tim û tim bibîrbîne.

Piştî ku me derdor da nasîn, ka me werin li naverok û hundirê Heftanînê. Çiyayê Heftanînê bi bereket û xêr û berên xwezayî tijî ne. Her derê wê, bi taybet li derdora keviyên Ava Kêşan, Pîrbila û Geliyê Pisaxa ji mêwan tijî ye. Ev xêr û ber hem debara gel û hem jî ya gerîlayan dike û zêde ye. Darên xwe yên gûzê û rez ên xwe yê tirî bêhesab in. Bihara Heftanînê ji Newrozê dest pê dike. Her derê wê hêşîn û avên wê zêde dibin. Dîsa bi ajalên kovî jî gelek dewlemend e. Pezkovî di meha gulanê de dizên û bi





hêsan bû. Her yek ji ya dinê zehmetir bû. Her pirsek birînekê di hundirê min de çêdikir û her pirsek wekî ku tîrek li kezeba min bikeve jan dida û axînên kûr bi xwe re tanîn.

Bi vî rengî di lêgerîn kirin û nekirinê de min biryar da û ji xwe re got: "Ger çûyîneke hevalan çêbûye, eseh di astenga navbera Katoyê Marînos û Katoyê Navîn re çûne. Jixwe ew teqîn û dengê çekan bîlesebe nînbûn. Lewra ya herî baş ez biçim li nêzîkî rêka ku ji geliyê tê Katoyê bisekinim. Ger vegereke wan hebe wê di vê rêkê de be; ji derveyî vê biryarê min tu çareseriyeke din nedidîtin. Ji ber ku dibêjin:" Di rewşên zehmet û zor de biryara herî xirab, ji bêbiryariyê baştir e" Lewre ez ê berê xwe bidime Katoyê. Ji bo careke dawiyê bi nêrînê re çavên min li Mezrayê asê bû. Xuşîniya ava Rûbatî dihate guhên min, heçku ji min re bibêje; were were, bila dilê te rehet be, tiştek tuneye, were ez dizanim tu çiqas tî yî, were lêvên xwe têxe çavkaniya min û hetanî tu dikarî vexwe.

Ji tîbûnê re min zimanê xwe yê nîvziwa bi ser lêvên xwe re bir û anî û lêvên xwe şilkirin. Piştre jî hindek din min guhê xwe da derdoran. Dengê Kewê Gozelê xweş û zelal dihate guhên min, ne wekî roja yekê bêhes tbûn; pir xweşik bang dikirin; Qeb… qeb… qeb… heçku wan jî bangî min dikirin. Erê dengê qebqeba kewan xweş bû, lê xweziya min ew bû ku li şûna qebqeba kewan dengê hevalan bûna…

***

Belê!

Bi çûyîna leşkeran gelek tişt hatin guhartin. Min dîsa destê xwe avête kîsikê tutunê, lê vê care ez bi xiştepişta wê diltengijî nedibûm. Min cixareyekê li gorî dilê xwe û nexiloxwarî, wisa stûr pêça. Vê carê bê ku ez kefî û çadirê bi xwe de kim, wekî şevê din, min dest avête heste û min teliya xwe li çerxê da û wekî şevê din min çirûskê wê jî zêde ferq nedikir. Her tişt ne wekî şevê din bû, ne wekî gava din bû. Êdî gelek pirsên di serê min de bersivên xwe didîtin. Heta kişandina min a cixareyê jî ne wekî şevê din bû. Min cixare di nava teliyê xwe de dizivirand. Kêleka neynûkê min ji nîkotîna cixarê zer bûbû. Her wiha berî ez xwe berdim û careke dawîn min keşfa xwe baş kir. Ez piştrast bûm. Ji ber ku dijmin tev peşde çûbû. Careke din hizrê min çêbûn. Dijmin jî ji herêmê zivirî, operasyona bilanet paşde çû, îce ez ê çi bikim? Gelek karên ku min bikirana hebûn, lê karên herî xwe zêde dida pêş, pêwîst bû rojekê berî rojekê ez xwe bigihînim hevalan. Mixabin bi vê pêwîstiyê re jî xwe gihandina hevalan ne hêsan e. Kî dizane? Ka niha li ku derê ne, li ber kîjan tahtê, di kîjan şikeftê, li kîjan girî û di nava kîjan daristanê de ne. Gelo? Tî ne, birçî ne, kî ji wan maye? Kî şehîd bûye? Kî birîndar e? Bi çi dihizirin? Wê kengî vegerin? Wê vegerin an na? Di kîjan rêkê de çûne gelo? Her wiha bi qasî daristanekê ji pirsan di serê min de çêdibûn. Bersiva hemûyan jî ne





karên xwe re her sibeh û êvar li ser tahtan lotikan davêjin û ji hilatina rojê bigire û heta çûyîna rojê xwe li ba dikin.

Havîna Heftanînê, ne zêde germ e. Zivistana wê jî ne zêde sar e. Ev jî ji bona jiyana gerîla avantajek e. Mirov dibêje qey, ev xweza ji bona gerîlayan hatiye afiradin. Ev herêm ji bo birêvebirina şerê gerîla jî rastiyeke çav jê nayê girtin.

Bi taht, kevir, dar, dol û girên xwe; bi şikeft û bi ciyên xwe yên asê her tişt bi dilê gerîla ye. Şerên ku li Heftanînê hatine meşadin, di dîroka têkoşîna me ya çekdarî de ciyên xwe yên girîng hene. Şerê 92'yan zêdetir li vê herêmê lidarket. Em her tim dibêjin kompioya navneteweyî di wan deman de dest pê kir. Lê berxwedana lawên çeleng û keçên bedew, kirin ku ev plan û lîstik bêling bimînin û dane peytandin ku, gava dilên azadîxwaz û paqij, bi xwezaya dilpak û xweşik re bibin yek, wê tu carî tu hêz nikaribe veqetînek di nava wan de çêbike. Îro jî ev herêm bi hemêzkirina lawên xwe yê gerîla dibe mijara ku destanên lehengiyê li ser were nivîsandin û layîqî vê yekê ye. Em ê jî vê rastiyê, tu carî ji bîr nekin.

Şehîd Viyan Soran, çalakiya xwe li vê herêmê lidarxist. Çalakiyên pîroz û mezin, di xakên pîroz de pêk tên. Kurdistan bi giştî jî bûye dergûşa şaristaniyê û vê nepeniya xwe parastiye. Vaye Heftanîn jî parçayek ji vê pîroziyê ye.

Silav ji hevalên ku li wir in!

Silav li gorên şehîdên pîroz!

Silav ji her kesên ku dixwazin te bibînin re!

***

Payîz bû, xwezaya çiyayên Heftanînê hêdî hêdî rengê xwe yê hêşîn werdigerande zeratiyê û amadekariya xwe ya xatirxwestina demsaleke nû dikir.

Daran, pelên xwe yek bi yek diweşandin. Çemê Xabûrê pir bêdeng bûbû û ji her demê zelaltir bû. Bilbilan jî, bi melûlî fîxan û awazên xwe yê dawiyê dirêsandin, şalûl bi baskên xwe yê rengorengo, torên xwe yên dawiyê li ser cih û warên ku guleke penaber, gula payîzan lê dijî, wekî ku xatirê xwe yê dawiyê bixwazin ketibûn nava amadekariyan. Tevaya xwezayê xwe ji bo demsaleke bi sir û seqem, bi berf û baran û şiliyê re amade dikirin.

Di nava vê xwezaya ku dilê mirovan şa dike de, guleke payîzî şaxê xwe berdabû, ta kûrarahiya zemîn, bi xeml û xêza xwe rengê vê xwezayê rengîn dikir. Wekî ku di bendewariyê de be. Gula payîzan ku her kes nikare bibîne û nabe qismet û miradê her kesekî, ji bo wê jî ger mirov bi (Gula Evînê) sembolîze bike, wê ne şaş be. Taybetmendiya herî balkêş a vê gulê, ew ê ku bi her kesî re bêhna evînê parve nake, ji bo wî jî, gelek kes dibêjin, "ka ev gul tê xapandin, bi barana payîzan." Lê ya rast jî ew e ku, ev kesane rastiya vê gulê nizanin û ji evînê û hezkirinê bêpar mane. Ji bo wê jî, gava rastî gulê jî tên, gul di wê demê de xwe diçilmisîne, ev çilmisandin jî, nerazîbûn û kêfnexweşiya wê dide diyarkirin. Lê belê, ger kesekî ku heta wê demê li ber tu gula rûneniştibe û dilê xwe ji tu gula re venekiribe û bi tu gula re bêhna evînê parve





terqîn ji devê wê dernediket. Her wiha li pey hatina kobrayên şer rêzefiroke wekî refên qijakan hatin. Dengê qupegupa wan ji ya firokeyên kobra cuda bûn. Dengê van firokeyan nazik bûn. Yanî li gorî yê kobrayan. Ji ber ku dengê kobrayan pir tûnd û dijwar in. Piştî ku firokeyan tûrên bilind bi ser cihê leşkeran re avêtin, hêdî hêdî xwe berdan bi ser Marînosê û her ku diçû xwe nizim dikirin û dawiya xwe didan wê derê û xwe datînin erdê. Pênc firoke tijî dibûn, penc vala dibûn. Hemû leşkerên li derdora gund bi vî awayî ji gundê şewitandî hatin girtin. Niha hate fêmkirinê ku, çima firokeyên kobra tûr diavêtin. Hewl didan parastina firokeyên ku leşkeran sewqiyat dikin an ji gund radikin bikin. Ev rewş moralê min xweş kir. Ji ber ku firokeyên kobra fîlek û roketan nediavêtin. Ev jî dihate vê wateyê ku, hê jî ciyê hevalan diyar nebûye û pevçûneke cidî çênebûye.

Saet çarê esirî bû. Bi çûyîna firokeyan re, dengê leşkeran jî qut bûn. Ji bona ku fêm bikim ka hela li hêla Katoyê çi ye, ez ji qelîştekê derketim. Min derdorê di ber çavan re derbas kir. Bi dûrbînê, min li derdorê baş nihêrt. Min bala xwe da Girê Reş. Ev gir, girê kordîna dijmin bû. Li wir leşker xuya nedikirin. Gir vikî vala bû. Êdî dûrbîna min a yekçavî, bersiva gelek pirsên min zelal dikir. Di van rojan de dûrbîna min, min li nîvê rê nehişt. Ew dûrbîna min a ku min bi pelê cixareyê çavikên wê paqij dikir. Min vê carê jî, ji bona ku toza cengê ji ser rabikim, paqij kir. Min çente û çeka xwe girt û derketim keşfê.

Hîn jî dengê leşkeran tê, lê ev deng ne dengê gava din bû, erê refek derbas bûye û ev refê din e, ez kêmeke din şadbûm û min ji xwe re got: Baş e yê li pêş negeriyan, çima yê paş wê bigerin? Di çeperê de şehîdbûn bê minet bû, lê li vir û di vî halî de pir li min zor dihat. Hîna gelek tişt ne diyar in, belkî jî şehadet çêbibe. Ma ne hevalê Xişman bû bombeya xwe bi xwe de teqand, lewra ger rewş were ya dawiyê, çawa ku ez û Xişman bi hev re tevlîbûn ez ê jî pîma bombeya xwe bikşînim. Lê hîna dema wê maye, hîna tu dengê lingan bi ber min ve nayê. Her ku xulek derbas dibûn dengê leşkeran dihate guhên min. Her yek tiştek digot. Belkî jî hindek bêdeng derbas dibûn. Ji hev re digotin, hişyar bin. Wisa dixuya, leşker ji qelîştekê derbas bûne. Min careke din destê xwe avête dûrbînê û min dîsa berê wê da gundê Marînosê. Vê care hîn hûr û kûr min hemû rexê gund û derdoran di ber çavan re derbas kir û min li ber deriyê hemû gundiyan mal bi mal mêze kir. Firoke jî didu didu diçûn û dihatin. Car li vî girî û car li yê din tişt datanîn û hin caran radikirin, lê çibû datanîn û radikirin?

Di vê nevberê de dengê firokeyên kobra ji dûr dihatin bihîstin; gup, gup, gup… Ev hatina wan ne ji xwe ye. Hebe tune be wê guhartinek çêbibe. Îhtîmaleke herî mezin min ji xwe re didanî ew bû ku leşkeran cihê hevalan dîtiye û ha… ha pevçûn destpê bike. Lewra firokeyên kobra hatine hewarê, lê wekî ku min texmîn kir çênebû. Berovajî wê kobra jî wekî firokeyên skorsky tûrên vala davêtin û





nekiribe, hetanî dîtina gula evînê û bi dîtina gula evînê jî, bêyî hay ji xwe hebe li kêleka wê rûniştibe, wê demê gul jî, rengê xwe yê veşartî dertîne û bêhna evîna xwe dadiwerivîne nava damarê dilê wî kesî/ê. Ger sembola wî kesî jî (Bilbilê Xengîn) be, wê ev çîrok wateya xwe baştir bigire.

Di vê navberê de, Bilbilê Xemgîn, ji biharê ve koçî warê bilind kiribû û difiriya li asîmanê jorîn û her dike fîxan û bi çavên vekirî, li gula ku ew dixwaze digere her digere. Dixwaze ku bibîne û li kêlekê deyne, pê re awaz û fîxanê hezkirinê parve bike.

Bi salan halê vî bilbilî, her firîn û ger bû, lê mixabin tim û tim bi melûlî, bi baskên şikestî vedigeriya hêlîna xwe ya kevirî. Vê carê jî bi dilşikestî vegeriya. Lê tu caran hêviya vî bilbilî qut nebûbû, xuyaye vê carê ev hêvî wê bêencam nebe, wê hêlîna xwe ya sar bi bîranînên gulê re carek be jî, bi germahî derbas bike. Di vir de jî, tiştê herî balkêş ev e; gula payîzê ku her car cihê xwe di nava kendalan de, di cihê asê de dibûşkuve, vê carê jî xwe berdabû cihekî wisa ku Bilbilê Xemgîn jî wî cihî, ji xwe re wekî hêlînê bijartibû. Bilbil jî vê carê, li hêlîna xwe ya kevirî, ya di nava tahtan de geriya bû. Wer xuyaye ku herduyan jî, -Gulê Bilbil- di nava xwe de hîs dikirin. Ku dema hevdîtinê nêzîk bûye. Tê gotin ku -ya dila dikeve dila- ev rast e, ji bo wê jî gula payîzê hemû xweşikbûna xwe anî der û dibiriqî. Pelên xwe yê ku heta niha venekiribûn jî vekirin, bi vê biriqandinê dihişt ku bi şevê jî, şewq û şemala xwe bide asîmanê jorîn. Stêrk jî, li ber şewqa gulê vedimirîn û serê xwe ditewandin. Bi rojê jî tevayî bêhna xwe belav dikir, wekî ku bibêje; “Ez li vir im, ma tu min nabînî ey bilbil!

Were li cem min rûnê, ma ne ez im gula ku bi sala ye lê digerî. Were ji min re awazên dila bibêje. Fîxanên xweş birêse, ez jî hîn bêhtir şa bibim û tevayî bêhnên xwe yê evînê dawerivînim nava dilê te. Dibe ku ji wê demê, hîn awazên xweş û geş jî, ji nav lêvên te derkevin, de were ey bilbil, de were!"

Bilbilê Xemgîn jî hemû hêza xwe bi hesreta dîtina çendî salan, bi çavên vekirî, her li asîman difire û digere; li ser vê darê, li kêleka vî çemî, li nava lat û zinaran bê rawestan, dike û nake nikare cihê gulê bibîne. Ne tenê bi roj, bi şev jî li ber ronahiya şevqa gulê her digere, bi wîqewîq, awaz li ser awazê çêdike, bi van awazan jî vê dibêje: "Ey gula evînê, tu li ku derê yî, ma tu lêdana perdeya dilê min nabihîzî, ma dengê awazên min nayê, ma tu zalim î, gunehê te bi halê min nayê, ka ji min re bêje; te xwe li ku derê veşartiye, ma ne bes e, ey gul!"

Hevdîtina bilbil û gulê pir nêzîk bûye. Lê ji ber evîna zêde, di cihekî biçûk de jî nikarin hevdu bibînin. Piştî vê gera dûr û dirêj û bê rawestan, piştî ewqas nêzîkbûn ku nikarin hevdu bibînin; gulê careke din pelên xwe kişandin nava xwe û xwe çilmisand, şewqa asîmanan kêm bû, bêhna xwe ya xweş û geş ber bi xwe ve kişand û dîsa jî ma di bedewiyê de.

Bilbilê ku baskên wî ji firînê qerimîbûn, bê taqet man, li şûna awazên hevdîtinê û evînê, dest bi awazên dilbiêş û dilşewat kir û ji bêhêziyê ji jor de hate xwarê û bêhemdê xwe kete xewa giran. Tarî kete ser rûyê erdê, tiştek diyar nedibû. Bilbilê Xemgîn di xewa xwe de xewnên hevdîtinê





Min jî her berê dûrbînê ji wan leşkeran dibire ser yê din. Ji wan didim ê din, lê dikim û nakim tiştikê ji tevgera wan fêm nakim. Ew ê çi bikin? Ez pir bi xwe ve mijûl kirim. Piştî ku roj ji rojhilat bilind bû, min li saeta xwe nihêrt, saet ji heştan dibûhirî. Leşkerên ku derdora gund girtibûn, wekî garanê bê gavan xwe berdan nava gund.

Dûyê reş xelek xelek ji nava gund hildikişiyan. Fena palûkeyekê dixuya. Pê re jî dengê çekan li tahtên Katoyê olan dida. Ji jêr ve leşker digeriyan û ji jor ve firoke difiriyan. Ew jî heçku li tiştekî digeriyan, lê ez hîna jî nizanim bi zelalî çi bûye, tenê texmînan dikim. Hîna çavên min li ser Marînosê ne û li ser komê leşkeran bû. Dengê serbazekê dihate "Dîkatlî olun, buralarde saklenmiş olabilirler." Min leşkeran bixwe nedidît, lê dengê baş dihatin.

Li bendê bûn. Ku leşkerek xwe berde qelîştekê, wê ji bona bûbûna kêliya dawîn. Qe nebe, dema ku ez biçûma, min çend heban jî bi xwe re bibirana. Narîncoka min di dest min de amade ye. Tenê bizmikê wê kişandin bes e. Wê qeliştek bibe qelişteka xwînê, lê cihê min ewqasî asê ye. Rewşa min jî wekî du diliya minbû, geh hebû û geh tunebû, lê vê care wê kîjan be ez nizanim. Hîna jî dengê leşkeran li ser serê min dihat û diaxivîn û dimeşin. Her çiqasî dengê wan ez pir aciz dikirim jî gotinên wan pir tirş û talbûn jî, lê dîsa min guhê xwe baş dida wan. Belkî ez tiştekî ji wan fêm bikim.

gundê Marînosê teqereqa fîşekan dihat. Min xwe da cihekî wisa ku ez fîşekên agir bibînim. Fîşek ji jor de dihatin teqandin. Berê gulebaranê jî li gelî bû. Min li saeta xwe nihêrt, ber destê sibehî bû. Min baş ji hev dernexistin. Gelo heval ketibûn kemînê. Ku wisa bûna, wê ev ne rewşeke baş bûna. Lê wisa dixuya fîşek yekalî dihatin avêtin. Dibe ku leşker ji tirsan davêtin an jî tiştek hirçek, lawirek li wan bûye reş. Ji ber ku gelek caran ev bi serê leşkeran de dihat. Fikrekî din jî ji min re digot: " Na … na ma çima heta niha leşkeran fîşek nediteqandin. Hebe tunebe tiştekî neasayî li vir çêbûye û îhtîmaleke mezin e ku heval di wir de paşve kişiyabin." Jixwe tu riyên din tunebûn ku heval tê de biçin, lê çima ewqas dereng mabûn min nedizanî.

Bi qasî saetekê zêdetir her dengê fîşekan dihat û pê re jî dengê teqînên bombeyan dihat. Van teqînan jî mejiyê min hîn tevlihev dikir. Bi berbangê re dengê teqîna fîşekan sekinî û dinya her diçû zelal dibû. Min bi lezgenî dest avête dûrbîna xwe ya yekçavî û ji jor ve min li gund nihêrt. Leşkeran dora gund dorpêç kiribûn. Riya xam a ji cem dibistana gund ber bi astengê ve dirêj dibû, rêzek çeper hatibûn çêkirin û ew der tijî leşker bûbûn. Girê li milê rastê gund ber bi gundê Anîtosê ve, ew der jî tijî leşker bûbûn. Dîsa ew girê pişta qereqolê tevkî leşker bûn. Li her derekê komeke mezin ji leşkeran wekî komê moriyan bi cî bûbûn û hemû jî heyanî vê gavê bê tevger bûn. îhtîmaleke mezin li benda fermanê bûn, lê heta niha tu liv û lebat ji wan çênedibû.





didît. Gula Evînê jî, ji serma xwe pêçaye nava xwe û bi xeyalên hevdîtinê xwe germ dike.

Xew û serma, lê ya rastîn yek xeyalê hevdîtinê jiyan bike, ne xewn û ne jî serma di nava wî/ê re derbas nabe. Ji bo wê jî em bibêjin, li hêviya tîrêjên rojê bûn wê xweştir be. Lê çawa ku bendewarî, çirkekê dike deqîqeyek, deqîqeyek dike saetek û saetê jî dike salek. Wê şevê jî wisa dirêj ajot.

Çawa ku piştî her tarîtiyekê rohnahiyek heye, bi gotina gelêrî; "Çiya bi çiya nakeve, lê çav bi çavan dikeve." Ev hêvî jî, ji herdu evîndaran qut nebûbû. Her roj bilbil û Gula Evînê di nava lêgerînê de bûn. Hêvî bi bilbil re awazên zelal derdixîne. Her car awazek ji ya din xweştir çêdike û awazên xwe dike orkestra.

Gula Evînê jî, her roja ku diçe rengê xwe hîn xweşiktir dike. Bêhna wê ya evînê ji her demê zêdetir belav dike, vê bêhnê dihişt ku ne tenê Bilbilê Xemgîn, tevayî bilbilê li wan der û doran, li gulê bigerin. Lê gula payîzê jî şareza bû, dizanî çawa xwe baş veşêre, dizanî ku gelek bilbilê xapînoker hene û ew li hêviya bilbilê dirûst bû, ku di dilê xwe de paqij e. Ta ku bikaribe hesret û hestê xwê pêre parve bike.

Dîsa bû şev, vê carê tîrêjên rojê, hinekî dereng li warên bilind dan û hêdî hêdî xwe ber bi jêr de berdidan. Cih û warên gula payîzê ku lê dijiya, şeveke sayî hebû. Stêrk bi biriqandina xwe wekî ku bikenin û bibêjin, sibê roja hevdîtinê ye. Ji bo wê jî gulê jî nîvî şevê û şûnve dest bi amadekariyên xwe kir, tev jî ji bo pêşwaziya Bilbilê

Xemgîn bû. Ji sibeyî de ewr, mij û moran tunebe, wê bilbil jî bi hêsanî bikaribe bigere û bifire.

Di beyaniya serê sibê re, bi hilatina tîrêjên rojê re, gulê amadekariyê xwe temam kiribû. Pelên xwe yê rengorengo li xwe kiribûn, hemû xweşikbûna xwe danîbû, wekî bûka baranê pir-reng bû, an bi maneyeke din mîna bûka çavbikil bû. Jixwe, çavên gulê pêwîstî bi tu kilan tunebû, jixwe di xwezayiya xwe de dibirîqî. Piştî ku gula payîzê perdeya şevê ji ser çavên xwe rakir, bi wan çavên xwe yên dibiriqe li rastê xwe nihêrt ku çi bibîne. Bilbilekî Xemgîn jî, ji firyanê û geryanê westiyayî û bêtaqet ketiye û bi melûlî li bin dareke çinarê razayî ye. Ji ber geryana wî ya şevê, bi hilatina rojê nehisiya ye. Gula evînî, nizanibû ji kêfan çibike û di dilê xwe de, vî tiştî got; " Hebe tunebe bilbilê ku ez bi salan e lê digerim ev bilbil e. Ka ez rabim bêhna xwe ya evînê ya veşartî, bi ser vî bilbilê ve bireşînim. Ger bi xwe hisiya, jixwe bilbilê dilê min ev bilbil e. Berovajî wê, na! 'Û dest bi şandin û rêkirina bêhna evînê kir. Bêrawestan û bi çavên vekirî, hêviya şiyarbûna bilbilê melûl kir. Ta ku carekê ji nişka ve wekî ku bilbil bivecinige û ji nişka ve şiyar be, bêyî hay ji xwe hebe berê xwe da cihê ku bêhna evînê jê tê. Piştî ku çavên Bilbilê Xemgîn li aliyê çepê zivirî ku çi bibîne. Gula evînê bi çend gavan jê dûr sekiniye û bi çavên bendewar lê temaşe dike. Bilbilê Xemgîn nizane çi pê hat. Ji kêfan, her ku bêhna evîna gula payîzê dikşîne, wekî ku serxweş bibe, nema êdî dizane kîjan awazê birêse, gelo dixwest awaza strana (gulê neçe neçe..) an jî çi? Êdî bilbil winda bû di nava bêhna evînê de. Gula payîzê jî, ku li hêviya şiyarbûna Bilbilê Xemgîn e, gava ku dît bilbil şiyar bû, ji kêfan re xunav bi ser pelên xwe de berdan ango rondikê eşq û





pêket. Firt li ser firtan min dûyê cixareyê kişande hundirê xwe. Jixwe nîvê dûmana bi gewriya min ve ma û nîvê din jî diçû hundirê min. Min digot ez ê kela dilê xwe û kerba tenêbûnê bi cixareyê derbas bikim, lê ji ber ku ev demek bû min cixare nekişandibû, lewra bi ser kovana dilê min de ez gêj kirim û serê min zivirand. Her wisa piştî vê sergêjiyê ez têgihiştim ku kul û kerb bi cixareyê nayê borandin. Berovajî zêde dibin. Piştî ku min xwe dirêj kir, yekser çavên min istêrkan ket. Bi dîtina stêrkan re ez vegeriyam dema zaroktiya xwe ya gund.

Êvar e, em li ser textê xanî radizên. Gava me lihêfên xwe bi xwe de dikirin, carnan di bin de bi henekî min û birayê xwe yê ji min biçûktir, neqûşkan li hevdu didan û hetanî em diwestiyan me dijmartin. Carnan hindek dixuricîn wekî tîrêjkên rojê xwe bi jêr de berdidan. Me digot stêrk rijiyane, her hal mirovek miriye. Di her rijandin an xuricîna stêrkekê de digotin; her mirovek xwedî stêrkeke. Loma dema ku stêrka te xuricî, tu jî dimirî. Lewre me her yek ji xwe re stêrkek dihilbijart û her tim me li ser stêrkekê ku pir diçirisî şer dikir. Tê bîra min wê demê min digot a min e û wê digot a min e heta ku em bi xew re diçûn.

Çawa ku em di biçûkaniya xwe de bi xew ve diçûn, wisa jî ji westandina cengê ya li ser min ez jî di bin wê çadirê de wekî zarokatiya xwe bi xew ve çûm û ji nişkê ve li ser dengê çekan ez ji xewê veciniqîm. Lê dengê çekan ne li cihê ku ez lêbûm dihatin. Ji jêr, li wî geliyê kûr, ji kêleka

Lê berî ku ez beşdar bibim, bavê min ji min re gotibû û ez li gorî vê rastiyê tevlî gerîla bûm. Bavê min digote; "Vê yekê baş zanibe, ev şoreş e ne karê heneka ye û tê de her tişt heye; tîbûn, birçîbûn, birîndarî û şehadet, he rtişt têdehe ye. Ger tê bikaribe van tiştan rabike, wê gavê oxir be ji te re, na ger tu yê nikaribî, li mala xwe be û welatparêziya xwe bike. Ger ku tu çû jî, bi şertekê. Divê tu serê me di nava alemê de netewînî û me şermezar nekî."

Bavê min pir welatparêz bû. Di gund de yekemîn têkiliya wî bi partiyê re çêbûbû, lewra baş li partiyê serwext bû, lê dîsa wekî min gotî ya ku ez dêşandim ne tîbûn û birçîbûn bû. Tenêbûn û qutbûna ji hevalan bû. Min pir bêriya wan dikir, lewra diviyabû min tiştekî bidîta da ku min xwe pê mijûl kiriba. Min destê xwe dirêjî çanteyê xwe kir. Dûrbîn û ew titûna ku min ji bona rojên giran xistibû bin çentikê xwe digeriyam.

Berî ku ez kîsikê titûnê vebikim, min dûrbîna xwe ya yekçav da ber çavên xwe. Her çiqas min dizanî ku ez tiştekî nabînim jî, lê dîsa min da ber çavên xwe. Ji ber ku dûbîna rojê bû, ne ya şevê bû. Pişre min dîsa destê xwe di çente de teland, min kêmek titûn xiste nav pelê cixareyê. Her çiqas cixareya ku min peça xaromaro derket jî, lê çend rojan ji bêcixarebûnê, gelek bi tahm bû. Min kefî û çadira xwe ya komando bi ser xwe de kir û cixareya xwe xist nava lêvên xwe. Bi çirûskên heste re, agir ji ber çarxê çûn, lê pêneket. Careke din min bada, mala Xwedê avabe





evînê rijande. Herduyan jî êdî nedixwestin ku ji ber çavên hev biçin…

Êdî derd û xem derbas bûn, herdu av ketin cihokekî, ku tu kes wê êdî nikaribe wan ji hev veqetîne. Çavên ku damarê dilê mirovan li tevahiya laş xwînê belav dike û jiyanê dide mirov, wisa jî hevdîtina Bilbilê Xemgîn û gula payîzê jî, dibe destana jiyaneke bi evîn û hezkirin. Êdî cihê gulê, bû dilê bilbil. Xwîna dilê bilbil jî, bû xunava serê gulê. Piştî şabûna herduyan, ku heta niha dîtin bû, êdî roja ku hevdu nedîtibana, çavên wan bi hev neketana, wekî ku tiştek winda kiribin xwe hîs dikirin. Roj û meh derbasbûn, tenê bi hestê dilan bi hev re diaxivîn. Her carekê ku li rastî hev jî tên, kes nizane çi dihate serê wan, bi carekê de zimanê bilbil lal dibû. Te digot qey ne ew bilbilê bi awaz e. Dikir û nedikir, nedikarî awazê evînê bi gulê re parve bike. Gula payîzê jî nizanim çi pê hatibû, pir şerm dikir. Ji nişka ve rûçikên rûyê wê ango pelên wê, rengê sor digirtin. Wê jî dikir û nedikir, nedikarî awazê evînê bi gulê re parve bike. Wê jî dikir û nedikir, nedikarî bêhna evînê dawerivîne nava dilê bilbil, tenê evîna xwe, hezkirina xwe bi xeml û xêza xwe, bi nêrîna çavên xwe re dianî ziman. Ev rewş bi Bilbilê Xemgîn re jî heman tişt bû. Ne carek ne du car, ne sê û çar, kes nizane çima? Di hundirê xwe de, evîn vedişartin, xuyaye û rastiya evîna wî/ê ev veşartin. Pêwîst dikir, an jî ez çi bêjim dibe ku jî ne dixwestin kesek vê evînê bi wan re parve bike. Jiyan bi hestên veşartî berdewam bû, ta ku rojek hat. Ne xweziya bi wê rojê. Rojeke zivistanê, bi mij û moran, bi berf û serma û seqem; berfê rûyê erdê spî kiribû û hîn dibarî. Çawa ku Bekoyê Ewan kete navbera Mem û Zînê, wisa jî vê berfê Bilbilê Xemgîn, mecbûrî koçkirinê kir. Mecbûr bû ku dev ji warê

evînê berde û biguherîne. Her çiqas ne bi dilê bilbil be jî, lê carekê çêbû. Ji bo ku bikaribe vê evînê di dilê xwe de bi rengekî paqij biparêze, carekê rêka ne diyar girt. Di kêliyên dawîn de, tenê tiştek ji bilbil re bû kul. Di xatirxwestinê de, dixwest ku bêje; "Ey gula evînê, ger tu dizanî ez çiqasî li te geriyam ta ku min tu dîtî, tu jî li beramberê min van hestan jiyan dikî an na?" Belê bi awaza xatirxwestinê, dixwest vê ji gulê re bibêje. Lê dîsa jî ziman lal bû û hate girêdan. Hestên xwe, encax bi çavên xwe îfade dikir. "Ey gula li ber dilê min, xweziya te bizaniba, ka çiqasî cihê te di vî dilî de heye. Bawer bike, çiqas ku heye wê du caran ewqas mezin bibe." Bi xatirê te! Bilbilê Xemgîn, bi melûlî, baskşikestî û dil bi êş kete rê û ji çavên wî, rondikên bêrîkirinê dibariyan û di dilê wî de bû kul û ma. Gula evînê jî, di xatir xwestinê de, bêyî ku biaxive, bi çavên xwe yê reşbelekî ev digot; "Ey bilbilê ku salan bû li te digeriyam, heta min tu dîtî, min bêhna evînê dixwest bi te re parve bikim. Her roj bi dîtina çavên te şa dibim. Her careke ku li çavên te temaşe dikim û li awazên te guhdar dikim, ma te çima ez hiştim bi tenê. Ma tu kor bûyî, ez ê êdî ji kê re girê bidim vê xeml û xêzê. Bi kîjan xeyalan û ji kê re ez ê jiyan bikim. Ma te xunava li ser rûyê min nedidît. Ma te xêr e ey bilbil, de biçe. Lê bawer bike, tê tu caran ji bîra min neçî û tê her dem di bîranînên min de jiyan bikî. Heta ez hebim, ez ê bi te re bim, bi tu bilbilan re, bêhna evînê ez parve nakim. Ta ku careke din ez te bibînim. Wê demê ez ê ji te re bibêjim. Ka te çi agir berdabû nava dilê min, ez ê êdî ji tariya şevan re binivîsim."

Bi gotina gelêrî; "ya ji dila diçe dila" Çawa ku cara yekem Bilbilê Xemgîn bi bêhna evînê, bi xwe hisiya, vê carê jî li





radimûsa, henekan pê re dikir û min ew dixdixandin, hemû niha li ber çavên min in. Wê jî bi kenekî gelek xweş xwe davête stuyê min.

Niha jî mezin bûye. Perwîn, nizanim ez tême bîra wê an na. Lê ew her tim di dilê min de ye. Jixwe hatina min a van çiyan û tenêmayîna min, hemû jî ji bona pêşeroja van zarokên şîrîn û bedew bû da ku ev zarok azad bijîn û bibine xwedî welatekî azad.

Belê, şerê îro jî enga azadiyê bû. Ev qutbûn, ev tenêbûn, ewqas xwîn, ewqas bedel, ewqas zehmetî ji bo wan e. Ev ne mineteke, ev erk û peywira me ye.

Gelek westiyabûm. Lê min dikir û nedikir xew bi çavên min nediket. Her ku çavên min bi ser hev de dihatin, hîs û xeyalên min ew ji ser hev radikirin. Ji bêxewiyê devê min wekî şikeftekê vedibû û bawîşk bi ser bawîşkan dihatin min, lê min nedikarî ez binivim. Min hewl da rê li ber vê rewşê bigirim, lê min nedikarî. Ji ber ku ne bi destê min bû. Tîbûn, birçîbûn û dilşikestîbûn. Peşiyên me gotine: "Xewa miriya tê, lê xewa birçiyan nayê". Ev rojek û şevek bû ku gepek nan bi devê min neketibû û zikê min qurequr kêm nedibû. Gewriya min wekî axa bêav ziwa bûbû. Tifa ku min didaqurtand jî bi kêleka gewriya min ve dima û nediçû xwar. Lê ev rewş dilê min nedêşand, êşa herî mezin sarbûna bişirîna rêhevalên min bû.

Ji heval û hogiran, ji xwişk û birayên, ji fermandar û şervanên azadiyê. Ji dildarên evîna çiyan qut bûme. Kî evîna min a di cengê de mayî qut bûme û tenê mame. Ji Xişmanê çavreş û ji Nûjîna bedew qut bûme; ji Eşrefê rûqemer qutbûme, ji hevalê (Qendîl, Şêro, Leyla) qut bûme.

Ez nizanim niha heval çi dikin, kî maye û kî çûye? Kî sax e kî birîndar e. Hemû hevalên cengê yek û yek di ber çavên min re bi awayekî zindî derbas dibûn. Gotinên Serdar, dîsa Rêdarê tirsok û revoke, kula Bargiranê ku bi birîndarî di nav dijmin de mayî. Gelo niha ew çi dike? Leza xeyalên min ji leza ronahiyê zêdetir bû. Her ku yek ji wan dihate bîra min, kula dilê min zêde dibûn, keserên bi êş di hundir de ez diêşandim. Her tişt dihate bîra min. Min dikir û nedikir min nedikarî xeyalên xwe berbend bikim, Malbata min hate bîra min, dayîka min hate bîra min ku belkî bibihîze ez wisa tenê mame, wê qîr bike û porê xwe bikşîne û lorînekê bavêje ser min….

Min got dayîk, dayîka min di hişê min de bû. Ma ez ê çawa jibîr bikim ew şevên ku min bi giriyên xwe nedihiştin ku ew razê û min her dem xewa wê diherimandin. Rehma Xwedê li gora dayîka min be, jixwe çûye ser dilovaniya xwe. Dîsa xwişka min Pervîna biçûk hate bîra min. Bi rastî jî gelek delal bû. Ji her kesî zêdetir, min ji wê hez dikr. Gava ku ez tevlî gerîla bûm, ew hîn sê salî bû. Ji min re digote “Keko” Dema ku min ew





ser bêhna evînê firiya û li cihekî rastî bêhna evînê hat. Gula evînê vê carê hemû evîna xwe li ser pelekê xwe, bi bayekê re bi rê kir. Gava ku bilbil rastî pela gula payîzê ya werandî hat, ew hîs di dilê wî de çêbû, ku gulê bi vê pelê dixwaze bêje; “Ji şevên tarî re ez dinivîsim, bi bêrîkirina te, ez jiyan dikim. Bi hesreta dîtina çavên te, ez bi hêvî me.”

Bi dîtina Bilbilê Xemgîn a bêhna evînê, awaz û fîxan rêsandin û bi bayê biharê re, bi bayê nenas re, ber bi warê ku gula evînê jiyan dike, bi rê kir û hîn jî di rê de ye, bi hêviya gihîştin û hevdîtinê ye.

***

Di nava nîşana xwe de digere, bûyerê bi êş bûyerê bi elem, nizanim çi ji te re bêjim, ey Çiyayê Reşk! Gelo lomeyan li te bikim an jî….

Gunehê wan çibû, te ev anî serê wan, ma ne ew bûn hatibûn mêvandariyê te, hatibûn te silav bikin. Dilê xwe ji te re vekiribûn. Mîna teyrê baz, difiriyan. Çavên wan li dîtina te bû. Çavên wan li parastina te bûn. Ma ne ew bûn, rihê xwe xistibûn kefa destê xwe de. Hemû daxwaza wan ew bû ku bi te re bimînin. Bi te re jiyanê parve bikin. Li der û dora gola te govendeke şahiyê li dar bixînin. Belkî jî dixwestin rengê kevirê te yê reş bi hîma dilê xwe bixemilînin. Bi evîna dilê xwe xwezaya te rengîn bikin. Dixwestin bi te re bibin bilbilê awazbêj û stranan birêsin. Hatibûn bibin gulên rengoreng di nava wan mêrgên hêşîn de.

Lê ez nizanim, ne tu kor bûyî, te xemla wan nedidît an jî tu ker bûyî te dengê wan ne dibihîst. Her çiqasî tu kor û ker bî jî, ma te evîna dilê wan hîsnedikir. Lêdana perdeya dilê wan xwe li ezmanê heftan dide.

Heşt hevalbûn, hestê dilê wan wekî paqijiya dilê zarokan dijîyan. Te ji xwe re kiribûn dayîk, xwe avêtibûn hemêza te. Bawer dikirin ku tu jî wan biparêzî. Wer digotin; “Rengê kevirê vî çiyayî rengê reş in. Lê ev çiya di hundirê xwe de ne reş e. Pir-renginiya bûka baranê di nav te didîtin. Di her beyaniya serê sibê re, bi şeveqa tîrêjên rojê re, ber bi rûyê te ve dihatin. Di her rojê de tu silav dikirin. Bi rûkenî, kêfxweşiya xwe dianîn ziman. Rondikên ku ji çavên wan dihatin, dibûne robar û ser can û bedena te de berdidan. Bi van hestên xweşik, bi van dilên paqij. Ev çend heval li dora te civiya bûn. Lê te çikir?

Ma gelo, mêvanperwertî, zarokperestî, di nava dilê te de mabû. Kanî soza baweriyê ya te dayî, xweziya te bigota; “Lawê min, qîza min, biçin ev ne cihê we ye, te ji wan re çîroka 94’an, çîroka 49 nemiran anîba bîra wan an jî çîroka 99’an a heft hevalan, belkî wê çaxê wan jî tu baş nasbikirina û bizanibe ku li şûna xwêdan û avê, bi xwînê tîbûna xwe dişkîne. Rengê ava golê, xwe bi xwînê sor dike. Belkî wê demê bi dilên şikestî xatirê xwe ji te bixwesta û ev bûyer jî nehatiba serê wan. Lê te ew xapandin. Ava gola te ya di binê xwe de dikele, te wekî aramiyekê dida nîşandan. Biriqandina tahtên te, yên tijî kîn, mîna hêviyê pêşkêş dikirin. Rondikên ji çavên te yên wekî kaniyên jiyanê xuya dikirin, di naveroka xwe de lehiyên tolhildanê bûn.





min çente û çeka xwe anî û min berê xwe da wî cihê ku wekî stargehekê ji xwe re bijartibû.

Jixwe çenteyê min pir giran bû, çeka min jî hîn girantir bû; herî kêm çeka min neh kîlo bû, lewra pir bi hişyarî min xwe bi qelîştekê re berda. Tirsa ketina ji kendavê li ser min bûbû wekî sehwekî, lê ne wekî sehwa cengê û wê gorê bû. Min xwe gihande binya qelîştekê û li wê derê ez bi cih bûm. Bi ser tarîtiya şevê, tarîtiya qeîiştekê jî dihat. Çav bi çav nediketin. Jixwe tu çav nebûn ku ez lê temaşe bikim. Xweziya ku hebûya, bila min nedîtibana, qe nebe herî kêm min ê bizaniya ku li beramberî min çavek heye. Bes tenê ez û çavên min û dilê min bûn. Dilê min jî ne li cem min, li cem hevalan bû. Di binya qelîştekê de çend tahtên xiloxwaro hebûn. Lê pir li ber dilê min şîrîn bûn. Ev taht her tiştê min bûn. Piştî ez baş li wir bi cî bûm, wê gavê bêhna min hindekî da der. Ne kes min dibîne û ne jî ez kesek dibînim.

A rast rewşa heyî bi min pir giran dihat. Min tu caran tenêbûneke wisa jiyan nekiribû. Ji ber ku ez lawikê deştê bûm. Bi ser zehmetiyê çiyan re tenêbûn û di nav de nexasim cihekî wekî Kato. Erê… herê …Kato!

Kato û tenêbûn!

Kato û qutbûn!

Ji kê? Ji bo çi?

destê xwe û ez geriyam. Lê dîtina cihekî wisa di vê tariyêde ne karekî hesan bû. Min gelek kun, çalik û binber dîtin, lê yeke tenê jî dilê min rehet û kerba dilê min sar nedikir. Rewşa lêgerîna min wekî ya masîgerek ku di ava şolî de li masiyan digere bû. Encax ez bi tesadif li rastî şensê xwe werim, lê hîna tu encam nîn e. Her ciyek ku min didît, dudilî bi min re dida çêkirin; ez careke din bi hêviyeke şikestî vegeriyam cem çek û çentê xwe. Rûyê min ewqas melûlbû, wekî agirê mûma li berqedandinê be. Hemû gavên min, rabûna min û rûniştandina min tev di nava hizran de bû. Êdî serê min ji hizr û fikrandinê diêşiya, heçku wê biteqiya. Min serê xwe bi parçeyek şûtikê baş girêda. Wê demê mejiyê min ê belavbûyî bi ser hev de hat û bi carekê re kendavê Katoyê hatin bîra min. Erê kendav cihê herî asê ne, lê wê çiqasî rê bidana mn. Ez çûm û bi ser pişta sirtê Katoyê re çûm û hatim. Bi ser sehwa şevê sehwa kendavê jî kete nava dilê min, weylo ev heybetbûne! Kî jê bikeve wê parçeyên biçûk bûbûna bi qasî guhek. Lewra ez pir bi hişyarî dimeşiyam, lê hîna min tu riyek peyda nekirine. Taveheyv baş bilind bûbû û lêgerîna min hîn berdewam dikir. Her wiha piştî geryaneke pir dirêj, di dawiya dawîn de min qelîşteyek dît û min xwe berda ta ku mirov xwe bighîne binya qata yekê. Lewra bê ku ez bihêlim şopên lingê min derkevin, bê ku ez bihêlim giyayê hişk bişkên, min ew der di ber çavan re derbas kir û min ji xwe re got: “Ger xilasiyeke te hebe tu ji vê derê baştir nabînî” û bi lez û bez vegeriyam,





Ka careke din ji min re bêje, ey Çiyayê Reşk!

Ma gunehê wan çi bû, dinyaya bêbext. Di demekê de, Hesen û Hûseyîn ji bona aramiyê tev digiriyan, du bira bûn wekî canekî dixebitîn, mixabin û sed mixabin, bûn qurbana vê aramiyê. Kerbelaya xembar çi kir û nekir, nedikarî Hesen û Hûseyîn biparêze. Îro jî merqeda wan bûye ziyareta milyonan mirovan. Nizanim ey Çiyayê Reşk! Tu ewqasî hesûdê Kerbelayê bûyî. Qey te dizanibû di nava her heşt hevalan de, Hesen û Hûseyîn jî hene. Herdu heval jî, ji bona aramiyê hatibûn cem te. Ew du lawên di temenê xwe yê ciwan de, girêdana wan bi Rêber Apo re, girêdaneke bêdawîn bû. Bi israra kar tijî bûn. Bi vî rihî, ew navên xwe li wan warên bilind, bi tîpên zêrîn nivîsandin.

***

Di mangeya me ya ku nivî ji kevir û herî, nivî din jî ji bi kîsên axê hatibûn lêkirin de rûniştibûm. Pênc roj berê, piştî sermayeke tund û dijwar, bi barîna berfê xwezaya vê xakê rengê xwe guherand. Li derveyî sînga tahtên bilind û nivî qurmê daran, her der wekî kefenê mirinê an jî wekî cilên bûkan spî bû.

Erê berfa yekem bû. Lê zû erdê girt. Her wiha piştî barîna şev û rojêkê, li erdê bi qasî bejnekê bilind bû. Niha jî piştî çend rojên xweşî û bi tav, hîna jî li derve bi qasî çongek berf maye.

Belê!

Ev ciyê me wekî mezrayeke ku li paleke beroj e, di her rojên xweşî ên zivistanê de, her roj bi hilatina tîrêjên rojê ku ji pişt lûtkeyên Çarçela derdikevin, çerxa jiyanê li nava mezraya me ya biçûk de digerîne. Hetanî danê esirî em bi tîna rojê şa dibin û xwe germ dikin. Wê demê roj xatirê xwe ji bo demekê dixwaze. Êvar û tarî jî silavên hatinê li me dike.

A niha piştî ku roj çû ava, hêdî hêdî bandora berfa çileyî xwe davêje nava mangeya me ya ku bi naylon pêçayî ye. Ji dûr ve wekî avahiyeke camê diçûrise. Vê yekê jî ez mecbûr kirim, ez agirekî bi êzingên hişk di sobê de pêxînim, da ku ez bikaribim karekî bikin.

Di mangeyê de ez û yekî din hebûn. Lê ez jî bi xwe bûm. Ji ber ku bi fizîkî hevalek din li cem min tunebû. Lewra ez bûme dido. Li jiyana xwe û li Katoyê vegeriyam.

Yekî pirs kir, yê din jî bersiv da;

- Ma tê bîra te Kato Marînos?

Wê demê min xwe dît û nedît. Ez bi qasî sî hezar û sî rojî paş ve vegeriyam.

14'ê rezbera 1998'an û bi dengekî hêdî ji nava lêvên min derket.

Kato….Kato….Kato….

Êêhh!!.. Erê baş tê bîra min. Ez li wir bûm….





ku bi rengekî sorî xemilîbû ji hişê min nediçû. Jixwe her bi min re dipeyivî. Lê hîna tu encameke erênî min bidest nexistibû û ji qehr, kul û derdan mejiyê min rawestiyabû. Min dikir nedikir min tu çare peyde nedikir. Tevayî çareseriyan xwe veşartibûn. Min xwe da liber zinarikê, westandin û tîbûna min li milekî, dîmenên ku çavên min dîtîn li milekî din. Hemû komî ser hevdu bûbûn. Hîna tu biryareke zelal neketibû serê min; ez ê çi bikim ez nizanim. Hîna jî her tişt di nava hev de ne. Min serê xwe danî ser çenteyê xwe û min çavên xwe girtin û di nava xeyal û nîgaşan de ketim rêwîtiyeke ne diyar.

Her ha xewa mirinê ez girtibûm û ji nişka ve bi dengê teqîna fîşekekê ez ji xewê veciniqîm û ji xewê şiyar bûm. Piştî ku hêviya dîtina hevalan bi min re nema, ez hindekî din ponijîm û min hestê xwe ji bo demekî dane aliyekî. Ji ber ku biryar bi hestan nedihate dayîn. Jixwe dijmin zehmete vê şevê pêş de were, lê ber bi seharê ve wê lêgerîneke pir kûr û xurt çêbike û wê kun bi kun bigere, wê cih nemîne ku lênegere. Bi zimanê wan; wê "arama terema" bikin.

Pêwîst bû ku min ciyekî ewle ji xwe re bidîta da ku ez kêfa dijmin xweş nekim û ez bi silametî û saxî bigihêjim hevalan. Carnan bi mejiyê xwe carnan jî bi mejiyê dijmin ez diponijîm; min xwe xiste şûna dijmin de ka ez çawa lêgerîn bikim. Min çeka xwe ya bîksiyê danî ber tahtekî û çentê xwe jî min danî li cem xwe û bombeya xwe xiste

bû, hestên min tevlihev bûn, agirekî dijwar kete nav kezeba min. Ji ber ku reşahiyeke mirovek li pêş min bû. Keç an xort e ne diyar e, lê mirov e. Min hinek din xwe tewand û yekser min dît ku xwedî porek dirêj e. Bejna reşahiyê dişibiya ya hevaleke jin. Bêhemdî ji ber kêfxweşiyê çend rondik ji çavên min xwe berdan xwarê.

***

Çima tu bi tenê mayî, kîjan fîşeka xedar li te ketiye, bil çavên min ji bona te kor be. Nûjîn bû; wax û sed hezar wax, ma ne tu bûyî û te digote:" Hadê çavên min, hadê dilên min" Ez ê niha çi bikim ji bona te. Te barê min giran kir, erê… erê dinyayê.

Mala felekê xirab be. Di paşvekişandinê de libeke xedar ji bedena wê girtibû û rihê wê yê pîroz ber bi bihiştê revandibû. Wekî periyan giyanê wê bi bask bûbû û xwe gihandibû warê xwedawindan. Şehîdbûna Nûjîn piştî vê dîmena bi êş, min li derdorê nihêrt da ku ez çeka wê bibînim, lê min kir û nekir min nedît. Xuyabû ku hevalan berî min ew dîtibin û bi xwe re biribin. Hingî tiştekî ku min ji bona hevala xwe bikarîba bikirana tunebû. Wê demê min bi xatirxwestineke dilşikestî û kezep peretî û çavşil ji cem birêketim.

Dem pir teng bû û saet te digot qey di pêşbaziyê de ye û hîn ez jî di nav Katoyê de li hevalan digerim, lê tu pêjna wan tunebû. Ne dengek, ne rengek. Lê nîgara rûyê Nûjînê





***

Çiyayên bi heybet.

Kî dizane çi dîtine û bûne şahidê çi.

Van çiyayan çi di hemêza xwe de veşartine û gelek mirov lê bûne mêvan. Ev çiya, bûne rêbûhêrka gelek rêwiyan. Belkî jî her mirovek û her rêwiyek di hundirê xwe de tiştek ji van çiyan re gotine. Hindekan bi başî an xerabî li ser wan helbest, çîrok, stran rêsane, xweşikbûn û berxwedaniya wan bi lêv kirine. Bilindahiya çiyan di xeyalên hindekan de bûye dîmen û timî di xewnên xwe de dibînin. Belkî ji kesên ku nedîtiye re xerîb bê.

Bêguman ji bo hindekan jî bûye wekî agirê dojehê û lanet lê anîne.

Belê!

Ev çiyayên bi heybet û bi sehû, her tim bûne wargeh û star. Van çiyayan ji wan kesên ku nexwestine tahma koletiyê jiyan bikin re bûne qada azadiyê. Lewra ev gel û etnîsîteyên ku li vir jiyan kiribin, bûne parçeyek ji çiyan û çiya jî bûne parçeyek ji jiyana wan.

Gava em hindekî li dîrokê vegerin, em ê bibînin ku Îskenderê Mezin jî hatiye vê xaka qedîm û lê aliqiye. Jixwe navê Kato ji wê demê maye, biyaniye û tê wateya "ketî" an "lanet" ku li lanetê li dagirkeran andiye.

Dibêjin ku artêşa Îskender di van çiyayan de asê maye û rastî êrîşên xwecihên vê herêmê hatiye. Lewma piştî demeke dirêj ji berxwedan û şerên ku qewimîne, artêşa Îskender ku wekî brûskê hemû herêma daye pêşiya xwe, bi neçarî xwe bi şûn ve kişandiye.

Dîsa dibêjin ku Îskender di şer de nîv-xwedayek bûye, lê nikaribûye xwedatiya xwe ya şer deyne ser vî parçeyî. Li ser vê yekê Îskender xwestiye ku laneta xwedayê mîtolojîk Zeûs li ser vê xwezayê bibarîne û navê Kato lê kiriye.

Lê, ev nav navên derewîn in. Ev binavkirin bi zimanê serdestan hatiye kirin. Ya bi kêrî wan tê, jixwe baş e. Beravajî vê yekê jî hîç e û bi lanet e.

Lê em jibîrnekin ku ev çiya, ev axa bi bereket, di serî de Zagros û Kato, di dîroka mirovahiyê de, bûne landik û dergûşa mirovahiyê ya yekemîn û loma jî pîroz in.

Tu caran, kesên çavên wan têrnebûyî dev ji vê xakê bernedane. Êrîş bi ser êrîşê, bi kuştin û bi talan xwestine dest deynin ser van çiyan ku warê xwedawend Nînhûrsag e.

Yek jî, van kesên çavnebar, ew kesê ku dinya nedîtî û hov, ji Hûriyan bigire heta roja me ya îroyîn çav berdane vê bihûştê. Ev yek jî têrî wan nekir, her dem talan kirin û di ser de jî xwestine li ser xwe tabû bikin. Navên herêman, çiyan, bajaran, zozanan guherandin û li gorî xwe rêsan.





Ronahiyê heyvê hişt ku ez careke din rabim ser xwe û lêgerînê berdewam bikim. Wisa dixuya ku wê dî dîtina hevalan pir zehmet be. Heçku tu di tariyê de li derziyeke winda bigerî. Dîtina derziyekî çiqasî zor e, dîtina hevalan jî wisa bû. Bi taveheyvê re min êdî baş pêşiya xwe didît û êdî min dikarî bi rehetî gavên xwe biavêtana. Lê li aliyekî din ve jî, pêwîst bû ez baş hişyar bim da ku çeka min neçirise, lewma ez li vê yekê pir miqatebûm û min kefiya serê xwe li çeka xwe pêça da ku neçirise. Dîsa bi taveheyvê re mirov êdî bi çend gavekê pêşiya xwe didît û hîn jî ez di meş û lêgerînê de me. Hemû gavên min bi mital û pirs bûn, lê bêbersiv bûn, bersiva van hemû neyînî bûn. Erê di nava van neyîniyan de ji nişka ve ez çi bibînim! Ev çi ye? Tiştek ketiye pêşiya min? Çavên min çi dît? Ev xewn bû an rastî bû! Her ku min mêze dikir kela dilê min zêde dibû û di nava matmayînê de tevzînokên sar bedena min digirtin. Her hal ji heyevcan û ne tarîfkirina wî tiştî bû. Min xwest gavek din xwe nêzîk bikim, lê lingê min pêş de gav nedavêtin û heçku bi axê ve zeliqîbûn, heçku hatibûn mîxkirin û wekî ku sed kesî bi min girtibin û nehêlin ku bi pêş de gavên xwe bavêjim. Di mejiyê min de bi dehan pirs diçûn û dihatin. Her ku pirs dixwest min pêş de bibin bê ka çi ye, gumanê jî ez didame sekinandin. Lê nedibû ku rewş wisa bimîne. Lewra jî pirsan zora heyecanê bir. Diviyabû min bizaniba ka ev çi ye? Kî ye? Nedibû ku ez bûbûrim bê ku ez bizanim û min bi du gavan xwe nêz kir û bi gava sêyemîn re min xwe gihande cem. Piştî ku min dît, lêdana dilê min hîn zêdetir

min gavên xwe davêtin. Vê care derdê leşkeran ji hizrên min çû û di şûna xwe de derdekîdin.

Di rewşeke wisa tenebûn ne xweş bû. Gava ez di navbera herdu keviran de asê mabûm, min digot ger ez ji vê gorê xilas bibim, ez ê yekser herim xwe bighînim hevalan û wê çaxê wê hevalê Eşref ji min re bigota "qewed be", wê rewşa min bipirsiya û wê bigota" destê we sax be". Heval li ku bûm? Çi dikirin? Ez ê wan çawa bibînim, a rast min nizanibû. Tenê ez û çeka xwe û tahtê Katoyê ne. Carnan jî dengê leşker û topên hawanan tê…

Ne min pêxwarin an jî av heye, tenê hindek titûna rîşî di binê çentê min de hebû. Min ji bo rojên giran rakiribû, lê ya ku zorê dida min, ne av û xwarin bû, tenêtîbû. Ji ber ku li kêleka min tu kes tunebû. Ma min ê bi kê re par ve bikirana. Hêdî hêdî meşa min di tarîtiya şevê de û di nava latên Katoyê de didomiya. Tu nîşaneyek ku ez encamê jê bigrim xuya nedikir. Lewra ez li ber kevirekî din ji kevirê Katoyê rûniştim û hizirîm. Ka çi bikim? Min xwest ku ez sebra xwe bi cixareyekê bînim, lê ji vê biryarê jî ez paşde kişiyam. Erê ez di nava hizr û fikaran de bûm, lê hemû xeyal û hestên min li cem hevalan bû. Jixwe fikr û hizrê min jî li ser wê bû ka ez ê çawa xwe bighînim hevalan bû. Vê carê fikr û hizrên min dirêj ajotin û hîna ez di nava van hizran de bûm, heyvê şewq û ronahiya xwe da nava tahtên Katoyê.





Dewletên tirk, faris û eceman, dîroka vê axa qedîm berovajî kirin û bi navê fezîletê her tişt li gorî xwe pîvandin.

Ji her deverekê re navek peyda kirin. Colemêrg kirin Hekarî, Gever kirin Yuksekova; bajar û navçe têrî wan nekirin, destê xwe yî qirêj avêtin xwezayê. Navê Katoyê bû Çiyayê Testere…

Xwezaya bêguneh, di bin topên giran de dinalin. Navguherîn ne bes bû, vê carê jî dest avêtin xwezayê û hemû dar û beran şewitandin.

Êdî li şûna gul û beybûnan, bêhna barûtê difûre. Li şûna wizewiza bayê berbangan, êdî dengê fîşekan, hawan û topan olan dide. Êdî bûye ku gelek lawirên kovî vê axa pîroz diterikînin.

A niha ez wekî zarekî vê xakê ku bi bêhna wê mezin bûme, ji ava wê min vexwariye, di nava wê de min jiyan kiriye, ez ê xweşikbûn û bedewbûna wê, merdî û mêrxasiya wê ji we re li ber çavan raxim. Ji ber ku van çiyayan bûne her tiştê me û layîqî vegotinê ne...

***

Ji dûr ve, ji milê qibleyê ve lê temaşe bike. Tu yê wê demê pozbilindahiya rêzeçiyayê Katoyê bibînî. Wekî dîwarê Seda Çînê bi nav û deng, wêneyê xwe di bîbikên çavan de çêdeke, mîna ku bêje ez im şahidê şerên mezin, werin nava min bikolin, hûnê hestiyê berî hezaran salan bibînin.

Ez di heyamekê de ewqas zindî û law bûm. Bedew û spehî bûm. Lê xirecira şerên bêeman, dêmê rûyê min kirêt kirin, ava di nava min de ku digeriya, ziwa û miçikandin. Niha, nû bi nû xwedanê min ê rast hatine, zar û zêçên min hatine, gerîlayên min ê nûjen hatine. Ji nû ve bi xwêdana eniyê, bi xwîna dilan, kirêtiya hezarê salan û navê lanetê dişon û paqij dikin. Ez bi sebra Eyûb li hêviya wan bûm. Ji ber ku min dizanî keç û lawên ku bi ava hundirê min ê zelal mezin bûne wê xwedanê soza xwe bin û di dawiya dawiyê de hêviya min pêk bînin. Gerîla ref bi ref hatin..hatin..û.. hatin…

Bi giştî ev rêzeçiya, ji neh Katoyan pêk tê. Navê her yekî jî, ji yê dinê cuda ye. Her navek jî li gorî eşîr, gund û mezrayên li der û dorê hatine bi nav kirin. Her wiha, ger em serê Katoyê ji rojhilat bigirin dest, wê destpêka xwe ji seranserî ava Zapê ku ji Colemêrgê derdikeve ango Katoyê Bayê dawiya vê rêzeçiyayî ye, li kêleka navçeya Berwarî ku girêdayî Sêrtê ye diqede.

Li milê din ê Katoyê Bayê, Çiyayê Simbil û Semedar bi çavên şil li rûyê Katoyê dinêrin. Dixwazin destê xwe bigihînin hevdu, di navbera wan de Geliyê Zapê û Ava Zê heye. Çiyayê Simbil jî wekî birayê biçûk ê Cîloyê ye.

Niha jî ger em van rêzeçiyayan bi nivîskî binîn ziman, wê rêza wan li dû hev wiha werin rêzkirin: Katoyê Bayê, Katoyê Begîrê, Katoyê Qewalê, Katoya Navîn, Kato Marînos, Kato Jîrkan, Kato Xelîlan, Katoyê Dawîn û Katoyê Biçûk e.





nedizanî, tenê çand gotinê jiyanî ez di nava hevalan de fêrbûbûm.  Ew jî; gel, gît, temam…

Piştî min kêmekê bêhna xwe veda, berî ku ez pêngava duyemîn destpê bikim, min careke din li leşkeran temaşe kir, lê qet diyar nînbûn. Ger ew ewqas bi qelebalixin ez wan nabînim, wê çaxê ez hişyar bim, wê ew jî min nebînin û min dîsa gavên xwe bi nazikî avêtin. Lê vê carê li gorî gavavêtina ji gorê hîn rehetir bû. Ez ji meşa çarlepkî derbasî meşa piştewandîbûnê dibûm û wekî pîrekalekî piştxûzbûyî ez dimeşiyam. Bi her gavekê re ku ez ji çeperan dûr diketim, wê demê hêviya min a bi paş de kişandineke baş çêdibû. Êdî ji dojeha tarî û bi agir dûr diketim û berê min dikete bihişta azad. Ez ê li wir hemû hevalên xwe yên bedew bibînim; ez ê hevalê Eşref, Leşker û hevalê Cemal bibînim. Erê, ez ê bi wan re vê bûyerê bi par ve bikim û ew jî wê rewşa xwe bêjin. Wê demê, wê her tişt xweş bibe. Wê sehneya jiyanê ya nû destpê bike û em ê bi hev re dîsa bikevin nava lêgerîn û cengên nû.

Erê ez jî wê belgeya bilanet xilas bûme û xilas dibim û hîna ez dimeşim. Geh li pêşiya xwe temaşe dikim û geh jî li cihê çeperan dinêrim. Qederekê ji çeperan dûr ketime. Dimeşim, lê ez bi xwe jî nizanim ku bi zelalî bi ku ve diçim. Ne cihê hevalan nas dikim û ne jî tiştekî din. Tenê ez dizanim ku heval li vî alîne, bi vî milî ve hatibûn, lê bi zelalî min cihê wan nedizanî. Ez bi vê hêviyê dimeşiyam û

bigihînim heval û hogirên xwe. Rêka diduyan ew bû ez ji gorê derkevim û ferîştehê mirinê ku fena sîsarkan li bendê ye ku rihê min bigire. Wê demê ez ê bibim miriyekî rast, hingî wê heval û hogirê min bi dilêş û bi xemgîniyekê min bibîr bînin.

Min wekî zarokên nû ku bi çarlepkan birêve dimeşe, gava xwe ya yekem ji gore avêt. Di destê min ê ku kêmekî dişewitî ku ji ber kizrandinê goştê bilûlêve mabû, giraniya bîksiyê hendekî tevgera min giran dikir. Min jî wekî dizê şeva tarî lingê xwe davêt û di her sê–çar gavên ku ez pêş de diçûm, min bêhemdê li paş xwe dinêhêrt. Her çiqasî min dizanîbû ku gava leşker bi min bihisin wê yekser min gulebaran bikin, dîsa jî min dizanî ku min nedîtine, lê dîsa jî min li paş xwe li çeperan temaşe dikir.

Dilê min pir ne rehet bû, gelo leşker ciyên min dizanibûn? Bi van pirsan re min gavên xwe davêtin. Piştî bi qasî bi çil–pêncî gavan ji wê gorê dûr ketim rûniştim. Ewqas bi hişyarî tevdigeriyam ku heta hilma xwe jî min bi hişyarî dikşand. Ji ber ku rewş rewşeke pir nazik bû û bi ser wê de jî dilê min ewqas diçû cixareyekê, lê cixare vexwarin di vê rewşê de dihate wateya pevçûneke ne di cî de. Ji ber ku hejmara leşkeran zêde bû û bi tena serê xwe bi wan re ketina pevçûnek, niha ne pêwîst bû. Şev e, ka wê çi bide pêşiya min ne diyar e. Dengê leşkeran hîn dihate min, lê min nedizanî bi zelalî ka çi dibêjin. Jixwe min baş bi tirkî jî





Ev navên ku li paş Kato hatine bikaranîn, bi giştî navê gund, eşîran, dîsa hindek ji wan di dema Îskenderê Mezin de, hindek ji wan jî li gorî cî û mezinbûna xwe hatine binavkirin.

Belê rêzeçiyayên Katoyê, wekî govenda devzarê destê hev girtine û xwe dihejînin xuya dikin. Herêma ku ev rêzeçiya di nav de derbas dibin, di warê çînî de bi giştî di bin bandora eşîrtiyê de ne. Hîna jî ev yek, li wê herêmê serdest e. Ji xwe di heyamên berê de, li ser vê erdnîgariyê konfederalîzma eşîran li dar bû. Bi wateyeke din, bi komûnî jiyan kirine.

Hin ji navên van eşîran; Jîrkan, Gewdan, Mamxuran, Graviyan, Xelîlan û hwd. Gelê wê herêmê, bi giştî debara xwe li ser pez û dewaran dikin. Ji ber ku erdnîgariya wê hişk e. Ji ber ku çandinî encax di cihên kûr û germ de dikare çêbibe.

Ev herêm tu caran yekser neketiye bin destê kesên biyanî de. Heta sed sala 20’an şûn ve, îcar dewletê bi rêbazên cuda cuda destê hikimraniya xwe têxistiye nava herêmê.

Kincên resen ên vê herêmê yê zilaman; şal, şapik û kefiyê bi ertûşkî hatî girêdane. Yên dayîk û jinan jî fîstan û xeftanê bi içik in.

Tişta balkêş li vê deverê kevneşopiyên ermeniyan jî hîna jî zindî ne. Ev yek jî dide nîşan ku jiyaneke hevpar bi mozaîkeke çandî ya têkel hatiye jiyîn.

Navê gelek gundên li vê herêmê bi "nis" diqedin. Dibêjin ku, "nis" navê jineke ermenî ye. Qutnis, Kutranis, Toranis, Peyanis, Omyanis û bi dehan gundên din bi vî awayî hene. Kevneşopiya wan hîna jî wekî dêr û çîrokên wan li ser zimanê gel in. Lê piştî ku tirkên îtîhatçî ku piştre komar ava kirin, dest bi qirkirina ermeniyan kirin. Piştî qirkirinê êdî li vê herêmê mirov pir kêm rastî ermeniyan tê.

Dîsa rêzeçiyayên Katoyê di aliyê jeo-polîtîk ve ciyekî xwe yî girîng dilîze. Di navbera her Kato û yê din de tengav hene û ev tengav navbera katoyan qut dike û di navbera bakur û başûr de dibe rêbihêrk. Di van tengavan de robarên ku xwe ji zozanan berdidin, bê navber diherikin. Di nava katoyan de riyên piyade û riyên lawiran jî hene. Lê çûn û hatina wan cefayek mezin dixwaze. Ji van riyan re dibêjin "derî" Hinek ji van tengav û deriyan; Tengava Bayê, Deriyê Qaçê, Deriyê Berana, Deriyê Moxil, Deriyê Kewê û Deriyê Zêr e.

Xwezaya Katoyê li derveyî hindek darên qaçê, ji hemû darên din bê nisîb mane. Lewra jiyan di nava Katoyê de, bi darên qaçê û guniyan dibe.

Ger kesê ku Katoyê nas nake, meşên şevê pir zehmet dibe. Wey li halê nenasan! Kato di hundirê xwe de wekî bajarekî xirabe ye. Jixwe hindek dever hene jê re dibêjin, Xirab Bajêr. Şikeftên Katoyê piranî xwezayî ne û gelek in. Kevirên wê jî tûj û berezîv in. Di gelek ciyên Katoyê de, berf tu carî nahele û xelas nabe. Berfa salê, di ser a sala dinê de dibare. Wekî Keviya Pîr a ku li ser Cîlo ye, di hindek ciyan de golên biçûk ji hêlînên berfê çêdibin.





min şêrîn bûbû, halbûkî min gelek caran rewşê zehmet dîtibûn, lê wekî vê care rihê min li ber min şêrîn nebûbû. Belkî jî sedema xwe ji vê dihat" min ewqas şer jiyan kir, tiştek bi min nehatibû, lewra min nedixwest ku wisa bi rihetî biçim.

Ji berî ku bibe tarî, tirkîniya dilê min wekî tirkîniya salîseyên saetê lêdida, lê niha piştî perdeya şevê tevnê xwe vedan û dinya henek din tarîbû, henekî din rewş hate guhartin û bêhna min hate der. Lê bi giştî ez rehet nebûm. Her wiha bi pirs û texmînan min dem derbas dikir û her ku min bersiva yekê dida ez li bersiva din digeriyam. Wisa jî wê sehneya tarî niha destpê bike.

Min tu carî wekî îro ji şevê hez nekiribû. Tê bîra min hevalekî gotibû: Şev rêhevalê me yî herî dilsoz e. Niha jî ji xwe bûye şev, êdî çav çavan nabînin û dengê çekan hatiye birîn, tenê dengê topên hewanan tê, davêjin cihê ku hemû heval lêne. Di ber dengê topên hawanan re bayekî bi bêhna barûdê li dev û difna min dida. Ji ezman ve stêrkan li cihê cengê mêze dikirin. Nizanim çi digotin, lê dibe ku ew jî fena bi bêdengiyeke kûr temaşe dikin û li benda encamê ne.

Piştî ku şevê baş li hawîrdorê perda xwe pêça, min ji xwe re got: "Ger tu dixwazî ji vê gora servekirî derkevî û kefenê mirinê biqetînî, ji vê derfetê û demê baştir dem û derfet nîn e". Li pêşiya min du rêk hebûn! Riya yekê ew bû ku ez vî kefenê mirinê biçirînim û bi saxî xwe

şerê pirsan, şerê tarîtiyê û ronahiyê di hişê min de destpêkiribû, wekî şerê Ehrîman û Ahûra Mazda. Dudiliya min ez di nava xwe de dihejandim. Dilekî min digot rabe biçe, di ku derê de ziravbe bila di wê derê de biqete. Ev dil jî, ji ber bêçaretiya ku ez têdebûm ketibû dewrê. Dilê din jî digote: Na! Hîn zûye. Ku tu rabî, wê te bibînin û ev dê bibe rabûna te ya dawîn. Hindek din bisekine. Ew jî dilê min ê sebrê bû.

Belê! Di nava ewqas erê û nayan de, min bi ya dilê xwe yê sebrê kir û ez mame di nava wan herdu keviran de. Kevirek li ber lingê min bû, yek jî li ber serê min bû. Wekî kevirên kêlên goristanê bûn; ez jî di navbera wan de dirêjkirî bûm û carcaran bi dizî û hêdîka min serê xwe di ber kevirê li ber derê xwe re li reşahiya leşkeran û li derdorê temaşe dikir.

Hîn tu leşker xwe bi milê ku ez lê me bernedabûn û min ji xwe re texmînan dikir: Ger hindek din dinya tarî bibe wê leşker nikaribin xwe di vê tarîtiyê de berdin nava Katoyê û ger xwe berdin jî wê rastî gelek zehmetiyan werin. Ji ber ku Kato asê ye û tahtên wê zû bi zû rê nadin tevgereke rehet. Vê yekê jî kêmek hêvî di hundirê min de çêdikir û ji aliyê din ve jî, ez gelek nêzî çeperên leşkeran bûm. Vê yekê jî sebra min dikuşt. Her carekê dengê qîrewîra leşkeran dihat. Min di dilê xwe de digot: Eha hatin û min destê xwe davête bomba xwe û di nava kefa destê xwe de min ew badida. Nizanim çima ewqas rihê min li ber dilê





Li ciyê ku Kato ji zozanan vediqete an jî digihîje hev, robarên avê û kaniyên sar xwe berdidin û ev yek jî debara jiyanê li Katoyê hêsan dike. Em ango gerîla bi noşîcanî ji vê avê vedixwin û pêşkêşî mêvanê xwe dikin. Zivistanên Katoyê bi giştî dirêj in. Herî kêm şeş mehan didome. Lewra Kato bi spîtahiya berfa şeş-heft mehan forsa xwe davêje.

Berî ku ji bîr bikin, pêwîst e ez bahsa lawirên Katoyê bikim. Pez êkovî û bi taybetî jî hirçên Katoyê bi nav û deng in. Tev jî di şikeft û kendavên asê de xwe diparêzin.

A niha piştî vê kurtenasînê, hêj mirov fêr dibe û wate dide. Ka çima? Ji ber ku artêşa Îskender nedikaribûye van rêzeçiyayan derbas bibe û asê bûye. Piştî şerên dijwar, niha jî bermahiyên şerên wan deman, li naverastê tên pêşberî mirov. Kozikên ji kevirên mezin lêkirî, şahidiya şerên bêhempa dikin. Ger tê gotin Kurdistan welatekî ku şer li ser bûye, Kato jî vê yekê pişt rast dike. Vê xaka pîroz pêvajoyên cengên giran bihûrandine.

Demdirêj bû û ajot. Wekî pêşbirka siwarê hespê Kimêt û siwarê mihîna Kihêl. Bi sal û sed salan ajot vê pêşbirkê û hîna jî Kato wekî xwe radiweste û meydan dixwîne û ji neyaran re bûye wekî kelemeke kor, wekî diriyeke tûj.

Kato tirsa xwe têxistiye nava dilê contirkan jî. Bi zimanê koremaran bi wan re diaxive. Roj li wan kiriye şev. Lewra jî navê Çiyayên Tarî lêkirine.

Berevajî vê yekê, çawa teyr çêjikên xwe xwedî dike, diparêze û bi firê dixe; îro jî Kato gerîlayên xwe hemêz dike, wan diparêze û fêrî jiyana çiya dike.

Ger ez bêjim Kato ev tenê ye, wê pênûsa min qebûl neke. Wê dilê min rihet nebe. Lewra ez ê çîroka Katoyê û zarokên wê yên gerîla bihûnim.

Hîna jî hindek deverê çiyan bi berfê hûnandîbûn. Ger ez bêjim bihara van çiyan wekî bihûşta di pirtûkên pîroz de derbas dibe, wê li cî be. Cî bi cî keskem êrgan xwe ji berfê filatandibûn. Di çavên mirovan de wêneyek xweşik diteyisand. Darên bî, berû û maziyan pelçîmên xwe teqandibûn. Bi taybetî li Gabarê bi hilatana tîrêjên rojê re kulîlkên darên behîvan ên sor û spî, gava li ser Kela Dewrêş lê tê temaşekirin û wekî deryayeke bêdeng diçirise. Çiqilên wan jî bi bayê sibê re wekî pêlên deryayê hêdî hêdî xwe dihejandin. Xaka pîroz, çiyayên bi taybet bi her tiştê xwe xweşik e. Lê ez çibikin nebû qismet û nesîb ku ez li Gabarê bimînim ta ku çend libên behîvên ter û teze û hinarên bîlconayê bavêjm nav lêvên xwe û ji tahma wan şa bibim. Bi biharê re piştî ev dîmenên xweşik, di xeyalê min de çêbû. Min bi xwe re anî û ez bûme rêwiyê Basyaya xembar. Ez ê li wir tevlî yekîneya bi tevger a ku girêdayî Fermandariya Biryargeha Botanê ye bibim.

Besta jî xwe bi daristanan xemilandiye û forsa keskahiya xwe dike. Bi ser de jî, xwe bi çend çiyayên bilind pêçaye. Van çiyayan wekî bazineke li ser destan wisa Bestayê xistine nava xwe. Ji milekî Herekola Mîran û Pîro bi çavên şilê yên biharê, çavên xwe berdan sînga kêlê, ji berfê





teqîneke wisa dihatim. Lewra jî ez pir matmayî bûm. Lê matmayîn tu kar nedikir di vê rewşê de. Pêwîst bû ez zû vê matmayînê li ser xwe bavêjim, wekî din nedibû.

Piştî ku balefirên şer ji herêma şer xwe valakirin û çûn, ez dîsa bi rewşa xwe ya berê rû bi rû mam. Hîn her tişt wekî xwe ye? Hîn ez di cihê xwe de di nava van herdu latan de me, dijmin jî di çeperên me de ne û xwe baş bi cih dikin. Dûrbûn hîna wekî xwe ye, çil gavek tenê di demê de guhertin çêbûye. Ew jî pênc-şeş xulekan bi min da qezenckirin. Bi valetiyeke din ev pênc–şeş xulek bûne saetek. Ji ber ku balefiran her tişt westandibûn. Tenê dem bi pêş de diçû û hest û kela dilê min jî rabûbû û dadiket. Di van çend xulekan de tarîtî xwe nêz dikir û hewl dida kirasê xwe yê reş bavêje ser zinar û latan. Êdî leşker baş ji min ve xuya nedikirin, lê reşahiya wan hîna diyar e û ez xwe bi xwe re diaxivim. Hem pirsan ji xwe dikim û hem bersivên pirsên xwe didim û dixwazim ku bighêjim biryarekê. Hemû pirsên di serê min de jî digeriyan, piraniya xwe wekhevbûn.

Gelo ez niha rabim, wê min bibînin an na? Ez ê bikarim xwe xilas bikim an na? Ger ku ez rabim û wan ez gulebarandim, ez ê çi bikim? Ez ê bikaribim bersivê bidim an na? Ma ez di cihê xwe de bimînin wê ne baştir be? Ger ez di cihê xwe de mam û ew ango dijmin bi ser min de hatin wê gavê ez ê çi bikim? Her wiha gelek pirsên din. Te digot qey ez ji nava şerê fîşekan derketima û ketime nava

Ji ber dengê F-16’ê her der ker bû, her kes ker bû, em jî û leşker jî. Ez bawer im heçî lewirê kovî jî hebûn ew jî kerbûn.

Belê!Bi vijîniya F-16’an re min narîncoka di destê xwe de ji bîrkir. Hemû bala min diqulibî ser balafira F-16’ê û kela dilê min sê–çar qat zêde bû. Piştî sê–çar tûrê xwe avêt, bi carekê re bombeyên xwe yê yek tonî bi ser Katoyê de berda û li nav tahtê Katoyê li milê ku tevayî hevalê me lêbûn hate xwarê û bi teqîniya wê re dengekî wisa derket ku, erd û ezman veciniqî. Dengvedana wê xwe li nava taht û ezmana veda. Her der ket bin bandor teqînê. Bi teqîna bombeyên yek tonî re, dengê fîşekan tev hatin birîn. Her wisa balefirên F-16’an çi bombe bi xwe re anîbûn, tev bi ser bedena Katoyê de barandin û di ber avêtina bombeyan re jî gurîniya agir ji doçkayên wê hatin. Dengê doçkayên balafirê wekî dengê zirîniya kerê nêr ê hilorîbûyî dihat. Ewqas ne xweşbû ku mirov hema dixwest guhê xwe bigre. Lê çiqasî bandor kir nekir, min nedizanî û pêre jî ez ji bîra xwe çûm û hemû hest û bala min çû cem hevalên ku niha di nava toz û dûmana bombeyande bûn û min ji xwe re digote; aha ev ji me kêm bû, Xwedê bike tiştek bi hevalan nehatibe. A rast tiştek ku min bikira jî tunebû. Dest û lingê min di nava van herdu keviran de hatibû girêdan û min nedikarî serê xwe jî rabikim. Tenê dengê bombeyên di guhê min de dikire zimênî zim…. zim û dûmana ku ji ber teqînê rabûyî ber bi ezman ve hildikişiya. Ev cara yekem bû ez ewqas ji nêz ve rastî





diteyisîn. Şirnex û Çelê nimêjê ji aliyekî wê yê din e. Aliyê çaremîn jî rêka me ya ku em ê berê xwe bidin zozanan ango Kato Jîrkan û Deriyê Qaçê ye.

A niha carek be jî em ê biçin ser lûtkeya herî bilind a çiya, hingê heçko tê xwe bibîne.

Fermandarê yekîneya me ya gerîla, hevalekî bi navê Eşref Başkale bû. Di nava gel de jê re digotin; “Dawidê Reş” û di sala 1989’an de tevlî gerîla bûbû. Tevayî pratîkên xwe di wan zozanên ku jê dayîk bûye, bihûrandibû. Hevalekî esmer û gelekî xwînşêrîn bû, di şer de pir pijiyabû. Hostatiya wî ya gerîla û şer di liv lebat û çavên wî de diyar dibûn. Lewra pir zû diket dilê hevalên yekîneyê. Ew jî piştî deh salên xizmeta gelê xwe, di sala 1999’an de, di encama şerekî li herêma Xerzanê de tevlî karwanê şehîdan bû. Bi vê mebestê, ew bibîranîn, hêjayî bejna wî ye û di dilê me de wê her tim bijî.

Di roja yekem ku ez tevlî yekîneyê bûm, roja din herêma Besta bi giştî kete bin topan û bi piştgiriya balafirên şer ên F-16’yan de operasyoneke berfireh dest pê kir. Ji ber ku ew sal ango 1998, saleke bi her aliyê xwe ve dijwar derbas bû. Lewra anîna wê ya ziman wê bi kêr û feyda be.

Dijmin di vê salê de bi zimanê koremaran diaxivî; diranên xwe yên gurî zîq kiribûn û ji xwe re digotin; “Em ê vê salê wan biqedînin” wekî gelek caran dubare dikirin. Lewra bi herikîna sîpelên ava berfan, dijmin jî kete tevgera lehiyê. Ew lehî tevahiya herêmên ku gerîla lê bûnn û nû bi nû ji hêlînên xwe derketibûn dabû ber xwe. Bi taybetêi Botan û

Amedê, di hedefa yekemîn de dan pêş xwe û dest bi operasyonên pir berfirehkirin.

Xayîn û hêmanên bi navê Şemo damarên xiyaneta wî ketibû lebitînê û di destê dijmin de bû. Wekî lîstokê di destê wan de dihate bikaranîn. Şemo jî, ji bo ku rehmet û şefeqeta guran bîne ser xwe, wekî duvpişkan qoziya xwe berz kiribû û wiha digote: "Ger hûn bixwazin tevgera PKK'ê tune bikin, serokê wan Ocalan hedef bigirin. Ger hûn bixwazin behra wan a avdanê ango gel çavtirsanî bikin; paytexta wan Amedê û Botanê bikin hedef." Dijmin jî ev nêrîna xayîn jinedîtî ve nedidît. Berovajî li ser vê yekê planê tunekirinê amadekirin. Bi hemû hêzên xwe yên artêşê û bi yekîneyên firokeyan ve operasyon li sera dinê lidarxistin. Her çiqas şehadetê me çêbûn jî, lê armanca wan neçû serî. Hesabê dijmin ê malê û sûkê hevdu negirtin. Ji ber ku tûrikê qetiyayî wê timî di binê xwe de birijê û vala bibe.

Bêguman di valakirina tûrik de, para herî mezin ramanê Roja me û berxwedaniya zarokên vê axê, dîsa sebr û cefaya gelê me li pêş bûn. Planê dijmin ê vê salê jî tevlî yê berî wan bûn. Dibêjin; "Piştî kinê kezîkurê, hatinên nêçîrê bûne nêçîr" Jixwe gerîla ev e. Careke din dijmin bi mirûzê xwe yê tirş vegeriyan. Encax êdî dest bi şerê li ser kursiyan kirin. Vê carê ne li hemberî gerîla, li hemberî hev. Careke din gerîla bi xwêdana eniyê, bi xwîna dilan; destanên vejînê nivîsandin.

***





bêhemdî min tiliya xwe pel tetikê kir û leşker hate xwarê. Tevzînokeke sar laşê min rapêça. Êdî her tişt qediya. Ronahiya stêrka min melûlbû û pela min ji darê hejiya û ha bikeve ha bikeve xwarê. Tenê bayek mabû ku pela min ji dara jiyanê biwerîne. Wekî gula şilêrê berê min her tim li jêr bû. Axa ku ez lê sekinîbûm, ax… axa delal, ez ê di hemêza te de dibe ku di nêzîk de rakevim. Ji ber ku leşkeran ciyê ku lêbûm ferq kirin. Hemû meyla wan li ser ciyê ku lê bûm. Fena ku saeta di destê min de xwe ji bona dîroka qutbûna navika min jiyanê amade dikir.

Hêdîka min destê xwe ji ser çilpika bîksiyê anî xwarê û kişiya ser narîncoka di ber min de. Min wê gavê bi qasî demekê destê xwe bir ser narîncoka xwe. Wekî dayîka ku destê xwe li ser pişta lorîka xwe miz dida, min jî wisa narîncoka xwe difirkand û hêdî hêdî ew çitpita qilifa wê vekir. Tirkîniya çitpitê qilifê narîncokê bi tirkîniyeke tûj bi dilê min jî xist û bi dudiliyekê min narîncoka xwe xiste nava kefa destê xwe de. Di nava destê xwe de min qedereke din jî ew mizda û min tiliyeke xwe ya şehdê ya çepê xiste xeleka funyaya narincokê û ji nişkê ve! Vijîniyeke dirêj bi asîmanan ket vî…j… vi…j hingî her der kete bin bandora vijîniya balefirên şer ê F-16'an de. Cotê F-16'an wekî qijakan torê xwe bi ser cihê ku hevalê me tev lêbûn avêtin û badana xwe dewam kirin. Wê demê dûyekî reş ji eksoza wê derdiket û wekî xeteke reş li pey xwe dihişt û bi ser Katoyê re xwe berda.

Çiqas ez ê sax bimînim yan jî şehîd bikevim diyar nîn e. Lê hîn ez pêş de diçim. Piştî ez bi deh gavek din bi pêş de çûm ez gihîştim hevalek din. Ew jî wekî min pêş de diçû. Belê, navê wê hevalê jî Leyla bû, lê ne ew Leyleya ku fermandara yekîneya me bû. Rûyê Leyla di nava xwînê de mabû û rengekî sorî qetranî girtibû û bi hilkehilk gote ku; heval dijmin ji jêr ve bi dizîka tên û di nava wan tahtên ha de çeper girtine û nahêle em paş de bikşên û dijmin leşkeran dikşîne, ma qet fîşek li ser bîksiya te nîn in? Wisa bi lêvên lerizî, bi xeyalên şikestî pirsiya Leylayê.

Gotina Leyla agir bi dilê min xist. Min diyar kir ku fîşekên min hene û ez ê parastina te bikim û piştî ku we xwe gihande saxlemiyê hûnê min biparêzin. Pêwîst dikir ku bi lezgînî biçûna. Bi carekê re Leyla xwe ji ber wî kevirê ku ew diparest avêt, min jî ew cihê ku Leylayê tarîfkirî gulebaran kir. Ji ber ku rêka paşdekişandinê yekser pêşberî leşkeran bû, lewra paşdekişandin pir zehmet û bi rîsk bû. Li derveyî vê rêkê jî tu rêkê ku mirov pêşde bikşe tunebûn. Milê din ê Katoyê tev kendal û asê bûn û rê nedida. Êdî her hevalek û şensê xwe. Kî ma û kî çû. Kes nizane di vê rêkê de wê pelekî ji darê hilweşe, lê ne dema weşîna pelê dara ne. Belkî jî pel ji darê newerin. Vizeviza guleyê çekan ji bayê kur tûjtir bû û bêeman li ser hevalan dihatin werandin. Her wiha hîna tiliya min li ser çepika bîksiyê bû. Ji nişka ve reşatiya çend leşkeran ji cihê ku berî niha bi çend xulekan em lêbûn xuya kir. Leşkeran xwe di çeperên me de mitkiribûn û bi dîtina min a leşkeran re





Yekîneya me bi qasî şêst kes bû, du tîmên xortan yek jî yê hevalê jin bû, me li Bestayê debara jiyana xwe ji xwezayê dikir; giya, pincar, kereng û nêçîra lawirên kovî. Ji ber ku dijmin riyên erzaqan birîbûn. Polîtîka ev bû ku; ”avê biçikîne, masî sax bigre” Lê ev tu caran nedibû asteng li pêşiya coş û kefxweşiya yekîniyê. Me ji vê yekê tu xeman nedikir. Dayîka me ya ax û bihar bi me re ye, berketa wê ya xwezayî têra me gerîlayan dike û zêde ye jî. Gava ku bîr û bawerî hebe, her tişt hesan dibe. Qet tune be em ê li şûna avê xwêdanê xwe vexwin, bila xwarina zikê me jî bibe ax, ne xem e. Belê pêşiyên me gotine; “Riya ava herikî nayê bendavkirin”

Ji bo rêwîtiya li pişta Kêla Mem ê û Qilabanê, ji pişta xwe riya çend rojan me têra yekîniyê pêwîstî peydakirin û amedekariya rêwîtiya Feraşîn û Kato destpêkir.

Fermanek hat. Ji bona meşê her kes çentê xwe baş girê dabû. Hinek hevalan, goreyên xwe kişandibûn ser şalan, hinekan jî kefiyên xwe wek ertûşiyan girêdabûn, hindekan jî zendik rakiribûn jor. Ev kefxweşiyeke bêhempa di nava hevalan de afirandibû. Piştî em ketin rêzê, hejmar hate girtin. Meş û rêwîtiya me dest pêkir. Wê demê hevalekî ji bona min got; “Em ê meşa Mao bikin” Li hember vê henekê em hemû keniyan.

A niha em ê lingê xwe ji nava daristan û teraşan bavêjin û li nav gunî û mêrgên ku zikê berfê qelişandine de bimeşin. Pê re bayekî, li rûyê me dixist û taveke nerm hebû û bi vê berfa keviyan pê şadibûn, rûbarê ava berfa diheliyan û lîlavên gelek xwezayî û heybet çêdibûn.

Şert û mercê zozanan û jiyana li zozanan ne wekî yê daristanan bûn. Çêkirina çayek bi serê xwe serkeftinek bû, bi gunî û qirşikan agir dihat pêxistin, hela hela pêwîst e ku bê dû be. Ev cefayeke mezin dixwest. Bi taybetî dema ku hişyarî ji bo dû dihat, wê demê heçku tu di nava êrîşa qereqolekê de yî, lewra jî hevalê ku piranî di nava pratîka zozanan de bi ezmûn bûn, bi agir re mijûl dibûn.

Li pêşiya me wê car caran çem ê har û serxweşbûyî, ku ji berfa heliyayî pêkhatine re rû bi rû dimînin. Bejna hêlizan bilind bûne û li ser axê bi panî belav bûne. Ewqas gur bûne ku, heta şûtikê bilind jî bûne.

Meşa me didome, ji bona ku qutbenek çênebe, heval bi baldar in. Çekê hindek hevalan BKC û B-7 ano RPG bûn. Lewra hevalê din jî bi wan re dibûn alîkar. Çaydanka reş jî li pişta çentê hevalên lojîstîkvan e û mîna çirka saetekê geh çep dibe, geh rast dibe.

Coşa me pir bilind bû. Carnan em ser reşahiya erdê re dimeşiyan, carnan jî li ser keviyê berfê me xwe xiş dikir û bi qîra bang dikirin ûûû!!!! Heçku difiriyan, heval li ser hev kom dibûn. Wê demê lêv bi bask dibûn û ev dîmena heyî di bin hiş de ji bona ku careke din derneyê dihate nîgarkirin.

Fermandarê yekîneyê hevalê Eşref, wekî lokomotîfa trênê yekîneyê dikşand. Hemû hevalan jî wek malikê trênê li pey diçûn û bi vî awayî me xwe gihande rawestgeha bêhvedanê. Li rawestgehê tevahî heval belav bûn. Ji bona ku bikaribin qirşikên hişk û guniyên ziwa kom bikin, da ku em ji bo xwe çayekê çêbikin û bi vî awayî westandina





Hevalan biryara paşde kişandinê dan. Qîreqîra hevalê Serhed, hîn zêde heyecana min zêde dikir, dest û lingên min li nav hev diketin û min ji xwe re digot: “Hebe tunebe ev xuleka dawiyê ye û êdî her tişt qediya”. Lê dema vê yekê nebû, min bi lezgînî çentê xwe avête pişta xwe û ji heyecanê re li şûna ez destê xwe dirêjî destikê biksiyê bikim, min dest evête lûleya biksiyê. Hingî lûle ji germahiya teqîna guleyan germ bûbû, sincirîbû û ev kizîniyek bi destê min xist. Wê gavê min di hundirê xwe de lanetan barandin. Ev ji min kêm bû û min xwe bi bayê bez ê ji çeperê avêt. Her gaveke ku min di nava wan tahtên nexwe de davêt ku fena dafikên mirinê bûn, li ber çavên min her taht an kevirek wekî kêleke tirbê lê dihat û dilê min ewqas lêdida, heçku wê di devê min de bavêtana. Ka çi bikim, ji lingê xwe rica û tika dikim; “Hadê lingo bi qurbano”

Hêviya jiyanê ji cem min çûbû û qediyabû. Lê refleksên parastinê ketibûn pêşiya her tiştî û her ku min gav davêtin, hêviya min a jiyanê diçilmisî. Lê hêzekê ez bi pêş de daf didam. Min nizanîbû ew çi hêz bû, lê ez dahf didam. Her ku dengê bombeyan dihat, her ku fizîniya fîşekan li ser min re diçûn, min xwe devdevkî davête erdê û cardin radibûm û rûdiniştim, dimeşiyam û dibeziyam. Her tişt bi hev re bû. Heta ku min bîst gavek xwe ji çeperê ber bi jêr de berda, heta niha tu libên fîşekan û tu parçeyên xedar ê bombeyan canê min negirtibûn. Ez sax im, dijîm; lê çi feyde ye hîn gelek rê heye ku ez qut bikim.

di nava çeperan de û şer bike. Qe nebe dixwest tevlî dika şer a dawîn bibe. Ger ev pêvajo bûna fîlm, wê ev dik jî bûba dika encamê, ji ber ku wê her tişt di vê dikê de zelal bibûna.

Piştî ku hevalê Sînan cebilxane radestî hevalên pêwendîdar kir, hevalê ku hatibûn dikaribûn bizivirin. Hejmara me têrî xwe hebû. Heyacan û biryara şer di dilê Sînan de bû. Pêşniyar kir ku li eniya pêş şer bike û digot ku mafê min ê şerkirinê heye, ez ê wekî hemû hevalan li vir şer bikim. Digot ku bila hevalê Cîhan biçe, lê ez naçim û neçû.

Lewra tu çare di destê hevalê fermandar de nema û pejirand. Lê hişyariyan jî li hevalê Sînan kir. Piştî cabilxane li çeperan hate belavkirin, hevalê Şêro ji çepera min çû çepereke din. Hîn ji tarîtiyê re nîv saet mabû, lê mixabin dijmin xwe gihandibû dûrbûna narîncokan û gurmegurma narîncokan destpêkir û qireqira fîşekan ji çepera li milê rastê olan dida. Dijmin jî di cihekî wisa re êrîş dikir, me jî texmîn nekirbû û bi vî awayî xwe gihandibû dûrbûna narîncokan. Ji ber ku em bi dijminê pêşberî xwe ve hindekî lawaz mabûn, lewra şer ji destê qilêş û bîksiyan derdiket û êdî şer şerê narîncokan bû. Gum û ha gum, qêrînî bi leşkeran ket û qîjîniya hevalan jî tevlî qîran. Êdî gelek tişt ji bin serweriyê derketibû. Hîn ez di vê heyecanê de bûm, wê demê hevalê Serhed bi qîr banî min kir. Digot ku bi lezginî xwe bi paş de vekişîne.





xwe bûbûrînin. Çêkirina çayê di nava mangeyan de dibû pêşbirk, kî zû çaya xwe bikelandina ew jêhatî dihate dîtin. Di pratîkên wisa de her tim hevalê leşker sipêrtî berî her kesî çayê dikeland. Em hemû dibûn hesûdê jêhatîbûna hevalê Leşker. -Hevalê Leşker di payîza wê salê de tevlî karwanê şehîdan bû- A niha piştî me ava zozana kire çay, hinavên me germ bûn, westandin li milekî ma û niha jî em ê xwe bavêjin Feraşînê. Ji bona Feraşînê şevek me maye, lê em bi derbasbûna şevan nahisin. Şevek li ber 365 şevan nabe tiştek. Em li ber ava ku ji Warê Kurdo diherike û diranan ditevizîne dibihûrin.

Ava ku har bûye bi pêlên xwe, rê nedida ku mirov bi tena serê xwe li avê bide. Ji ber vê jî pêwîst bû ku pênc an şeş heval, mil bi mil mîna xetekê, yek jî li paş hemûyan bi hev re ling bihatana avêtin. Bi hemû hevalan re kelecanek bê tarîf hebû û ji qîrên hevalan ev diyar dibû. Ji ber ku ne tiştek hesan bû, di avên wisa gur de derbasbûyîn. Bi xwe her xetereyan dianî. Ji wê ya û şûn de em ê nema heya derengiya payîzê, nema rengê darê berû û sivoriyan bibînin. Hîna ji bona ku em bikevin tarîtiya şevê, du saetê me maye, li pêşiya me ve berpalek beroj derket ku pelê rêwaza xwe bi erdê ve pankirine, nêrînên wan jî berê xwe dane ezman. Bi nîv ewran ve diyar e, em ê li vê derê bêhnvedanek kurt bidin, ta ku em tama devê xwe jî ji rêwaza miz bidin. Hêdî hêdî şevê hawîdorên xwe bi tarîtiyê dipêçand. Li aliyekî heyv di roja xwe sisêyan de ye. Em ê rêwîtiya şevê bi sitêrkan re bûbûrînin. Car caran biriqandinên stêrkan di nava gola avê de leylanan çêdikir. Hîna jî bayek nerm li rûyê me dide, ji dûr ve rohaniya qereqolan dixuye. Kî dizane, belkî ev qereqol bibin nîşana me ya pêşerojê. Belê me saetên şevên kurt qulibandin û bi

berbanga wê şevê re, tîrêjan li ser derbendê Feraşînê li me hilat.

Feraşînê, sed hezar car waxx! Ez ê te çawa bidim nasîn, bi kîjan zimanî te bilêv bikim. Tenê ez bêjim tu wek navê xwe yî, ew ava te li me hemû hevalan helal be. Lewra jî ez ê behsa çar kaniyokê te bikim, ku di bin çavkaniya çem ê Xabûrê, xwe wekî keziyeke hûnandî, bi ser deşta Feraşînê de berdidin û jiyanê li dora xwe diafirînin.

Hevalê ku hawîrdor nas dikirin, bîranînê xwe digotin; "min li vê ciyî wisa kir, te jî wisa kir û hwd." hevalê ku nas nedikirin jî carnan bi pirs, carnan jî pirsên di hişê xwe de digotin. Gelo çiqas maye, em ê kengî bigihîjin noqtê. Piştî em ber tahtekî rawestiyan, me bêhnek da. Ber bi nîvroj bû. Li asîmanan di şûna rengê şîn, ewrê reş hêdî hêdî, gav bi gav xwe veduguheztin. Baran hûr hûr dest bi barînê kir. Bi peşkên destpêkê yên baranê re, me dest bi meşa xwe kir. Dengê ewr û brûskan wek topê giran li perdeyê guhê me diketin. Her ku baran xurt dibû, me jî dilezand. Her tiştê me şilopilo bûbû hetanî korika me. Vê carê rawestgeha trêna me li gundekî ku bi koçberkirinê bûye xirbe, encax ew gund me biparêze ji baranê. Em di şiveriyeke ku di nava hêliz û mendikan de winda bûye xwe gihandin ew gundê kavil bûye. Hêliz û mendik, hindek tiştên spî ku di bin de kumê xwe dane serê xwe û wekî sîwanan vekirine, bi dengekî beledî û brûskan diveciniqîn raberî me dikir. Hevalek ku ew berê nedîtibûn bi meraqdarî pirs kir. Heval ev çi ne? Yek ji hevalê me ku gelek ji qerfiyan hez dikir, "ev goştê xwezayê ye, ma we nedîtiye, tahma wan gelek xweş e, ku em gihîştin noqtê,





xwişka girêda. Lê me jî gelek leşker bêrih kirin û dayîkê gelek leşkeran jî bêlorîk hiştin.

Leşker her diçû fena serxweşê çavkor pêşde dihatin. Ji ber ku cebilxaneyê me kêm bûbûn, dijmin jî ji vê yekê sûd werdigirt û hîn zêde pêşde dihat. Em jî di hundirê xwe de ji bo alîkariya cebilxanê difetisîn û careke din cotê kobrayan hatin. Me jî qederek dem derbaskiribû û êdî siya tahtan xweş çêbûbû, roj bi milê rojava ve hêdî hêdî diçû ava. Lewra armanca dijmin hemû ew bû ku heta êvarî tenê bikeve vî girî û ji destê me derxîne.

Di vê nevberê de dengê hevalan ji pişt me dihat. Cebilxane hatibû. Dengê hevalê ku peyvê wî li me xerîb nedihat, min zanî ku dengê hevalê Cîhan e û ez li pêş xwe zivirîm da ku bizanibim ew û kî hatine. Ewqas cefa kişandibûn û di nava vê qiyametê de xwe gihandibûn me. Bi mêzekirina min re yekser wêneyê hevalê Sînan di bûbikên çavên min de bi rengekî zindî teyîsî. Li pişta wî çenteyeke leşkerî hebû. Dilopên xwêdanê li ser eniya wî wekî xunava li ser pelên gulên biharê bi şewqa rojê re dibiriqîn. Gelek westiyabû. Hilke hilk biser bedena wî ketibû, lê di çavên wî de coşeke pir mezin xuya dikir. Coşa çavên Sînanê kirîv yekser ez vegerandim şahiya ku bi tiliyên xwe li têlê tanbûrê didan. Erê ha erê ha… dinya ev e, jiyan ev e. Berî çend rojekê di destê wî de saz û îro jî çek û cebilxane. Sînan şervanekî sazbend bû, cengewerê awazbêj bû. Sînan wisa xwedî kelecaneke germ bû, yekser dixwest ku têkeve

taqeta şerkirinê dikeve. Halbûkî te bi xwe jî dîtiye, gava moralê fermandarekî tirş û talbe û bi guman be ango didulîbe, ev yek bandora xwe yekser li ser moralê leşkeran jî dike. Ji ber vê yekê jî çi dibe bila bibe pêwîst e tu carî moralê leşkeran xirab nebe. Ha ji bona pirsa te jî, biborîne min xwe jibîr kir. Lê tişta min got bi şîfreya gerîla bû û gelek heval ji bîksiyê re dibêjin Xezal. Ji ber ku wekî xezaleke xweşik e, dermanê xezalê jî fîşekê wê ne. Jixwe bombe dişibe pîvazan. Carnan jî heval jê re dibêjin petat an jî sêv. Ka niha em li derdora xwe baş mêze bikin, rewş pir giran e.

Axiftina hevalê Şêro ez pir dame hizrandin. Heman peyva hevala Nûjîn "hadê çavên min" bi bîra min anî. Erê, divê di rewşa pir zor de ku ezraîlê mirinê tora xwe vegirtiye, ev gotin xweşî û coşê diafrînin. Lewra di kîjan demê de û di kîjan gavê de wê stêrka me ji ezmanan birijiya diyar nebû. Her çiqas Nûjîn jî di hundirê xwe de gelek guman û tirs jiyan dikir jî, lê ew di rûyê xwe de netanî der û her tim bi rengekî çalak li ser dêma wê ya rastê xuya dikir û bi coşeke mezin li nav çeperan digeriya û coş dida hevalan. Wê demê min baş zanî ku Nûjîn di şer de hosta ye û ji şer baş fêm dike. Herêma cengê jî her ku diçû li me teng dibû û leşker jî her ku diçû pêşde dihatin. Em jî di çeperên xwe de wekî dareke kevnar rayê xwe di hundirê çeperê de asê kiribûn û hetanî niha melkemotê mirinê sê can, sê rih ji nav me birin. Agir bi kezeba sê dayîkan xist, reş li eniya sê





me di nava rûn de sor kirin, wê demê tu yê vê çêja bihiştî fêm bikî"

Belê ew tiştê ku ez bahs dikim "qîwark an li hinek herêman dibêjin kerok bûn" Pêşbirka qîwarkan destpêkir, ka wê kî ya herî mezin bibîne? Wê rojê me têrî xwe qîwarkan berhev kir û piştî meşeke kurt em gihîştin gund. De vêca bila hevalên fedekar di nava xirbeyan de daran kom bikin. Lê ev li gorî qirşik û guniyan pir hesan bû. Hinek hevalan dar anîn û hinek heval jî bi vêxistina agir amadekarî û tiştên dîtir kirin. Hevalên ku di meşê de westiyabûn jî, ketibûn xeweke şêrîn.

Bêguman çîroka meşê hê jî berdewam bû. Ji nişka ve dengê xuşîniya bêtêlan hat. Xuyaye hevalên li van deran dixwazin têkilî deynin û xwestin pêwendiyê bi me re çêkin. Belê rast e, qodê ku tê bangkirin, koda heval Eşref bû.

Bi dengê Derya! Derya! deng bi bêtêlê ket. Piştî rewş pirsînê, hevalên hêla dîtir gotin ku; "Dijmin li hêla Bêşebabê amadekariyên operasyonê dike"

Axafitina bêtêlê kir ku em hemû guhên xwe mûç bikin. Me di dilê xwe de digot; ma qey dema vî tiştî bû. Lê heval Eşref wek ku tiştek nebûye, bi xwînsarî got; "ka em çayek dîn jî vexwin, êdî dijmin bêminet e" Ev helwesta hevalê Eşref kir ku hestên me berztir bibin û em ketin nava tevgerê. Piştî me bêhna xwe da û me xewa xwe girt; cardin ferman hat da ku em derbasî tevgerê bibin. Belê em ê vê carê bêrawestan xwe li Katoyê bidin.

Ava Feraşînê pir zelal bû, bi rihetî mirov masiyên tê de bêyî ku melevanî bike dikaribû bigire. Carek din me bi destê hev girt û em ji avê derbas bûn. Mêrgên li derdora avê kulîlkên xwe xemilandibûn, her ku em derbasî Katoyê dibûn, coşa dilê me derdiket asta herî berz. Çend dolik, çend girik me qulibandin, tenê keviyek maye em ê xwe bigihînin Çelecengê, lê ew rûyê Kato bi xwe ye, a niha sed metre maye.

Wey Xwedê ev çi ye? Kelha xwezayî li pêşberî me ye, zinarê berezîvî diteyîsin, berfa çalan jî, nexşeya Katoyê xêz kiriye, tîrêjê rojê xwe li deriyên wê dide, li ezmana parçeyê ewran xwe bi ser Katoyê zîz dikin. Her ku roj diçû ava, ewran jî rengên cuda digirtin, geh sor dibin, geh şîn, geh spî; mor bûn, belekî jî şensê me bû. Me xwe gihande vê dîmena xweşik, em li wir kom bûn, hindek piya, hindek jî rûniştî, wêne li ser wêneyan me girtin. Wê demê me xwe di dilê Katoyê de dît, bi qulibandina rojê, bi xatirxwestinê re em jî qulibîn milê Katoyê. Em ê şeva xwe di hemêza hesreta xewê de derbas bikin….

***

Di yekê gulana sala 1998’an de Rêber Apo, ji bona pirsgirêka kurd bigihîne asteke din, wekî erkeke dîrokî peywireke mezin hilgirt ser milê xwe. Daxuyanî û biryara agirbesta yekalî da. Gerîla jî wek şagirtên li hember mamosteyên xwe, yekser ev biryar bi cî anîn û ji derveyî parastina xwe ya rewa, bêyî ku çalakiyên leşkerî bikin, ketin tebatiyê. Li ser vê bingehê û bi talîmata Biryargeha Navendî ya Eyaletê, em ji herêma Gulpinarê ber bi Kato ve vekişiyan. Bi vî awayî di navbeyna du roj û şevekê de em gihîştin Kato Marînos. Lê vê carê yekîneya me tenê bû.





- Ka derbasî kenala pêncan bibie.

- Baş e!

Bi zimanekî xerîb û gotinên ku min jî jê fêhm nedikir têkilî domand û got:

- Heval ji me re bi lez dermanê Xezalê û hindek Pîvaz pêwîst in.

- Temam, fêm bû.

- Heval Mazlûm çi dibe bila bibe divê ew gir neyên berdan, ev fermana hevalên jor e.

Axiftinên hevalê Şêro yên di bêtêlê de gelek bala min kişand û mereqê bi min re da çêkirin. Gelo? Ev çi bû? Lewra min xwe negirt û min ji Hevalê Şêro pirsî! Ji min re wisa hat ku, di rewşeke wisa de ku ji me re cebilxane pêwîst bû, çawa pîvaz û xezal dixwazin. Li ser vê yekê, bişirîniyeke nerm li rûyê Şêro geş bû. Ew rojeke sax bû ku min bişîrîniyeke wisa di nava vê toz, dûman û cengê de nedîtibû. Her wiha Şêro ez bersivandim. Ya min nexwest ez vekirî bêjim ku cebilxaneya me nemaye, ji ber ku dema dijmin pê bihise ku cebilxaneya me nemaye, wê têkeve êrîşê. Ma ne gava din te dît çawa fermandarê wan bi leşker û sûbayan re xwe aciz dikir. Divê mirov di şer de tu carî vekirî neaxive. binêre di nava şer de serkeftina derûnî zahf girîng e, carnan gotinek tenê dilê leşker ji şerkirinê sar dike. Coşa leşkeran gava ku ket, nikare şer bike û ji

me kun bûn û di gelek ciyên laşê me birîndariyên sivik çêbûn. Lê dîsa jî çepera me bi xwînê soromoro bû. Bêbavan em tengav kiribûn û fena şûjinan di laşê me de kiribin, em gelek aciz bûn. Hevalê Şêro;

- Ma ka em çi bikin, rewşa min jî wekî ya te ye, ka em bêhna xwe fireh bikin, kêmek maye ev bêbavê kobrayan wê biçin.

Piştî ku kobra bi tevahî cebilxana xwe li ser deriyê em tê de çeper bûbûn vala kirin, careke din cihimîn û vegeriyan. Bi zivirandina kobrayan re hevala Nûjîn xwe gihande çepera me. Bi awayeke bêhnçikandî bi hilkehik hat û rewşa me pirsî û got; cebilxaneya me gelek kêm maye. Hema hema li ber xelasbûnê ye. Roketên me yên arpîcê jî nemane. Jixwe heta niha me bi xêra fîşekên yedek şer dikir, ger bi rengekî zû alîkarî û desteka cebilxanê negihêje me, em ê nikaribin lûtke biparêzin. Hevalê Şêro; baş e heval, ez ê bi hevalê Eşref re têkiliyê deynim û cebilxanê jê bixwazim. Bes divê em mijara di cebilxaneyan de hinekî destgirtî bin û li min zivirî;

- Hevalê Erdal? Tu jî kêm kêm fîşekan bavêje, baş e.

Li ser vê yekê hevalê Şêro pêl li bizmika bêtêle kir û bang kir:

- Derya… derya.. derya … derya!

- Derya guhdar e!





Kato wek cihekî rizgarkirî dihat dîtin û ji hevalan tijî bûbû. Ew cara yekem bû ku li zozanan ewqas heval bi hev re diman. Hema dikarim bêjim hejmara hevalan bi qasî 150'î kesî hebû. Bi giştî, qasî du yekîniyan bi tevger bûn. Cardin hêzên biryargeha eyaletê bûn. Di nav van hêzan de jî, yên YAJK'ê û yên lojîstîkê hebûn. Lewra jî tu bi kîjan milî ve biçûnayî tu leqayî hin hevalan dihatî.

Di vê navberê de, hevalekî ku nû tevlî bûbû bi awayekî matmayî pirsek ji nav dilê xwe avête derve û got: "Ya ma qey heval wisa gelek in" Hevalekî lê vegerand û got: "Ev lê lê ye hîna te lo lo neditiye. Ka tu herî başûr, wê demê tu çi bêjî." Lê dîsa jî wî hevalî di ber xwe de diaxivî û wiha digot: "Bi Xwedê em ewqas bin kesek wê bi me nikaribe" Hevalekî ji bo wî bersiv da û got: "Na em çiqas bin jî, divê dîsa jî em xwedî tedbîr bin û her tim hişyar bin"

Lê wî hevalî gera xwe dewam kir. Di nava hevalan de, bi kêfxweşî çû cem hevalek din û sohbet kir.

Jiyan bê rawestan didomiya. Li ser axê, moriyên reş û zer di nava pêşbirkê de bûn. Qûtê zivistanê li ber deriyên qulmoriyên xwe berhev kiribûn û yeko yeko dikşandin binê erdê…

Ji derveyî hevalên ku ewlekarî digirtin, tevahî hevalên din wek moristanê xebata berhevkirina qûtê zivistanê dikirin. Bi giştî liv û lebatek bêrawestan hebû. Dem dema "sererastkirinan" bû. Çûn û hatin bêrawestan bû, di kîjan saetê de wê mêvan werin, wê ji ku derê werin ne diyar bû. Lewra diviya bû ku em her tim amadebin ji bona pêşwaziya mêvanan. Li kêleka vê, hevalan biryara

haziriya şahiyekê dabûn. Hema bi lez hevalan dest bi haziriyan kirin. Bi şevê dengê têlên tembûra heval Sînan dihat (kurê Hozan Comert bû) her wiha dengê stranên hevalên keç, di nava van zinar û latan de hildikişiya ezman. Gelek heval di nava amedekariyên de bûn. Dihat gotin, wê îro saet di nehê şevê de şahî dest pê bike. Hevalên xort riyên xwe kurt kiribûn, hinekan jî simbêl li ser lêvan de berda bûn. Hevalên keç jî keziyê xwe yên hûnandî û biskê ku xelekî kiribûn û di ser piştê de berdabûn.

Ji ber ku di nava piratîkê de zû bi zû derfetê çêkirina şahiya çênedibû, lewra hemû heval di meraqa destpêkirina şahiyê de bûn. Jixwe tu carî coş ji hevalan kêm nedibû. Ji ber ku tevahiya hevalan ji nava coşa şer hatibûn. Lê vê carê dîmenê şahiyê cudabû…

Saet ber bi nehan ve, piştî hemû hevalan ciyê xwe girtin, pêşkêşvan derketin pêşberî hevalan. Şahî bi sehneyeke kurt ku li ser rêwitiya hevalan hatibû amadekirin dest pê kir. Di dema rêwitiyê de hevala Zinarîn ku şehîd ket û beşdarî karwana şehîdan bû, hate bibîranîn. Deqeyek rêz hate girtin û soza girêdana şehîdan hate dubarekirin.

Sehneya ku hatî pêşkêşkirin pir balkêş bû, li ser meşa hevalan hate rawestîn û bûyerên ku di serê hevalan de derbas bûbûn, mijara skeçan bû. Koma hevalan dikeve kemînê, hevalên keç destpêkê rastî kemînê tên. Şerekî demkurt tê jiyandin, ji nişka ve hevalên keç dikevin kemînê. Piştî lêkdanê hevala Zinarîn bi giranî birîndar dikeve. Berek guleya ‘G-3’ ya bêbext, xwe davêje hinavê heval û heya nava parsûyên wê bi cî dibe. Wê demê heval





-Tam karşimizde Katode bizim askeler bulunmaktadir, onlar gûrûyûmûsûn.

-Dogrudur komutanim.

-Askerlerin bulundugu yerden ilerî de îkî yûz metrelik mesafet de bîr rokêtatacek bulumaktadir. Bûtûn cephanalarin oraya dogru yonelt ve o rokêti iştevsiz hate getir.

-Temam komutanim.

Dengê pîlotê kobrayê di bêtêlê de, heçku robotek diaxivî dihat. Tenê gotina wî jî “temam komutanim” bû. Piştî têkiliya fermandar bi pîlot re qediya, Hevalê Şêro bi dengekî tijî û biqîr bang kir tevayî hevalan;

-Heval xwe baş biparêzin, wê kobra tevahî cebilxana xwe li ser vir vale bikin. Ji ber wê xwe baş biparêzin. Vê carê dengê çekê me tev hatin birîn, tenê dengê bîksiya Ferhad dihat. Ji ber ku tenê çepera wan dikarî di bin êrîşa kobrayê de jî şer bike. Lewra ev hêviya me ya parastinê bûn ku nedihiştin leşker pêşde werin. Ev çeper û bîksiya Ferhad hêviya kaniya jiyane bû. Li kêleka çepera me ku ez û Şêro tê de bûn, kevirekî pir mezin û pan hebû. Bi carekê re, dîtina min dîtî teqîn bi kevir ket û parçeyên ji keviran firî û piraniya wan li nav guhên me ketin. Heçku derziya di laşê me re bike wisa bi me dikir. Di nav parçeyê keviran de jî parçeyên fîşekan hebûn û piraniya laşê me di nava xwînê de hiştin. Lê ya baş parçe pir kûr nediçûn, tenê cilê

Hevalê Erdal li xwe miqate be, bênamûsan sûîqast dikin, hay ji xwe hebe. Baş e, wekî ji min re hatibû gotin bi baldarî min leşkerên dijmin hedef digirt. Di vê navberê de careke din kobra hatin. Bi hatina kobrayan re min û hevalê Şêro xwe di ber tahtek mezin de ku li kelek çepera me bû, me xwe di ber hev re dirêj kir.

Kobra peyaseyên xwe didomandin. Hevalê Qendîl rokêteke din ya arpîcê avêt û careke din dengê fîşekê dijmin hatin birîn. Piştî ku teqîn bi arpîcêyê ket, xiştînî bi bêtêla Hevalê Şêro ket. Leşkerek fermandarê xwe agahdar dikir: “Komîtanm onumizde bîr roketatar var, o rokêt atar devre dişi birakmasaniz, biz ilerliyameyiz, askerler korkup one gidemiyorler” Dengê fermandar fena ku di bîne bîreke kûr de dihat û wiha digot: “Temam asker açik komuşma, “balik”a heber vereceyim”

Ez nizanim, belkî qesta wî kobra bû û kodê kobrayê “balik” bû. Hevalê Şêro bêyî ku wext winda bike, destê xwe avêre bêtêla xwe, qenala bêtêlê guhert, yekser çû ser qenala “balik” 15 5500 Ez jî di bin çavan re temaşe dikim. Hevalê Şêro dizanibû. Bangên fermandar didomiyan;

-Balik!  balik!

-Balik dinliyor..

-Balik bak sen benî yermî biliyor mûsûn?

-Êvet kumîtanim!





ew bi dilsariyeke mezin ji ciyê lêkdanê dûr dixînin. Lê mala felekê xirab e, birîn gelek kûr e, heçku li kezebê ketiye, her ku diçe rengê rûyê heval zeratî digire. Lê Zinarîn şagirta Rêber APO û zîlanan bû, rihê zîlanan di hundirê Zinarîn de xwe her zindî û nû dike.

Berî ku hevala Zinarîn şehîd bikeve vê dibêje; “Hevalno birîna min gelek kûr û xedar e, hûn biçin xwe xilas bikin” Lê belê dilê hevalan nikarî vê yekê rake, lewre jî jê re dibêjin: “Na heval em nikarin te li vir bihêlin û biçin, em ê te xilas bikin”

Jixwe kizînî bi dilê hevalan ketibû, gotinên heval Zinarîn jî ev kizînî dijwartir dikir. Firmêskê êş û liberketinê diherikî ser rûçikê wan hevalan û bi dengekî lêvlerizî ji xwe re digotin; “Na Zinarîn na, hê gelek zûye”

Li ser rûyê Zinarîn xwêdanek sar dibiriqî ji êş û çîkên birînê xwe kişandibû hev, her tişt diçû li ber deriyê bêveger, lê hîna jî di nava çavên wê de hêvî dirijiya. Lewre jî bi dudiliyekê gotina xwe ya dawîn dibêje: “Hevalno, birîna min kûr e, ez naxwazim birîna min bibe sedema tu birînin dîtir, lê viya baş bizanin ku ez ê nehêlim birîna min kêfxweşiyê bide dijmin, lewre jî ez ji we lava dikim biçin, ez a di hundirê we de baş dizanim, dizanim dilê we disoje, lê hûn dibînin derfetê xelasiyê tunene, biçin û silavên min li tevahiya hevalan bikin, Bijî Serok APO.”

Piştî ku heval neçar man û hinekî ji hevala Zinarîn dûr dikevin, ji nişka ve, dengê gumîniyekê tê. Hevala Zinarîn, narîncoka xwe di bedena xwe de diteqîne.

Ax Zinarîn ax…

Qey te dizanî ev ê werê serê te, lewma tu di meşê de ewqas biken bûyî, dengê kenê te wek dengê bîksiyê bû hevala min!

Belê ev şano û kurte sehneya hatî çêkirin li pêşiya hevalan piştî çar rojan ji şahiyê bû rastî. Zinarîn ew Zinarîn bû ku rastiya peyvê li Kato Marînos kire piratîk û nehişt ku dijmin bi birîndarî wê dîl bigre û kêfa dijmin xweş nekir.

Beşa yekem a kurteşanoyê ku agir û hêvî bi hev re xiste nava dilê me û em dane hizrandin, hevalê pêşkêşvan wekî sûprîzekê fermandarê Eyaleta Botan hevalê Cemal vexwend ser dikê. Çepikên hevalan coşa hevalên fermandar jî bilind kir. Coşa heval di çavên wî yên kûr de diteyîsî û tevahiya hevalan bi coşa fermandarê xwe hîn bi coş bûn. Dibêjin ku "Artêş siya fermandar e" Ev yek di nava dîmenê şahiyê de mirov pir rehet didît, piştî axaftina hevalê Cemal şahî dîsa dewam kir.

A niha hevalek ji nava hevalan de ku me ji wî re digot Cem Sînan, di destê wî de saza xweşik û delal, pê re jî hilkişiya ser dikê.

Çiqas xweş e, ne wisa!

Li serê van çiyan di destekî de saz di destekî de çek. Bi taybet dema ku bejna wî hevalî bi şal û şapik pêçayî be, wê demê wê çiqas bedew be xemla gerîlayekî.





re, vê carê bi dengekî stûr dengê Şêro hat û gazî kir: Heval dijmin pir nêzîk bûye ka bîsvîng li cem we nîn e? Bila hevalek çend rokêtan bavêje, lez bikin. Bi gotina Şêro re hevalê Qendîl beziya arpîciyê. Hetanî wê gavê me arpîcê bikar neanîbû. Tenê Qendîl jî di avêtina arpîcê de hosta bû û bêyî ku bisekine du guleyan avête hêla dijmin. Bi teqîna arpîcê re zingînî bi guhên me ket û bi vê zimezimê re li hêla dijmin qêrîn, hawar û qajîn olan da. Bi qasî çend xulekan ji hêla ku dijmin lê bû, xêliyeke bêdengiyê rapêça. Her hal fena her carê derûniya dijmin tevlihev bûbû. Dîsa fena her carê hevalê Qendîl, erka xwe anîbû cî. Di vê navberê de hevalekî bang dikir. Hat xwestin ku tevlî bîksiya xwe werim çeperê. Bi gihîştina çeperê re min dît ku hevalê Şêro çong vedabû û bi nîşan yek bi yek libên fîşekan davêt. Hevalê Şêro ji ber pir hûrik bû, me di nava hevalan de bi henekî jêre digot: "Qito" Belê, Qito pir sivik û bi tevger bû. Fena cîvayê di cihê xwe de nedisekinî û fena pezkoviyan xwe ji çeperek davête çeperekê.

Çepera ku heval lê bûn, gelek stratejîk didîtin û di rastiyê de jî wisa bû. Dijmin fena ku di heriyê de biçike rawestiyabû û nikaribû bilive. Di çeperê de mirov derdorê baş didît û li ser erazî serweriya me hebû. Min bîksiya xwe vekir û hevalê Şêro yek bi yek cihên leşkeran nîşan dida. "Hadê hevalê min, her ku te ew dîtin çend fîşekan li wan bibarîne"

der li ber çavên min tarî bû û heçku tu avekî qerisî bi ser min de bikî û canê min tev tevizî û bîranînên min ê berê li ber çavên min xwe nîgar dikirin.

Xişman ji berî du-sê saetan bi dengê xwe yê koçerî bang li me dikir, lê niha! Ne Xişmanê çavên reşbelek û ne jî gotinên wî yên koçerî. Tenê axeftina wî ya dawîn wekî wesiyet ma ji me re; "SILAVÊN MIN LI HEVALAN BIKIN" Wê demê tevayî hestê min ber bi Dêrikê ve çûn. Dêrika ku Xişman jê dayikbûyî, Dêrika kaniya şehîdan, Dêrika îro ku dîsa kaniyeke din peqiya û der bû û tevlî kaniyên te yên din bû. Dêrik bi te ser bilind bû Lawikê Koçer. Ax û sed hezar ax…

Ma Xişman wê birayê te yê biçûk çi bike piştî şehadeta te. Xweş tê bîra min gava te û Sadiqê ji te biçûktir şer dikirin. Te li ser tevlîbûna partiyê digot: "Çi dibe bila bibe, ez ê tevlî bibim." Erê hevalê min, te ya xwe bi ser xist. Tu şehîd î, lê tu di hundirê me de yî, erê hevalê min ew rihê te yê ku te pê de bomba teqand, wê ji me re bibe hêza berxwedaniyê û em ê çeperan bi wî rihî biparêzin. Soz didim te Xişman soz…

Ez bi van xiyalan vegeriyam çepera xwe û rewşa heyî min tev ji hevalê Serhed re got. Lê hîna jî di nava hizran de ez kûr mabûm û gelek pirs di serê min re dizivirîn. Çi bi Bargiran hat? Gelo herdu hevalên şehîd ên li cem hevalê Şêro kî ne? Çima heta niha Şêro ew nehatine? Çi bi wan hat? Her wiha hîn çend xulek derbas nebûyî ji hatina min





Cem Sînan, bi strana "Zerdê Zerdê Zerdelayê" coşa hevalan gihande asta herî jor, bi taybet dema ku têliyên xwe di nava têlên tembûrê re dibir û tanî, wek dayîka ku porê keça xwe bi şe teno teno dikir.

Axx… xweziya we bizaniya ka çi awaz ji nav wan têlên tembûrê derdiketin, bi têlên tembûrê re têlên dilê hevalan jî lêdida û çawa "orkestraya" dilê çiya çêdibû. Serê hevalan bêhemdî wan, bi çepê û rastê ve dihat û diçû. Biskê hevalên keç jî li ber bayê sivik-sivik sema dikirin.

Bila bişewite destê neyaran ku ew dest û teliyên sazvan ji me veqetand.

Wax Sînano, Sînanê Kirîv!

Ew destê sazê di nava cengê de, bû destê hevalekî û şer …

Erê Sînano erê!!.

Te jî di wê cenga piştî 4 rojan de xatir ji min xwest hevalo! Tu bûyî nîgar di tevna mejiyê me de hevalo! Oxir be hevalo Oxir be.

Piştî şahî qediya, hevalê pêşkêşvangot: "Dîlan serbest e" Dîlan bi strana "wez xelef im xelef im" dest pê kir. Lawan digot, keçan li wan vedigerand, keçan digot lawan li wan vedigerand. Teperepa lingan, gurmînî bi ezmanê jorîn dixist. Dîlana Botanî em sermest kiribûn û dilê me li tevahiya Botanê digerand. Li pişt me Çiyayê Kato jî, li govenda gerîla temaşe dikir û bi rengekî ji xwe razî û

piştrast wek xwedayê parastinê bi me dida hîskirin û digot: “Şabin, şabin, ez li pişta we me.”

Dîlana me xwe gihande şevê, lewra jî şevê ji rojê re got:“Ji kerema xwe re tu gelek bi wan re şabûyî, bihêle ez jî bi coşa dilê van keç û lawan şabibim, çend saet bin jî ez kerba dilê xwe bavêjim aliyekî, ji xwe re têr û têr li wan temaşe bikim.

Jixwe şev û roj wekî xwişk û bira ne, wek hevalên hev ên dirist in, timî ji hev hez dikin. Heçku cêwiyê zikekî bin.

Di vê navberê de, şevê bangî keça xwe ya mezin heyvê dikir, hela were, ji xwe re li van dilan binêre, çi dilên zelal û pak in. Heyvê li dayika xwe vegerand û got: “Ma ev dilê çiyane dayê”

Pêre heyvê elinda xwe avête nava dilên çiya, şev dereng dibû. Heyva bedew, ji xewa nikarî derengtir bimîne û bi xwe re jî ev dîmenê xweşik nivandin. Ezman çikî sayî ye tenê ji stêrkan re maye. Şev bû şeva lalan, tenê vizîniya bayekî hinekî sar tê, çavên stêrkan diçirisin di gulovera xwe de dizîvirin û bi hev re peyvên xweşik dibêjin.

Piştî vê şeva xweşik, li berbangê em li ser dengê heval Xişman û Dijwar rabûn ser xwe, çavên me li rojeke nû vebû.

*cîhana stêrkan*
*di asmanekî sayî de*
*bi beriqandina stêrkan re*
*bi hev re awaza şevan digotin*





vekişandibûn. Lê Xişman nekaribû, ji neçarî dev ji lûtke berdidin. Ger ku dev ji lûtkeyê bernedin, wê bi birîndarê bikevin dest dijmin.

Belê, hevalê Xişman ji bona ku nekeve dest dijmin, narîncoka xwe di xwe de diteqîne û bi vî awayî dilê dijmin xweş nake. Ma hûn dizanin çi gotibû?

“Heval birîna min gelek giran e, ez nikarim xilas bibim, hûn biçin û silavê min li hemû hevalan bikin, Bijî serok APO” Belê gotinên herî dawîn ên hevalê Xişman ev bûn. Piştî ku hevala Nûjîn serê hevalê Mazlûm bi parçeyek şûtikê girê da, pirsa hevalê Şêro kir.

Hevalê Mazlûm lê zêde kir. Li cem wan jî du heval şehîd ketine, lê ez nizanim kî ne, min di xwe de taqet nedîte ku ez bipirsim. Jixwe cebilxana wan jî pir kêm mabû, ji ber vê jî neçar mabûn ku bi paş de bikşên û bi rengekî hev û din biparêzin bi paş de dikişiyan, ma hîn nehatine?

Na … na got hevala Nûjîn. Baş e wê demê hevalê Mazlûm tu derbasî milê piştê bibe, jixwe berî niha hevalê Serdar jî birîndar bû û ew jî qulibî milê piştê. Haydê dereng e. Piştî ku hevalê Mazlûm birêket û qulibî milê piştê, min jî ji hevala Nûjîn pirsî ka em ê çi bikin. Heval tu vegere çepera xwe, lê pir hişyar bin, baş e. Bi dilekî birîn vegeriyam çepera xwe û min di dilê xwe de, xweziya xwe anî da ku min tiştek nepirsîna. Axaftinên Mazlûm, birîndariya wî, dîsa behsa wî ya hevalên şehîd, agir bi dilê min xist û her

Bi gihîştina çepera hevalê Mazlûm re, ez çi bibînim! Agir bi dilê min ket, laşê min hemû bû êsîrê tevzînokên sar û tifa min di qirika min de ziwa bû, ji lêvên min peyv dernediketin, kelegiriyek qirika min bi hişkî girtibû. Mala min xira bibe Mazlûm birîndar e û hîn jî dilopên xwînê ji nava porê wî yê bi xelek bi ser rûyê wî yê sorik de dinuqitî û diherekî. Cih bi cih xwîn di nava qermîçokên eniya wî de qalik girtibûn. Kelecaneke bê ser û bin ketibû nava wî de, lê dîsa jî li şûna xwe behsa Bargiran dikir. Ji ber birîndariya xwe, nikaribûye Bargiran xilas bike. Tişta diyar dikir, herî dawîn di nava leşkeran de mabû û li ber xwe dida. Piştre hevala Nûjîn hat û demildest di nava pirsan de dest bi paqijkirina eniya wî kir; lê Xişman ka Xişman?

Hingî wekî ku daxek di birîna wî re bide û goştê birînê bikewîne, wisa bi Mazlûmê birîndar hat. Bi cavên şil û lêvên lerizî bi kelegiriyeke bi birîn û bi keser û axîneke kûr bersivand.

- Xişman, Xişman şehîd ket.

Bargiran, Xişman û Mazlûm her sê jî birîndar ketibûn. Roketeke kobrayê li nava hersêyan dikeve. Bargiran ji lingên xwe birîndar dibe. Bi vî awayî xwe berdide dola jêrîn. Bes birîna Xişman ji ya me herduyan girantir bû. Wî ji sînga xwe de perçe girtibû. Ji ber kûrbûna birînda wî, zêde zêde xwîn windakiribû. Jixwe dijmin hema hema ketibû nava çepera wan û wan bi zorê xwe bi paş de





*ma gelo!*
*rast e stêrk bi hev re dipeyivin?*
*carekî we re guhdar û temaşeke*
*biçe ser girek bilind*
*wekî katoyan*
*destê xwe yî rastê*
*deyne ser rûçikê xwe*
*bi destê çepê jî*
*çavên xwe*
*bi desmaleke spî pak bike*
*kûr kûr berê xwe bide*
*ezmanê jorîn*
*bi qasî çend deqîqeyan*
*temaşeke*
*guhdarke*
*tê wê çaxê*
*peyvên stêrkan*
*awaza wan*
*di beriqandina wan de bibînî*
*çawa mirov*
*xwedî cîhanek bi hest û evîn e*
*cîhana stêrkan jî hîn xweşiktir e*
*ne kîn ne hesûdî*
*ne jî dilreşî*
*cîhanek tijî hêvî û baş temaşeke*
*tê bibînî*
*çiqas evîndar bi soz in*
*di her şevê de xwediyê soza xwe ne*
*soza wan*
*ji evîndariyê ne kêmtir e*
*ji soza Mem û Zînê*
*bû sozdarê welat û azadiyê*

*ji ber ku stêrk*
*ne nefs mezinin*
*bi kêfxweşî*
*di destên sibihê re*
*cihê xwe didin rojê*
*ma gelo*
*mirov ji vê cîhanê re nabe evîndar*
*lewra jî bila evîna dilê me*
*di cîhana stêrkan de be*
*bi vê hêviyê çavên xwe bigre*
*belkî wê demê*
*di xewna xwe de*
*tu bibînî*
*ku ez û te bibin stêrk*

***

Di hundirê pilanê de biryar hebû ku hindek hêzên li Katoyê sivik bibin. Li ser vê bingehê hejmarek heval bi tevî hin pez û dewarên me yên heyî derbasî Gera Berana bûn. Hevalên me yên li wir jî piştî sererastkirinan, bi taybet ji bona çêkirina çeperan di bêdengiya şevê de derbasî cihê ku hatibû diyarkirinê bûn.

Tîma me jî ku hevala Leyla fermandara wê bû, em jî wekî hemû hevalan derbasî cihê xwe bûn. Me bi dest çêkirina çeperên xwe kir. Di her alî de tedbîr dihatin girtin, her wisa beriya şeveqê me cihê xwe qedand. Di wê kêliyê de hevala fermandar got: "Bila heval pêdiviyên xwe pêk bînin, dibe ku em ber bi seharê ve nikaribin hereket bikin" Jixwe em ji vê yekê re xerîb nîn bûn. Dema fermandara me





bûm dengê hevalê Mazlûm hat û digot, Bargiran birîndar e… tenê min ji wî ev fêm kir. Lê ji ber ku kobra hîn diçûn û dihatin, min nedikarî ku xwe bighînim cihê ku hevalê Mazlûm hatibûyê. Lewra min hizr û pirsên xwe di ber çavan re bi hevalê Serhed re parve dikirin. Jixwe pirs di serê min û hevalê Serhed de jî digeriyan. Hevalê Serhed jî dengê hevalê Mazlûm bihîstibû. Lê rewşa Xişman ne diyar bû.

Bargiran birîndar bû, lê tu kes bahsa hevalê Xişman nedikir. Dibe ku hevalê Ximan şehîd ketibe? Hem ji xwe pirs dikim hem jî ji derdora xwe pirs dikim.

- Heval tu bi xwedêkî, ka niha ne wextê vê ye, tu dibînî rewş çawa ye.

Baş e! Min gotibû, lê ya rast di hundirê xwe de negihiştibûm tu baweriyê. Bes ez neçar bûm ku gotina xwe bibirim. Jixwe ne wextê van pirsan bû jî. Serhed mafdar bû. Min zoq li peşiya xwe nihêrt û her ceng berdewam bû.

Piştî ku kobra ji meydana şer çûn, careke din berê xwe da hêla me. Lêdana dilê me vegeriya wekî xwe. Dilê min nerihet bû û min ji hevalê Serhed re got ku ez biçime çeperên hevalê Mazlûm kontrol bikim, ka rewşa wan çi ye? Lê hevalê Serhed nedixwest bibe hevkarê min, li hêleke din ve jî wî jî dixwest rewşê fêm bike. Di nava vê bêdudilê yê de min berê xwe da çepera hevalê Mazlûm.

badidan. Me jî bêemdî xwe canên xwe dikşande hev û xwe di ber kevirên çeperê de dirêj dikirin. Ji ber ku ew kevir wekî pêsîrê dayîkeke ji me re dihatin. Çawa ku zarokên biçûk xwe bi pêsîrê dayîka xwe ve dikirin yek, me jî wisa ew kevir hemêz dikirin. Heçku mirov di bin eziyet û êşkencê de be, hemû berxwedana me bi girêdana hevaltiya me ve dihate meşandin. Em ji hev pir bawer bûn, lewra jî xema dijmin di dilê me de bê bandor bû.

Belê?

Di bin êrîşa kobrayan de me hem xwe diparast, hem jî gava me derfet didît me bersiva leşkeran dida û me nedihişt ku ew zêde bi pêş de werin. Rewşa tevayî hevalan wekî ya min û hevalê Serhed bû û kêm zêde wekî ya me bû. Tenê çepera hevalê Ferhad di her şert û mercan de bêrawestan bersiva hemû êrîşan didan. Kobrayan jî nedikarî bandora xwe li ser wan bike û êdî şer bûbû şerê kozikan, kî bi kî bikare…

Dîsa tiştê herî baş ê ku em kêfxweş dikirin ew bû ku heta niha tu windahiyên me tunebûn. Tenê birîndariya hevalê Serdar hebû, ew jî li gorî pêvajoya şerê hatî meşandin asayî bû. Lê dilê me jî gelek diêşand. Agahiya me ji hevalên din tunebû. Jixwe hevala Nûjîn gotibû ku hevalê Şêro cihê xwe berdane. Mixabin derfetê lêpirsînê çênebû ku em bipirsin ka tiştekî cuda, wekî windahî an jî birîndar hene an na. Vê yekê jî gumana me zêdetir dikirin û hîn bêtir em diêşandin. Hîna ez di nava guman û hizran de





digot kew e, me digot nikulê wê sor e. Ahengeke bi vî rengî hebû.

A niha êdî tarîtî xatirê xwe dixwaze, êdî me pêşiya xwe didît, dem dema keşfê bû. Hevala Leyla dûrbîn ji çentê xwe derxist û çavên xwe yên şîn dane ber çavikên dûrbîna sedamî, dest bi temaşekirinê kir. Me jî di dilê xwe de digot; gelo ma dijmin daketiye an na? Pirsan di serê me de rê nedidane hev, li bersivên xwe digeriyan. Ji ber ku bersivên gelekan bi lêvên hevala Leyla ve girêdayî bûn. Ka wê çi ji me re bêje. Lewra çavên me geh li derdoran, geh li hevala Leyla bû. Perdeyên guhên me ewqas tenik bûbûn ku, bi dengekî herî nizm “sinyalek” jî heba wê bigirtana. Her çavên hevala Leyla li ber dûrbînê bû, carnan ji nêz carnan jî dûr ve dûrbîna xwe badide û digerand, ev yek jî ji bo me wek îşkenceya jopan dihat. Lewra hevalekî xwe negirt û bi dengekî şikestî got: “Hevala Leyla ma çibû ka bêje, tiştek heye an na” û di berde jî dikire ûfeûf.

Piştî axaftina heval du deqe derbas nebûn, hevala Leyla lalbûna xwe şikand û bi xwînsarî got: “Hevalno bila tu kes tevgerên vekirî neke, li pêşberî me, li ser tepê Girê Reş dijmin heye, lê xuyaye hûn pir meraq dikin ha hûn jî lê temaşe bikin, Lê baş baldar bin û xwe aşkere nekin. Piştre dûrbînê dirêjî me kir.

Me jî wek birçiyên çav bi nên dikevin, bi hev re destê xwe dirêjî dûrbînê dikir. Lê hûn dizanin ku heşt çav bi hev re nakevin ber çavên dûrbînê. Lewra me yeko yeko, bi rêzê berê xwe da Girê Reş û ta ku me dijmin bi çavên xwe dît. Her hevalekî dema ku bi dûrbînê temaşe dikir, çi dîtiba bi

hevalan re parve dikir. Yek hejmara wan, yek çeper çêkirina wan, yeka din jî şêwazê tevgera wan digot. Her kes bi temaşekirinê re, şîrove û nirxandinan dikir. Piştî ku me dijmin bi çavên xwe dît, ew xeyalên şevê bûn rast. Ger berê deriya pirsan hebû, lê niha bû zeryanek.

***

Duh çawa bû îro çawa ye. Feylezof û zanyar ji xwe ve nabêjin "Dualîtiya jiyanê" ji ber ku hetanî şevê din Girê Reş xirxalî û vala bû. Tenê qirik û qijik lê diman, kundan lîsên xwe lê çêkiribûn. Îro jî li şûna qir û qijikan, ew polat û celadên botreş lê diyar in. A rast xwediyê botên reş jî ji qij û qijîşkan ne cudatir bûn.

Di ber keşfê re me xwarina ku ji bo pênc kesa hatibû veqetandin derxist. Xwarina me savar, pênc nan û çend kirtên şekir bûn. Vexwarin jî bîdonek av bû û qederek berfa ku me ji kunan derxistibû. Di rojeke wisa de hebûna van tiştan ne tiştên hesan bû, ji xwe min berê jî gotibû ev tiştane li beramberî bîr û baweriyê nabin pisgirêk, me bi nanekî îdare kir û xuriniya xwe şikand.

Hevalên cixarekêş berî xwarinê xuriniya xwe bi kişandina cixarê şikandibûn. Piştî xwarinê jî her cixarekêşek, yeke din pêça û avêtin nav lêvên xwe, di firtên kişîna wan de diyar bû ku vê carê ji ya berî xwarinê xweştir bû.

Em li gorî rêzik û hişyariyên ku ji me re hatibûn kirin tevdigeriyan, guhên me geh li ser cîhazê bû geh jî li ser derdoran bû. Ji ber diviya ku her kêliyekî de her tişt bihata guhartin, lewra jî em pir hişyar bûn.





jî bi tena xwe nikare wan biparêze û ji wan re nabe bersiv. Dibe ku bikare carekî du caran xwe ji fîşekan biparêzin, lê cara sisêyan wê ji wan bigre, wê demê ew û şensê xwe ger ma û ger mir.

Şer tu caran bi hestan pêş nakeve, bi mejî tê birêvebirin. Erê? Rastiya di hundirê şer de hestên pir giran pêş dikevin, carcaran mirov xemgîn dibe û carcaran mirov kêfxweş dibe, lê hest şer bi ser naxin. Hestê ku peyda dibin di encama şer de ye û bi serkeftin û binkeftinê ve girêdayî ye. Lewra şer ne tenê dest dayîna ser çilpikê çekan û avêtina guleya ne, ne tenê êrîş û parastin e, dîsa ne tenê kuştin û mirin e, ne tenê xwîn û xwîdan e, ne tenê dûman û bêhna barûdê ye, ne tenê lêdan û paş de vekişandine; rastiya şer ne tenê ev in. Ji ber ku şer têgîneke her tişt di hundirê xwe de dihewîne. Bi taybetî qet tiştê ku neyê texmînkirin tê jiyankirin.

Gelek caran mirov tevgereke wisa dike, piştre jî ew mirovê ku bi xwe ew tevger kiriye bawer nake ku wî kiriye yan di rewşa tenha de çi dike nikare ku hemantevgerê bike. Wekî xwe ji zinarekê avêtinê, şer karekî awarte ye û her tişt dibe ku bibe. Rewşa heyî ku niha em û dijmin jiyan dikin jî rewşeke wisa awarte ye û em bi rewşeke wisa re rû bi rû ne.

Di vê navberê de careke din cotek kobra peyaseyên xwe li ser serê me re avêtin. Di her careke ku lê didan, tevzînokên sar ê mirinê li canê me xwe dialandin û xwe

Dijmin bêyî ku teknîka xwe bikar bîne, fena miriyek li ber sêkeratê be bû û dema ku kobra dihat jî ji nû ve rih dikete canên wan û diketin tevgerê. Lê îro teknîk jî di Deriyê Moxil de pir zêde bandora xwe nîn bû. Ji ber ku derî wekî xirbê bajarekî ye û tevlihev bûye. Hem tahtê wê bi ser hev de ketibûn xwarê, hem jî bi ser vê yekê de jî, piraniya hevalan baş wê derê nas dikirin. Li ku derê çal heye û li ku derê kunek heye hevalan bost bi bost nas dikirin. Ev tenê jî ji bona berxwedanê ne besbûn, ji vê cengê re ji berî her tiştî wêrekî pêwîst bû. Lê ya ku dijmin hesap nedikir, em bi rihê apocî tijî bûn, lewra di dilê gerîla de tu xema leşkeran nîn bû.

Li aliyê din jî ango li aliyê dijmin, kêm zêde tevayî leşker di yek astê de bûn. Ji ber ku leşkerê ku dê û bavê xwe bifikire, wê bikaribe çi bike? Hemû xeyalên wan ew e, wê kengî bi saxî vegerin mala xwe.

Lewra fermandarê wan dikirin û nedikirin nedikarîn wekî ku dixwazin wan bi pêş de bajon. Bes ev nayê wê watê ku qet leşkeran şer nedikirin, na! Ji ber ku leşkeran jî ji ber parastina xwe jî mabe neçar in şer bikin. Dev ji armanca giştî berde jî wê şer bikin, lê mebesta me ew e ku leşker her tim çavên wan tenê li wê ye ku xwe tenê xilas bike û ev derûnî li cem her zindiyekî heye. Lê ev tişt li cem leşkerê ku xizmeta pergalê dike hîn di pêş de ye. Wê demê ji parastinê zêdetir tirs dertê pêş. Leşkerên dijmin zêdetir bêezmûn in û ne di ferqa rastiya şer de ne. Wê gavê teknîk





Saet dihate 12'an, roj ji milê Katoyê Navîn ve bilind dibû. Yek li ser serê me ye. Germahiya wê xwe avête nav germahiya mejiyê me de. Piştî ku me xwarina xwe ya nîvroj ango firavîn kir, ji nişka ve xişînî bi cîhazê ket, guhên me tevan di ber xwe de zîç bû, lerzok li ser bedena me jan dida, ji ber ku heya wê demê deng bi cîhazê neketibû. Lewma meraqa me tevan ketibû ser cîhazê, me di ber xwe de digot: Gelo ev dengê xişîniyê yên hevalan bû yan ê dijmin bû. Cureya cîhaza me ye ji marqa "YASO", du alî bû, ev jî tê wê wateyê ku dikare du aliyan sînyal bigire, vê yekê jî nehişt em fêrbibin ka kîjan bû. Hevala Leyla bi leza brûskê destê xwe avête berîka xwe û cîhaz da ber çavan û lê temaşe kir. Carek dît xişînî bi cîhazê ket, hevala Leyla got: "ev xişînî ji qenala dijmin tê, xuyaye wê têkevin tevgerê" Min di wê navberê de dûrbîn ji hevalên dî xwest û da ber çavên xwe. Hûr hûr, zirav zirav li leşkeran nihêrt, pê re jî dîtina min dît ku piraniya leşkeran rabûne ser piyan. Wisa xuya bû ku ji yên sibehê zêdetir bûn. Ji nîvê leşkeran zêdetir çentên wan li pişta wan bûn û ketin rêzê. Ji vê û şûn ve bi navber ketin xetek ava kirin, xwe ber bi tengava ku ber bi Kato ve tê berdan, hejmara leşkeran ne kêmî 150'î bû, ketin rêka piyade ya ku tê Katoyê. Di nava destê leşkerê pêş de cîhaza kontrolê hebû. Piştî vê dîmenî rewş tev hate guhartin, êdî şer li ber derîbû.

Her ku rêza leşkeran nêz dibû, hestê me jî dihatin guhartin, me ji xwe re digot "de werin de" ji ber ku em dizanin çi li pêşiya wan heye. Belê sûprîzek heye sûprîza kezeb qetandinê.

Şelîta leşkeran a wekî marekî reş, di wê rêka xilxalî de, çep û rast didane xwe, her ku nêz dibûn dengê dahola cengê dihat. Berê leşkeran rasterast ne li tîma me bû, li milê me yê çepê ku dibû aliyê rojavayê Kato ango li wî milî Deriyê Berana heye dihatin. Tîmek hevalên me jî li wir bûn. Berê leşkeran jî li wan bû. Min gotibû her tişt dihate guhartin, heçku saetê jî xwe giran dikir, dengê têla xwe ya deqîqan dipûlpiland, çirk jî meşa xwe kire meşa "keybanûyan" Tiştek di xema wê de tunebû, ne saeta têlkurt, ne deqîqeya bejinzirav, ne jî çirka qure bi kelecana dilê me nizanibûn. Nizanin ku ev şev û rojek e em li benda vê cengê ne, kêmek maye em ê qehr û kerba dilê xwe, bi libên qilêşên xwe biwerînin ser koma leşkaran. Her diçû herkîna leşkeran jî bênavber didomiya.

Saet dihate dudiyan, êdî rêza leşkeran ji me ve xuya nedikir, tat û zinarê Katoyê xwe dikirin perde li pêşiya çavên me. Em ji xwe re dibêjin ha heval lêdin ha lêdin, ji ber ku di planê de hebû; beriya ku dijmin bikeve nava Kato, bikeve bin gulebaraneke bê ser û bin a komên kemînê, lê deng nehat, wê demê guman ketin serê me, êdî me teva li çavên hev nêrî; ma çima hevalan lênedan? Bersiva vê ya jî peyda nedibû. Bi gotinek gelêrî ku dibêjin "yê deng mayî ew dizane çima deng maye" me sedema nelêdanê pir bir û anî, her yekî ji me sedema nelêdanê bi tiştekî ve girê da. Lê di encamê de tenê ev dibû texmîn û nêrîn, ji ber ku rastiya nelêdanê li jêr bû. Lewra derfetên ku em xwe bighînê tunebû. Vê yekê jî em di bendewariya ku hinava dilê me disojîne de hiştin. Çav û guhên me li milê çep û li jêr bû, destê me jî li ser dilê me bû…



KATO

Navê wî girê bilind Deryê Moxil bû. Belê? Deryê Moxil wê îro bibe deryê berxwedanê, deryê namûsê. Ji ber ku ji derveyî rêka berxwedanê tu rêkên din li pêşiya me tunebûn. Jixwe ji derveyê vê yekê di rewşa heyî de, wê bûbûna xiyanet. Lewra herî kêm heta êvarî pêwîst bû ev çeper wekî xwe bimana. Jixwe fermana vê yekê bi zelalî hatibû dayîn, ji ber wê çawa ku fermana ji leşkeran re hatî dayîn, bi heman rengî ferman ji me re jî hatibû dayîn. Êdî şer bû şerê herdu fermanan û bi zimanê gelerî "kî berx e û kî beran e" wê hetanî êvarî diyar bûbûya.

Deryê Moxilê berî niha jî bi dehan caran şahidiya şerên giran kiribû. Çeperên wê pir baş hatibûn çêkirin û pir zexm bûn. Ev yek jî wê pir bi me re bibe alîkar ku em zû bi zû bernedin û biparêzin.

Ya aşkere ev bû ku, me yê hetanî êvarî ev gir biparasta û me yê nehiştana ku planên dijmin bi ser bikevin. Belkî me şehîd bidaya, lê me yê li wir dîrokek binivîsandana. Ger berevajî wê bûbûna jî, wê felek li me çep vegeriyana. Belkî jî wê nîvê hevalên me şehîd biketana. Pêwîst dikir ku hetanî ku dijmin xwe bigihîne hevalên me yên din, divê pêl cenazeyên me bikirana û derbas bûbûna. Ma ev yek wisa hêsan bû? Ji ber ku em hemû heval di asta jor de bi biryar bûn û di ferqa planên dijmin de bûn. Mijareke din, pêwîst dikir ku lehengiya apocîtî, îro li vê Katoyê ji dijmin re bihatana nîşandin.

Bi gotina min re tevayî hevalan jî ew dîtibûn û bi hev re me çekên xwe li wan rast kirin. Mirov digot qey orkestra ye, me hemûyan bi hev re bi fermana şefa orkestra şer hevala Nûjîn re lûleyên çekên me lal kirin. Encax gulebarana me leşkeran ji çepera hevalê Mazlûm wan re bû alîkar ku paşde vekişin û leşker jî ketin çeperan. Lê me baş nizanibû ka Mazlûm wan xwe xilaskirine an na. Tenê me dît ku xwe ji çeperan berdidin û ji wê şûn de ji me ve nedixuyan. Mereqa wan xiste nava dilê me de, di şûnê de birîneke nû bi xwe re vekir û dil û hinavên me dikizirand. Gelo çi bûbû?

Piştî ku li pêş çavên me çepera hevalê Mazlûm wan ket, rewş her ku diçû girantir û zehmetir dibû. Rewşa ku dihate jiyankirin ev bû. Ne tiştek dîtir. Êdî herdu çeperên me yên pêş ji dest me çûbûn. Bes heta ku çûn jî qederek dem bi me dane qezenckirinê. Tenê girekî parastinê di destê me de mabû, lewre ger ew gir jî ji destê me biçûna wê gavê rewş wê hîn çetîn be û wê hevalên me yên din jî neçar bin ku tev bikevin nava şer û wê ev yek bihêle ku heval bibin hedefeke vekirî ji teknîka dijmin re. Jixwe dijmin vê yekê dixwest û hewldana wan ew bû ku hetanî êvarî girê herî bilind ên me yê parastinê jî ji dest me bigire. Ku ev jî bûbûna, wê yekser bi ser hevalên din de biçûyana. Lê em bi biryar bûn û çi dibûna bila bûbûna me yê xwe di paş de venekişandana û me yê li ber xwe bidana.





Saet ji sisêyan bihûrîbû. Fikr û bala me bi tevahî li erazî bû. Ji nişka ve wekî ewrekî bêwext dengê roketavêjek di nava heft qatê jorîn ê asîman de veda. Êdî ne dengê daholên cengê bû, ceng bixwe bû. Xeyalên me, çavên me, guhên me, hestên me tevan berê xwe da ciyê teqînê û bêhemdî xwe, me xwe avête çekên xwe. Heçko li cem me jî wê dest pê bike. Lê ev nebû!

Ji ber ku niqriskên fîşekan, ji cem koma hevalên me yê li Deriyê Hirçê bi cî bûbûn dihat. Pê re jî hevalekî got; “Bi xwedê ev şer li cem hevalên tepecî ye!” Hevalekî din; “Ma ne pêwîst bû hevalên di kemînê de destpêkê lêdabana?” Careke din hevala Leyla bi xwînsarî axaftinên xwe kir û got; “Heval ma her tişt li ber çav e. Şer li cem tepeciya ye. Em niazanin çima ev rewş wisa çêbû. Ji ber ku divê hişyariyek mezin hebûna. Xuyaye hinek tişt wekî ku hatî plankirin pêk nehatiye, qe nebe ji niha û şûn ve em hişyar bin û baş bişopînin.” Di vê navberê de, di cîhazê de bangî tîma me hate kirin.

- Hevala Leyla!

- Heval, hevalên li gir in bi dijmin re ketine şer. Divê hûn hişyar bin. Ku guherînek çêbû, em ê ji we re bêjin. Ger ku we jî agahiyek girt, demildest em agahdar bikin. Bila cîhaza we timî vekirîbe.

Dengê teqînan her diçû zêdetir dibû û şerekî dijwar li dar bû. Her diçû dengê narîncok, fîşek û qarewara leşkeran di nav de olan didan. Dengê bîksiyê wekî tilîliyan dirêj dirêj olan dida. Gurmîniya narîncok û guleyên arpîcê, fena gurmîniya tavanên biharê bûn. Çirûskên agir li ser tahtan

diçûn û ev dîmen û dengê şer, kela dilê me gihande asteke bilind. Gurmînî û teqîn bê rawestîn bû. Ger mirov jê re bêje daweta şer, wê di cî de be. Lê ya rast ne dawet bû û bi hemû sotîneriya xwe şerek dijwar û di nav hev de pêk dihat.

Tîma me li ciyê xwe di çepera xwe de rûniştîbû. Li çepera me liv û lebat nîn bû. Lê hest û dilê me li cem hevalan bû. Mereqa me ya li ser hevalan, hundirê me diheland. Her wisa bê navber bi wîzînî û gurmîniyên bênavber, şer du saetan berdewam kir. Dengê perwaneya kuçikê belek –kobra- li nav tahtan olan dida û taht dilerizand.

Ax! Kelecana dilê me wer lê dida, lê mixabin tiştekî ku me bikirana nîn bû. Tenê me hêvî û xweziyên xwe dianî ziman, ew as. Her meraqa me, rewşa hevalan bû. Me digot, hema heta bibe êvar, tiştek ji hevalan neyê temam e. Pê re jî hêdî hêdî şevê qirasê xwe yê tarî avête ser meydana şer.

Bi tarîtiya şevê re her tişt guherî. Bêdengiya şevê û lalbûna şevê nemabû. Tenê çek diaxivîn. Dil lêdidan. Herset û meraqa hevalan jî hundirê me diguvaşt. Her diçû fena ku em bifetisin bêhna me teng dibû. Hevaltî şîrîn e hevalno! Ha tu ha hevalê te!

Her çû tarîtiya şevê serdest bû, dengê çekan her çû kêm bû. Ev dihate wateya ku rewşek din destpê dike. Careke din wîzînî bi cîhazê ket:

- Leyla! Leyla!





stratijîk de bû, wisa dixuya wê hemû şer li ser vî çeperî hîn gurtir bibe.

Hê hevala Nûjîn gotina xwe xilas nekiribû, dîsa xişînî bi bêtêlê ket. Dengê fermandarek bû û pir bi dijwarî diaxivî, ferman dida leşker û serbazên di Katoyê de û wiha digot: “Ne olursa olsin ileriya gidin, bu savaş de savaşin kadronin elinde bulundiranlar var, kîm ileriya gitmiyorsin arkadan vurun ve one geçin”.

Ne min û ne jî hevalê Serhed baş bi tirkî fêm dikir, min zanî ku behsa şer dikin, lê min her tiştê gotî fêm nedikir. Ji ber vê yekê min ji hevala Nûjîn pirs kir. Fermandarên wan digotin çi dibe bila bibe divê pêş de biçin. Pêwîst bike yên ku li pêş wan neçin jî bên kuştin. Hevala Nûjîn ji me re got ku, baş diqet bikin, derdora xwe baş kontrol bikin, ez ê biçim çeperên din kontrol bikim, ger tiştek ne asayî çêbibe xeberê bidine min. Piştre demildest wekî şêrejinekê xwe ji çepera me avête ya hevala Nûcan. Wê demê em hingî têgihîştin ku texmîna me rast e û dijmin pir pêş de hatiye. Em hêjî di ciyê xwe de û me hîna hîna li rûyê hev temaşe dikir.

Bi nihêrina ji çavên Serhedî yên reş î re leşker xuya kirin û bi yekser êrîşî çeperên hevalên Mazlûm û Xişman kirin. Wisa dixuya leşkeran heb bikaranîbûn û bi çavkorî êrîş dikirin. Bi dîtina leşkeran re bêhemdî qêriyam; Serhed bavêje wê hane wê… wê hane…

marjînalkirin ango tebathiştin jî têrî wan dikir. Niha jî jî ewqas leşker û teknîk û mesref belasebe nîn in.

Ev hemû di planeke berfireh de dahitin bipêşxistin. Diyar bû bi amedekariyeke mezin hatine operasyonê, lewra zû bi zû leşkerê xwe teqwiye dikirin.

Dîmenên heyî, fena dîmenek ji şerê cîhanê hatibe girtin dixuya. Her cure teknîk dihate bikaranîn, bi deh hezaran leşker. Tenê li hember wan jî, bîst hevalên cegerpola, bi coş, sûzenî, lehengî, girêdanî, sebr û helecaneke bêhempa rawestiyane. Her çiqas şer ewqas dijwarbû jî, lê tişta baş ew bû ku heta niha me tu windahî ji bilî çar hevalên ku me şehîd dan pê ve, tu windahiyeke me hetanî wê kêliyê nîn bû.

Kobrayan tu rehetiyek ji me re nedihiştin û leşkerên qomando jî di bin êrîşa kobrayan de bi pêş de diçûn. Di vê xirecira giran de û tevliheviyê de hevala Nûjîn jî xwe avête çepera me. Min bi acizî jê re; heval tu çima hereket dikî, ma ne kobra li ser serê me digere. Li gorî hevala Nûjîn tevgerîn ji vê saetê şûn ve ne rast bû, lê fermandarên wan ên mezin bi riya bêtêlê fermanên pir hişk dane qolê leşkerê di Katoyê de. Têkiliya me bi Mazlûm re qut bûbû, ez nizanim çi bi wan hatiye, ji xwe her tim tîma hevalê Şêro jî mecbûr dima ku çeperên xwe berdin û bi paş ve vekişên. Ji ber vê yekê hevala Nûjîn ji me zêdetir hişyarî dixwest. Ji ber ciyê me di asûneke





Ev hevalê Eşref bû. Pirs kir ka tiştek nû heye an na û da zanîn ku bi awayekî baldar destê xwe bidin me.

Axaftinên hevalê Eşref gelek ji me re balkêş hatin. Ji ber ku me tiştekî wisa texmîn nedikir. Lê xuyaye ku hinek tiştên cuda hene. Jixwe dema ku hevala Leyla got, tiştekî nû nîn e, ne ji dil bû. Bi her awayî di rû û çavên me de, diyar bû ku tiştek heye. Lê hinek tişt hene ku bi cîhaza nedihatin gotin.

Di mejiyê me de gelek pirs hebûn û her diçû zorê dida fikrên mirov. Gelo çi bûye? Em ê çi bikin? Heval çi difikirin? Çima bang li me kirin? Pirs ketibûn pêşbaziyê û li benda bersivên xwe bûn.

Belê, bersiva pirsên me li jêr, li cem hevalan bû. Di nava pêşbaziya pirsan de me çentê xwe girt û çek di dest em ketin tevgerê. Berî ku têkiliya cîhazê, me texmîn dikir ku, wê hevalê me yê li jêr wê ber bi me ve werin. Beravajî vê berê me li nişûfê (berjêr) ye. Mîrata tahtên katoyê, fena birekê ne. Divê em bi lez herin, bes her em lez dikin jî, solan dibire. Hêdî hêdî di tarî-zilûmatê me xwe gihande yekîneya hevalan.

Saet dehê şevê bû. Heta tu bêjî di nava hevalan de bêdengiyeke fena ya stêrkan serdest bû. Lê liv û lebateke fena zivirîna stêrkan jî hebû. Me dest bi amadekariyan kir, bes em zêde serdestê planê nîn bûn. Hevalê Eşref, dest bi axaftinê kir û me li dorê xelekek ava kir. “Heval, wekî ku em difikirîn plan pêk nehate. Xuyaye dijmin hindek tişt di planê me de ferq kiriye. Ji ber vê yekê dijmin nekete dafik û kemîna me. Bi qasî ku me di cîhazan de fêm kiriye,

hevalan hindek dîmen dane ku ev jî mijareke ku em piştre nîqaş bikine. Hevalan derbeyek baş li dijmin daye. Çar hevalên me şehîd ketine. A niha em ê birêkevin. Bila her heval tevlî tîma xwe bibe.”

Piştî ku hevalê Eşref axaftina xwe qedand, kêmek be jî em ketin ferqa rewşa heyî. Lê gotina wî ya ku “windahiyên me hene” kizînî bi dilê me xist. Hestên me yên tolhildanê di çavên me de diçirisîn. Lê pêwîst bû her tişt di bin kontrolê de bana. Ji ber ku şer tenê bi hestan birêve naçe. Rastiya şer jî, ji vê yekê hîn dijwartir e.

Piştî ku çar şehadet jî bûn pirs, me ji bo demekê vê carê civîna pirsan avête bin hişê xwe û ketin rêzê û birêketin. Piştî ku em gihîştin hevalên xwe yên din, hingê em fêrbûn ku biryara berdana Katoyê hatiye dayîn û em ê bi paş de vekişên.

Ji bona paş de vekişandinê hejmara me pir pir zêdebû. Vê yekê jî bi xwe re giranî çêdikir. Dijmin jî dem bi dem ji tirsa xwe re, bê ser û ber eletexmînî erazî gulebaran dikir. Carnan jî li hewayê şiltaqê êgir difirandin. Van şiltaqê êgir jî tevgera me hindek girantir dikir.

Hetanî ku dengê cengê hebû, derziya xulek û çirkên saetê wekî “Tiralê Bexdayê” dilebitîn. Niha jî fena mehîneke germbûyî tu nikare serê wan bigire. Belkî jî ji me re wisa dihat. Bi rastî jî wisa bû. Niha jî têla xulek û deqeyê du xetê pênc deqîqeyî, bi pişt xeta nehê ketiye. Yanî saet ji nehan deh dibûhurî. Di vê kêliyê de me xwe ji nava tahtên Kato yê asê ku giranî çêdikirin xelas kiribû û em li cem ava rûbara di ber Katoyê re diherikî, rawestiyabûn.





me ve dixuya, bes a hevalê Şêro û hevalên din qet xuya nedikirin. Lewra me nedizanî ka rewşa wan çawa ye. Di vê navberê de careke din dengê pirepira kobrayan dihat. Cot kobrayên belek ji pişta Katoyê Navîn derketin û li ser mezrayê re peyasa xwe kirin. Li pey wan jî fena rêzeqijikan du firokeyên skorsky xuya kirin. Şopandina kobrayan didomiya, gurîniya ji perwaneyên wan dihat nedihişt ku em erazî guhdar bikin an hevdu bibihîsin. Yek ji firokeyan berê berê xwe da Tepê Reş û li wir leşkeran danî. Ev ji bona min  rewşeke balkêş bû. Tepê Reş berê tijî leşker bû. Lê çima ji nû ve pênc-şeş leşker danîn vî girî. Hebe tunebe ev fermandarên wan ên mezin in. Lê bi zelalî min nedikarî herim biryarekê. Ya min tenê texmînek bû. Pê re jî girên mayî bi daketinan hatin dagirtin.

Firokeyên ku kobra şerîd bi şerîd li ciyên ku texmîn dikirin ku heval lê hene, guleyan direşandin. Pê re jî fûzeyan bi rê dikirin û li nava guhên Kato dixistin. Di vê navberê de hejmareke zêde leşker xwe ji Tepê Reş berdan ber Kato. Êdî leşkerên ku di nava Katoyê de bi cî bûbûn, her diçû zêde dibûn. Dijmin dixwest ku hêza me têxe nava pevçûnê de, piştî wê jî bi teknîkê heta ku jê bê li me bide û piştre jî wê hêza ketî nava pevçûnê de bixwaze, wê dorpêç û tune bike. Jixwe di biharê de ev teqtîk li gelek deveran hatibû ceribandinê û bi taybet li Bestayê pêk anîbû. Wê demê jî hem li Bestayê hem jî li Amedê ji bona bi tevahî tunekirinê teknîk bikar anîbûn, bes tu encamek jê negirtibû. Tabî armanc tevahî tunekirin pêk neyê jî,

Ev jî tevdîreke ewlekariyê bû. Di şeran de bivê nevê her hêzek xwedî sûîkastvana ye û ji dûr ve hewl didin ku encaman bigirin. Çawa ku sûîkasçiyên me hebûn, yên dijmin jî vala nedisekinîn.

Di çeperê de ez û hevalekî bi navê Serhed bi hev re bûn. Serhed bixwe ji başûr rojavayê Kurdistanê, ji bajarê Efrînê bû. Zêde kevn nîn bû. Jixwe berê ez û wî di heman yekîneyê de bûn. Digel vê yekê jî min der barê wî de zêde agahî nedizanibû. Lê ev ne pirsgirêk e, ya girîng ev bû ku, mirov di çeperekê de mil bi mil ji bona hevdu canê xwe bide...

***

Çepera me vê carê bi dilê me bû û ji sê aliyan ve bi kevirên xwezayî çeper hatibû pêçan. Wekî din li kêleka me ya çepê bi bîst gavan du hevalên bi navê Hemze û Ferhad hebûn û çepera wan binerdî bû û ji ya me hîn baştir bû. Wan dikarî di bin êrîşa kobra de jî bi rehetî şer bikirana. Li cem Hemze çeka BKC hebû û pir li ser çeka xwe hakim bû. Her çiqasî çeka wî otomatîkî bû jî, lê li gorî ku dixwest bikartanî. Gelek caran çeka xwe wekî qernasê bikar dianî. Dikaribû yek bi yek guleyan biavêtina, bes gava ku pêwîst dikir jî qêrînî ji bîksiyê dianî.

Me zêde gule neditegandin û fîşekên xwe ji kêliyên dijwar re dihiştin. Çeperên pêş di nava şer de bûn û li ber xwe didan, lê diyar bû ku bi dijmin re ketine mesafeyeke nêz. Çepera Mazlûm, Xişman û Bargiran ku têdebûn kêmekî ji





Xuşîniya avê ji me re digot ku; “lêvên xwe şil bikin, tîna xwe bişkînin, dibe ku careke din ev derfet bi destê we nekeve” Me jî xatirê avê neşikand û bi ava sar qirika xwe şil kir. Lê tîna hundirê me, em ê bi çi sar bikin. Kerba Dilşêr, Botan, Dijwar û Siyabend ku dilê me sotandin, ne bi avê ne jî bi bayê sar dişikiya. Encax û encax bi tolgirtina hevalên şehîd wê bikaribûya kerba dilê me yê şewitî hindekî rihet bikirana.

Ciyê ku em tê re bi paş de vekişiyana, ji bilî giyayê zozanan ên zerbûyî û çend kevirên belave tiştek nebû. Li derdoran cî bi cî agir bi giya û guniyan jî ketibû. Şewqa êgir li hindek naverastan li me jî dida. Lewra em di ciyê rût û tazî de bi meşa qazan derbas dibûn. Ji bo ku em kêfa dijmin xweş nekin, çi pêwîst bû me dikir. Gava dijmn agirê hewayî yê şiltaqan jî davêt, em tev bi erdê re dibûn yek. Heçku evîndarek evîndara xwe ramûse, me jî wisa axê radimûsa. Çekên me jî di hemêza me de bûn. Me çekên xwe fena zarokên di hemêza zarokên xwe de diparast, da ku neçirisin.

Bi qasî bîst deqîqe an nîv saetê, bi vî şiklî em tevnedigeriyan. Bêdengiya me di nava teqûreqa fîşekan de li nav hev diket. Fermanên ku dihatin dayîn, wekî herikîna ava çeman pêk dihatin.

Belê; di nava vê hewaya cengê de, di nava germahiya hestan de, bayekî sar ji gundikekê li jêr dibaliviya û enî û rûçikên me dialaste. Lê ne sûda sira bayê payîzê ne jî cemeda qutban dikaribû tîna dilê me sar bikirana. Dilê me fena volqanekê difûriya û em hîn jî dimeşiyan.

Piştî çend deqên bêhnvedanê, di bêdengiya ziman û lêvan de me dest bi meşa xwe kir. Lê dil û mejî yek kêlî jî ranediwestiya. Dil hestan diquluband, mejî jî bûyerê rojê mîna fîlmekî zindî di ber çavên me re dibir û dianî. Carinan bi lez, carnan jî bi tebat, li ber çavên min, keşfa saharê, bêdengî û xwînsariya hevala Leyla, dijmin, şerê ku qewimî û dîmenên hevalên şehîd… Di nava van xeyal û hizirandinan de, di carekê de berê min ket asîman. Stêrkan tu tişt ji rewnaqiya xwe berze nekiribûn. Ew bûbûn şahidê bûyerên rojê. Lewra jî bi rengekî matmayî li me mêze dikirin, fena ku bipirsin, ma xêr e çibûye? Lê min nedikarîbû tu bersivek ji wan re bidana. Tenê min ji xwe re got, hûn bi me re bin, bes e, hûnê fêm bikin….

Min berê xwe da saetê. Ji donzdehan re çend xulek mabûn. Em ketin rojeke nû. Saeta di destê min de saeteke dijîtal bû. Lewra wê piştî çend deqîqeyan tevahî reqamê xwe wê biguhertana, wê bûbûya "Mon 14.9.98"

Belê!

"Mon" bi îngilîzî yanî roja duşem ê. Roj jî çardehê îlonê bû. Lê ger saeta min a badanê bûya, wê tevahî derzikê wê li ser reqema dozdehan biciviyana û nîşaneya rojeka nû bikirina. Her wisa çavên hejmara saetê bi roja nû re wê werin guhartin. Wer xuya bû ku sibeyî jî wê tev di nava guhartinan de be.

Piştî em kombûn, fermandarê eyaletê heval Cemal hat pêşberî me. Ev cara yekem bû, ez rastî tiştekî wisa dihatim. Lewra jî ev dîmen pir ji min re balkêş hat. Erê, dem nîvê şevê ye. Stêrk li ezman dibiriqin, dem bi dem





kir. Ji ber di rewşên wisa de av xwînê ron dike û ev jî dike ku xwîn zêdetir biherike.

Di birîndariyande herî zêde av tê xwestin. Hebe tunebe av e. Tîbûn dertê asta herî jorîn. Lê berevajî vê ya herî ne baş jî av e. Lê israra avxwestina Serdar berdewam dikir. Jixwe tîbûna min ne hewceye ez bahs bikim. Ji duh û pê de dilopek av neketibû qirika min. Lêvên min jî hem terikîbûn hem jî qalik girtibûn. Hinavê min dişewitîn. Min jî ji ava bîdonê qurtek vexwar. Hesteke wisa xweş bû ku, mîna ku ez ji nû ve jidayîk bûbûm. Fena şîrê dayîkê bû...

Êdî em derengî diketin. Pêwîst dikir ku em bikevine tevgerê. Divê me xwe bi lezgînî avêtina piştî sirtê li hember me. Deqeyek jî deqeyek bû. Çi deqeyek, çirkek jî bo me jiyanî bû. Bi vî awayî me Serdar girt navbera xwe û em ketin rê. Piştî ku em gihîştin piştî gir, ez û hevalê Qendîl zivirîn çepera xwe ya ku hevala Nûjîn jê berpirs bû...

Seat dihate dozdehan. Roj tam bilind bûbû û yekser li ser serê me bû. Ji aliyekê ve tîna rojê û ji aliyê din ve jî tîna kevir û latan. Jixwe tîna pevçûnê ji hemûyan zêdetir sotîner bû. Di bin vê qileqijê de em gihîştin cem hevala Nûjîn û pê re jî bi lezgînî min çepera xwe girt. Hemû hevalan serê xwe bi şûtikên leşkerî pêçabûn. Li ser vê yekê min jî serê xwe bi şûtikê girê da. Min ji şûtika xwe parçeyek jêkir û min porê xwe pê girê da. Ev serî girêdan û porpêçan jî xulikdariya hevala Nûjîn bû. Cara yekem bû ku li tiştek wisa rast dihatim. Sedema porgirêdana bi şûtikê jî ev bû ku, por an serî bi tevahî di nava tahtan de zêde dîmen dida ango ji hêla dijmin ve baş dihate dîtin.

Lê nebû qismet em bibin mêvanê axa sar a dayîmî. Gotinên hevala Nûjîn gelek ji van hestên qerisî avêtin aliyekê. Ne tenê gotinên wê, sekna wê jî tev de yê fermandareke jin a serwext bû. Di hundirê min de baweriyeke mezin da çêkirin....

Piştî ku me hevala Nûjîn dît û ew sohbeta wê ya bi bandor ku ez ê tu carî ji bîr nekim kir, ez bi hevalê Serdar re mijûl bûm. Bi gotina hevalê Serdar min ji çenteyê wê pembû û tendiryod derxistin. Bi vî awayî an bi dengê Serdar ez ji nava nîgaşan derketim û vegeriyam jiyana rastîn. Di wê navberê de min ji hevalê Qendîl pirsî, ka gelo li cem wî av heye an nîn e.

Lê rewşa ku em ketibûnê û pirsa ku min kir, kir ku dilê bi me bişewite. A rast dilê me, me bixwe li xwe dianî. Li ser pirsa min, hevalê Qendîl; " Weleh hebû, lê ez nizanim, bê li ku maye, ka deqeyek ez herim mêze bikim, ez ê zû vegerim"

Di vê navberê de ez bi dermankirina birînê mijûl bûm. Pê re jî min henekan jî dikir, da ku moralê Serdar bînim cî. Di dest me de jixwe tenê şûtika me hebû û min bi qasî çend bihostan jêkir û pê birînê girê da. Hê ez bi birînê re mijûl dibûm, hevalê Qendîl hate hawara me û bi bîdonek avê ku nîvco bû vegeriya.

Bi dîtina bîdonê re hevalê Serdar demildest xwe çengî avê kir. Lê nedibû ku di vê rewşê de ez avê bidimê. Min jî bêyî ku ew bîdonê avê bigire, bi destê xwe min avê kêm kêm dayê. Yanî hema mirov dikare bêje, kêmek qirika xwe şil





dengê topên hawanî tê. Em jî di kurtecivîna nav Katoyê de ne. Pir xerîb bû ev dîmen. Lê gava şerê duh dihate bîra min, pêwîstiya civîneke kurt xwe ferz dikir. Min guhê xwe baş vekirin û çavên min jî li reşê fermandar e. Ji ber tarîtiya şevê, dîmenê rûyê hevalê Cemal baş diyar nedibû. Lê gava dest bi axaftinê kir, hemû hişê min çû ser axaftina wî. Vê carê jî wekî her car bi axaftina "hevalno!" dest bi civînê kir.

"Hevalno! Wekî hûn dizanin me pîlansaziyek çêkiribû. Lê ev pîlan wekî ku me xwestî pêk nehat. Sedema vê piştre em ê gufûgo bikin. Piştî ku pîlan neçû serî, me biryar girt ku em Katoyê berdin û vala bikin. Hûn hemû jî vê yekê dizanin. A niha ez baş dizanim ku gelek pirs di serê hevalan de digerin. Serê van pirsan de pirsa "Em çima vegeriyan Katoyê tê?" Bi kurtî sedema xwe ya bingehîn ev e; me li cîhaza bêtêlê yê dijmin guhdar kir. Em di cîhazê de fêrbûn ku, dijmin her der dorpêç kiriye. Hemû rê xistine bin kontrolê û kemîn vedane. Ferman ji tevahî leşkeran re hatiye dayîn ku di kemînan de hişyar bin. Lê sedem ne tenê ev e. Sedema dinê ev e ku, şev dereng bû. Hêza me jî giran e. Hejmar zêde zêde ye. Ne ku me nekarî em Katoyê berdin. Me dikarî, lê ciyê ku em pê ve biçûya piraniya xwe zozan in, rût in û ji bona pevçûnê pir zêde baş nîn in. Lewra ger rewşeke pevçûnê çêbûbûya wê rîskeke pir mezin bi xwe re bianiya û çi hêz biketa pevçûnê wê bi windahiyên mezin re rû bi rû bimaya. Li ser vî esasî me biryar girt em vegerin Katoyê. Di Katoyê de herî kêm mirov dikare bêminet şer bike û li ber xwe bide. Dijmin jî wê bi rihetî nikaribe bi ser me de bê, lê dîsa jî ez dibêjim; pêwîst e rêzik û ziraviyên şer wekî saetê bişixulin. Ji bo vê, ger me berê îhtîmala şer datanî, ji niha û

pê ve em ê vê îhtîmalê ji holê rabikin û ez zelalî dibêjim, ji sibê de şer e. Hem jî şerekî bêhempa ye. Dijmin dixwaze hêza me tev têbixe nav şer de û me bike hedefeke vekirî ji teknîka xwe re. Jixwe bê teknîk nikare were ser me. Em ê jî neyên lîstika dijmin. Hûn hêza me dibînin, ji sed hevalî zêdetir e. Ji van hevalan teva tenê bîst heval wê ji bona pevçûn û şer çeper bigirin. Wê şer li ser milê van bimeşe. Ez di wê baweriyê de me ku, her bîst hevalê me wê bikaribin bibin bersiv ji êrîşên dijmin re. Tenê ya pêwîst heval li hev hişyar bin. Wê demê tevahî êrîşên dijmin wê bêencam bimînin.

Li derveyî bîst hevalan li vir bimînin. Wê tevahî hevalên din biçin xwe bidin ciyekî saxlem. Li gorî pêwîstiyan wê alîkariya tê xwestin çêbibe. A niha piştî ku hevalan sererastkirin çêkirin, hevalê ku li vir bimînin pêwîst e biçin çeperên xwe baş amade bikin. Pêwîst e heval tev li ser tetîkê bin û wê di mesafeya bombeyê de li dijmin bidin. Ji ber ku gava ku dijmin bikeve mesafeya bombeyê, nikare bi rihetî teknîka xwe bikarbîne. Li gorî guhartinên ku çêbibin em ê perspektîf û fermanên pêwîst bigihînin hevalan. Em di vê hêlê de bi tevahî hevalan bawer in û ji niha de serkeftinê dixwazin."

***

Bêhna şer di tarîtiyê de difûriya. Her diçû dengê daholên cengê ji dûr ve olan didan. Em ê bi du ciyan çeperan bigirin. Her ciyek wê sê heval bin. Cihê me yê herî pêş, ez, Rêdar û Serdar bûn. Çepera me ya herî pêş e. Ciyê din jî Mazlûm, Bargiran û Xişman bi sed gavekê li pêş me çeperên xwe çêdikirin.





Dema hevala Nûjîn gihîşte me, bêyî ku tu tatêlek çêbike bi xwînsarî pirsa rewşa heyî kir û got;

-Ma birîna heval giran e?

-Na na heval, zêde giran nîn e, lê pêwîst dike ku em hevalê Serdar ji vir dûr bixînin.

-Temam e heval. Jixwe em rewşê ji nêz ve dişopînin. Rewş her ku diçe giran dibe. Pêwîst e hindekî em hişyar bin. Bila hevalê Serdar bêhna xwe veke. Em ê wî derbasî milê pişt bikin. Ew der ewle ye. Lewra em hindekî destê xwe sivik bikin. Çi dibe, çi nabe. Her kêlî dibe ku giraniya şer bikeve ser vê derê. Loma bi lez birîna heval baş girê bidin. Ez ê vegerim çeperê nav hevalan. Ez li wir bim wê baştir be. Temam e. Hevalê Qendîl û hevalê Erdal, piştî ku we heval bir milê din, vegerin vir. Em ê çeperê xwe û ji nû ve sererastkirina peywirên xwe ji ber çavan re derbas bikin. Hadê çavên min, lez bikin!

Hevala Nûjîn, bi gotina xwe ya "hadê çavên min" wekî bayekê ji cem me çû. Gotinên hevala Nûjîn gelek bandor li me kiribû. Cara yekem bû ku min didît hevalek keç wisa xwezayî nêzîk dibû. Bi taybetî di rewşeke wisa ku tev şer û hemû dengê teqîn û vizeviza fîşekan.

Belê, heta niha hemû hişyarî teqîn û qêrîn, lê gotinên Nûjîn rewşeke şer û rastiya şer. Heta niha pêvojoya ku me jiyan kir, hemû tevzînokên sar bi ser laşê min de diçûn û dihatin. Perdeyên dilê min ev du roj bû wekî pêlên deryayê geh bilind dibûn geh nizm dibûn. Me mirin bi çavên xwe dît, di nava mirin û jiyanê de me sêkerat kirin.

ev çend sal bû di nav gerîla de bû. Ew fermandarê mangê bû. Di zarokatiya xwe de gelek di zirûfên zehmet de jiyan kiribû. Êşên gelê başûrê mezin, gelê me yê di Enfal û Helepçeyê kişandibû. Wî jî tevgera PKK'ê wekî xelasiya gelê kurd dîtibû. Ev du sal bû di nava yekîneya bi tevger de cî digirt. Ji aliyekî din ve rengekî cuda dida yekîneya me. Piştî ku hevalê Qendîl li birîna hevalê Serdar nihêrt;

- Hevalê Erdal, ka çeka hevalê Serdar bigire, ez ê wî bidim pişta xwe, da ku em zû biçin.

Min vê carê ji hevalê Serdar re got, qe nebe vê carê çeka xwe bide. Zêde serhişkî neke. Jixwe em gihîştin hevalan, kêmek ma. Min çeka wî ya hungarî ji dest wî girt. Hevalê Qendîl jî ew da pişta xwe, heçku dayîkeke penaber kurê wê li pişta wê be. Ewqasî dîmeneke xemgîn bû. Bi vî halî, me xwe gihande cihê hevalan. Piştî ku em gihîştin hevalan, hevala Nûjîn bi bez hate cem me.

Hevala Nûjîn keçeke pir delal bû. Rûyê wê girover û bi parçeyek şûtikeke leşkerî porê xwe yê xelek girê dabû. Bejna wê tijî bû, lê dema ku tevdigeriya gelek sivik bû. Bi xwe ji Şirnexê ji gundê Xirbikê Bestê bû. Gundê wan jî li kêleka Mêrgumara herêma Bestayê bû. Ew jî pir ji kevn de tevlî refên gerîla bûbû. Herî dawî jî ji Dibistana Navendî ya Partiyê li Sûriyê, ji Qada Serokatî hatibû. Mirov hêza wê ya ku ji cem Serokatî girtibû, di her nêzîkbûn û tevgerên wê de didît. Erka wê fermandara taximê bû. Di dibistana navendî de, di ewlekariya Serokatî de peywir girtibû. Dema hatibû jî pir bi hêvî hatibû û li ser daxwaza xwe derbasî Eyaleta Botanê bûbû.





Piştî ku me ciyê koma xwe kontrol kir, me biryar girt ku em di du çeperan de bi cî bibin. Di çepera li ser sirtê, Rêdar û di çepera bi deh gavan jêrtir ez û hevalê Serdar bûn. Hîna çar-pênc saet ji berbangê re maye. Me dest bi çêkirina çeperên xwe kirin. Di saetek diduyan de me çeperê xwe temam kir. Sibeyî em ê di van çeperan de şerekî bêhempa bikin. Lê, di dema ku me çeper çêdikirin, diyar dibû ku, rewşa Rêdar di aliyê derûnî de zêde ne baş bû. Ev ne nerihetiya wî di pitepita wî de diyar bû. Gelek tişt di ber xwe de digot; "Ev çi ye? Ma çima plan hate guhartin?" Me destpêkê digot qey nexweş e. Lê em fikirîn ku mirov nexweş be mirov ewqas pitepit nake. Serê min û Serdar ji ber pitepita wî bûbû fena defê. Bes çi dibû bila bibe, wê sibeyî şerekî mezin li dar biketana.

Rêdar got ku; ez ê xwe dirêj bikim. Di vê navberê de ez û Serdar ketin çeperê û em bi hev re bi dengekî nizm bi pistepist axivîn. Me dengê hev dibihîst, bes me rûyê hev û din nedidîtin.

Hevalê Serdar; tu dizanî heval, rewşa hevalê Rêdar pir baş xuya nake, nerihetiyek di hundirî wî de heye. Min jî ev rewş ferq kiribû. Ma me yê çibikirana? Jixwe rewş awarte bû. Hevalan çeperên xwe qedandibûn. Em li benda dijmin bûn ku, bikevin dûrbûna narîncokên destan. Ji dûr ve şer dest pê bike, wê dijmin bi teknîka xwe me tengav bikirana.

Serdar çeka wî di dest de, bi lêhûrbûneke kûr di bizmikê nîşanê de nîşan girtibû jî. Ez hinek bişirîm. Ka niha bisekine, jixwe tu yê sibehî têrî xwe nîşan bigirî. Tu dizanî

helavê Serdar, ev şer tiştek sosret e. Her çiqasî seyran be jî, lê wisa tiştên derveyî aqil têne jiyandin ku. Carekê me êrîşê girekî dikir. Li her derê fîşek û narîncok diteqiyan û pê re jî dengê tilîliyan jî kêm nedibû. Teqîn û reqîna fîşek û bombeyan, fena dengê dahol û zirneyê bûn. Ez gelek car bûme şahid ku, hinek hevalên wisa destpêka şer, bi heyecan in an pitepit dikin, lê bi destpêkirina şer re, dibin şêr û lêdanên gelek mezin li dijmin dane. Gelek tiştên ku mirov texmîn nake diqewimin. Di vê şoreşê de wisa tişt qewimîne, hiş û aqilê mirov qebûl nake. Hevalê Serdar bi baldarî guhdariya min dikir.

Di asoyên tariyê de li dûriyê temaşe dikim. Ev çar salê min e ku di nava gerîla de me, bi xwe jî bûm şahidê gelek bûyerên bi vî rengî. Berî şer, bivê nevê wê heyecaneke nepenî ku nayê tarîfkirin hebe. Ji vê re dibêjin hestên berî şer. Meseleya wê hinek kûr û dûr e, em bikevin nêv, nema em ê bikaribin ji nav derên. Ez di wê baweriyê de me, ev tiştek gelek asayiyî ye. Ku bi rihê tevgerîn çêbibe, tu tişt nebe asteng. Binêre ez ji Êlihê tu ji Dêrika binxetê yî. Em herdu bi hev re di çeperekê de amadekariya cengekê dikin. Di nava kurdan de ev tişt çênebûye. Mesela ne ez û tu, bi hezaran wekî me hene. Dibe ku rewşên wisa di serhildanên din ên kurdan de jî çêbûbûn, bes a ku di pêşengiya serok de tu car di dîroka kurdan de pêk nehatiye. Serokatî bixwe jî dibêje, min zenga li ser mejiyê kurdan, bi serê derziyê paqij kir. Ger em bi mejiyê berê nêzîk bibin, ne min tu nas dikirî, ne jî te ez nas dikir. Lê tu dinêrî em li cem hev in. Ger em carnan nikarin bibin bersiv jî, ji kêmasiya kesayetiya me ye.





“Hevalê Serdar ma tu berî niha birîndar bûbûyî”

-Rast e. Ev cara diduyan e ez birîndar dibim. Birîna min a berê ne ya topan bû. Di êrîşekê de, fîşekeke xedar li çengê min ketibû, wê demê birîna min ewqas giran nîn bû. Min bi rihetî dikarî xwe li ser lingê xwe bigirta. Lê ev mîrata parçe hêçku ketine nav damarê lingê min. Min digirin. Wekî derziyê tûj in, dizanim min tu pir westand.

-Na hevalê Serdar wisa nebêje, ger ez vê jî nekim ma ez ê çibikim. Tişt nabe jixwe kêmek ma.

Min nehişt ku Serdar hevoka xwe bidomîne. Ji ber ku min dizanî ku gotina pey were çi ye! Ji ber ku ez berê jî bi rewşeke wisa re rû bi rû mabûm. Em ber bi gir ve diçûn.

“Heval min tu pir bi xwe re westand, min li vir bihêle û xwe bigihîne hevalan”

Li ser vê yekê min mijara birîndariyê guharte. Ha kêmek ma, vaye heval li vî çeperên pêş in. Li ser vê yekê hevalê Serdar serê xwe rakir û temaşe kir. Piştî ku çavên wî bi hevalan ket, bişirîneke nerm bi ser rûyê wî de hat. Vê yekê jî kêmekî êşa birîna wî pê da jibîrkirin.

Belê.. Bi qasî çil gavek mabû ku em xwe bigihînin hevalan. Min bang kir. Piştî çavên hevalan bi me ket yekser hevalekî xwe ji çeperê avêt û ber bi me ve beziya û piştî bi çend gavan xwe gihande me û pirsa me kir. Ew heval hevalê Qendîl bû. Ew bixwe ji başûrê mezin bû. Ew ji herêma Garê ji gundê Kafya bû. Hevalekî li ser xwe bû û

dike û li benda me ye. Dengê teqîna topan, vizeviza fîşekan her ku diçû zêde dibû. Bi taybetî ew mîratên obûsan bêrawestan bi gurmegurm diteqin. Zimînî qet ji guhên me qut nedibû.

Saet dihate dehan, rojê bi rengekî berêvarkî li rûyê me dida. Toza cengê di nava eniya xwêdana eniya min de bûbû herî. Lê hevalê Serdar tevlî xwîna jê diçû, pê re jî xwêdan jî dide. Bêhna barûdê difnê me dişewitandin. Ji dû û tozê te digot qey em di palûkeya komûrê de xebitîne. Carnan jî xwêdana şor xwe berdida nava lêvên me û tamek pir nexweş li ser devê me dihişte.

Her deqîqeyeke derbas dibû, me jî çend gav bi milê hevalên parastinê de davêtin. Di rê de car bi car lingê hevalê Serdar dihilpekî, bi hilpekînê re axîneke dijwar ji kezebê davête der. Bi axîna Serdar re kizînî bi kezeba min jî diçû. Min dizanî ku niha ew çiqasî dêşê. Ger min bi halê xwe yê saxlem ewqas zehmetî dikşand, nexasim ew birîndar bû. Lê ez çi bikim, kizîniya kezebê ji êşa dilê min re nedibû derman. Lewra jî min dixwest ku heta ji min were ez birîndariya Serdar pê bidime jibîrkirin. Carnan jî min digote, tu tişt nabe. Tişta nexweş ava me qet tunebû. Ji bêavî qirika me ziwa bûbû û hîn em dimeşiyan.

Tişta herî baş, Serdar hêjayî navê xwe bû. Her tim çirûskên hêviyê ji çavên wî diçirisîn. Bêyî ku tu giraniyek çêbike dimeşiya. Min baş dizanî ku birîna wî gelek gelek ew dêşîne. Lê qet nedigot ka em bisekinin û rûnên. Wekî Rêdar nedikir. Tenê tişta digot, ma gelek maye û li nav çavên min dinêrî. Di bûbikê çavên wî de hêviyeke xweşik hebû. Vê hêviyê di hundirê min de jî hêzek diafirand.





Sohbeta me her diçû kûr dibû, em li ser pêşbîniya tevgerîna dijmin axivîn. Hevalê Serdar; bi qasî ku min dijmin naskiriye, ji tirsan xew li wan heram bûye. Tu dizanî leşker ne wekî gerîla ne, xem û xeyalê wan cuda ne, xeyalên wan hemûyan bê ka kengî vegerin malê. Jixwe leşkertiyê ji neçarî dikin. Faşîst in ku ji mirovantiyê para xwe negirtine hene, bes ev jî kêm in. Piraniya wan bêdil leşkertiyê dikin. Dema ku ji wan re tê gotin operasyon heye, fena ku ziqûmê bidin wan, derûniya wan û nav û dilê wan tevlihev dibin.

Rast bû, her çiqas hevalê Serdar leşkertî nekiribû jî, bes nas û dostên wî yên ku leşkertî kiribûn, gelek bahs kiribûn. Hevalê Serdar berî ku leşkertiya wî bê, beşdarî partiyê dibe. Di pergala artêşên dewletan de, nêrîn û dîtin ne girîng e. Leşker koleyê fermana ye, ewqas! Bes di gerîlatiyê de, ya herî girîng vîna azad e. Nêrîn û ramanê xwe vegotin esas e.

Taht û zinarên çiyayê Kato, li ber wan reş e û niha kezeba leşkeran diqete. Baweriya xwe bi firokeyên xwe tînin. Jixwe tirk ji Katoyê re dibêjin, Çiyayên Tarîtiyê. Jixwe ji dûr ve, di tarîtiya şevê de, kêlî bi kêlî fîşekan eletexmînî davêjin. Bi vî awayî derûniya xwe aram dikin.

Hîna axaftina min di devê min de, hevalê Rêdar bangî me kir, ev çi ye hûn dikin pistepist, bihêlin çend deqeyan razêm. Hişyariya Rêdar fena aveke sar bi me be, em veciniqîn û bersiva “temam” me li asoyên tarî nêrînên xwe tûj kir…

Saet ber bi şevaqa serê sibê ve diçû. Em di çepera xwe de, Rêdar jî li ber zinarekî li kêleka çepera me xwe dirêj kiribû. Hevalê Serdar bi zimanekî nerm û dengekî nizm bang li Rêdar kir. "Hevalê Rêdar ka rabe, dinya kêmek maye ku zelal bibe. Ka rabe dereng e."

Pêwîst bû hevalê Rêdar berî ku dinya zelal bibe biçe çepera xwe. Lê çitîniyek jî ji Rêdar nehat. Ne erênî ne neyînî, ne him ne jî gum. Fena ku di xewa mirinê de raketî bû. Ez bi vê yekê hêrs bûm û bi zimanekî hîn tund min bang kir. "Rêdar! Rêdar! Ka rabe heval. Dinya li ber zelalbûyînê ye. Ger tu niha neçî, tê piştre nikaribî biçî"

Le Rêdar hem di derya xewê hem jî di ya bêxemiyê de xeniqîbû û bi zimanekî bêxem dilê me sar kir û got; "Tişt nabe, ku rewşek çêbibe, ez ê herim ciyê xwe. Hûn keşfê bikin." Her çiqas ez û hevalê Serdar bi Rêdar re mijûlbûn û me israr kir, lê hemû hewldanên me di deryaya bêxemiya Rêdar de xeniqîn. Êdî tu tiştekî ku me bikira jî nemabû. Ji hewldanê me û ji bêxemiya Rêdar tenê acizî kete nava me. Ka em çibikin, "Çav kor e, dest kurt e" tiştekî ku me bikirana jî tunebû.

Ji ber ku ciyê çepera Rêdar pirstratijîk bû, hem parastina çepera me dikir, hem jî di rewşeke awarte de wê xwedî rol bûna. Vê yekê guman bi me re çêkir. Ji ber vê jî hevalê Serdar xwest ku ew li şûna Rêdar biçe çepera wî û ji Rêdar re got ku, madem tu naçî, wê demê tu li vê çeperê bimîne, ez ê biçim şûna te. Lê Rêdar ev yek jî nepejirand û alîkarbûyîna bîksîvaniya hevalê Serdar kire hincet û dîsa gotinên xwe yên berê dubare kir. Êdî piştê vê axaftinê, deryaya nîqaşê hate girtin.





meydana cengê çûne. Ev jî avantejek bû. Heta ku kobra biçin cihê xwe, cebilxaneya xwe dagirin û bizivirin wê qederekê din berbend bikin. Jixwe Mazlûm gotibû, "em ê we biparêzin" Baweriya min jî bi Mazlûm pir zêde bû.

Min çenteyê Serdar avête ser çentê xwe yê li pişta xwe û min çeka wî jê xwest. Lê min çikir û nekir Serdar çeka xwe neda min. Çiqasî min israr jî kir, lê neda û got: "Heval barê te zahf giran e. Ez dikarim çeka xwe rakim. Çi bi destê min were ez ê bikim. Jixwe ez dikanim bimeşim. Tenê tu hinekî alîkariya min bike em ê zû biçin."

Bi israr min careke din çeka wî xwest û min destê xwe dirêjî çeka wî kir. Lê dîsa neda û vê carê jî got ku; "Heval, mirin carek e. Ger mirov mir, bila bi mêranî be. Ma ji vê rojê xweştir em ê bikaribin rojeke şehadetê bibînin, lewre bila çeka min di destê min de be. Ger ez şehîd ketim jî bila çeka min di destê min de be. Tu dizanî, ji bo leşkerekî çeka wî berî her tiştî tê, berî rihê wî çeka wî tê. Ji ber ku çeka leşker rihê leşker jî diparêze. Tu bi xwedêkî israr neke, em biçin."

Gava ku Serdar bi vê birîndariya xwe ve ev peyvên tijî hest rijandin, êdî destê min negirt ku ez çekê jê bixwazim: "Temam heval, madem ku tu ewqasî bi israr nadî, temam e. Lê pêwîst e em hindekî bilezînin. Dema me teng e" Min destekî xwe xiste nav kefa destê Serdar de, di destê min ê dinê jî çeka min a BKC'yê hebû û em bi rê ketin.

Hetanî vê gavê em nêzîkî hevalê Mazlûm wan bûn. Lê niha em paş de diçin û dilê me dimîne li cem wan. Çavên me jî li cihê tîma parastinê ye. Hevala Nûjîn li me temaşe

girantir bû. Lê dîsa jî her ku firsend didît pirsa rewşa me dikir. Çi xweş e ku Mazlûm li rewşa me pirsî. Cihê wî di dilê min de çêdibû. Belê berî niha parastina me kirin û me ji wê eniya tengavbûyî de xelas dikirin û li halê me dipirse.

Mazlûm erka fermandartiya xwe baş dizanîbû. Bi wêrekiya xwe, wêrekî dida me jî. Çavên wî şîn, rûyê wî sorik, her tim lêvken bû. Di hundirê wî de mêrxasiyek kurdînî dijiya.

Li ser pirsa wî ya, ka çi bû? Min bersivand û min got ku hevalê Serdar di rahnê xwe yê çepê de birîndar bûye. Lê niha kêmekê bi ser xwe ve hatiye. Ka em çibikin, tu çi dibêjî?

- Heval tu ecele neke, hevalê Serdar bigihîn cem girê parastinê, lê zû bikin. Dijmin qederekê pêş de hatiye. Heta ku hûn dikarin lez bikin, xwe bigihînin ciyê parastinê.

Min jî got temam û min berê xwe da Serdar û birînên wî. Min ji xwe re digot ”Çi dibe bila bibe, pêwîst e ez Serdar bi silametî bigihînim hevalan” Lê ez baş dizanim ku ew ê hêsan nebe. Tahtên Katoyê pir asê û nexweş in. Jixwe ji wan tahtan ên sax bi rihetî nikarin bimeşin. Nexasim birîndar hebin, hingê asta zehmetiyê du sê caran zêde dibe. Mesafeya di navbera me û cihê tîma parastinê de, herî kêm du sed gav hebû. Ger ne zêdetir be jî ne kêmtir e. Ger ji vê dûrbûnê di rewşê tenha de çend deqîqe dixwar, di rewşa birîndariya heyî de wê hîn zêde dem bixwe. Ev yek jî bi meşa hevalê Serdar ve girêdayî ye. Tişta baş, rê berwar bû û ji milekî dinê ve jî kobrayên şer hê nû ji





Şeveqa sibê, perdeya tarîtiyê radikir. Diviyabû em êdî tevnegerin. Êdî tevgereke bêwext, wê ziraviyên şer û rêzikê wê binpê bike. Lewra em nema bi Rêdar re jî axivîn û di çepera xwe de me xwe bêdeng kir. Her deqîqeyek ku derbas dibû, me pêşiya xwe baştir didît. Serdar ji min dûrbûn xwest, dûrbîna li cem min jî yeke Sedamî, lê bi aliyekê bû. Ji ber ku çavekê wê xera bûbû, min jî ew jêkiribû û aliyê wê yê saxlem li cem xwe rakiribû. Bi xwestina Serdar re min dûrbîn dirêjî wî kir û min guhên xwe da derdorê. Di hundirê min de hîseke ecêb û xerîb diçû û dihat. Qepeqepa kewê gozelê dihat. Lê ez pir zêde bi vê hestiyar nebûm. Ji ber ku di hundirê xwe de ez ji vî dengî re ne amade bûm. Texmîn û hizrê min tev li ser şer bûn. Lewma qepeqepa kewan ji min re wekî dengê firokeyan dihat. Bes tu deng nîn bû.

Piştî ku tîrêjên rojê ji palê pişta Katoya Navîn hilatin, hevalê Serdar dûrbîna yekçavî da ber çavên xwe û di kuleka çeperê re yekser berê wê da cihê ku leşker şevê din lê mabûn. Ciyê wan jî li Deriyê Hirçê di nav Katoyê de bûn. Ji ber ku ciyê herî nêzîkê me ew der bû, loma jî timî guhên me li derdorê bû. Çavên me jî li Deriyê Hirçê bû. Belê, refek ji leşkeran şevê dî hatibûn li wir lîsê xwe çêkiribûn.

Berî ku pirsa li ser zimanê min xwe bavêje der, bersiva wê ji nav lêvên Serdar sînyal da guhê min û got, “Hevalê Erdal, dijmin hîn li Deriyê Hirçê ne. Xuya ye ew jî keşf dikin. Divê em dîqet bikin” Vê axaftina Serdar hişt ku em bêhemdî dawiya xwe bi erdê ve bixişînin û di çeperê xwe de xwe mit bikin. Lê ji ber ku ev tişt di texmînê me de

hebû, loma tu guhartineke cidî di hestê me de çênekir. Tirs û gumana hundirê me ne ji dîtîna leşkeran, ji ber bêxemiya Rêdar bû. Hîna jî Rêdar di bêxemiyê de bû. Hayê wî ji leşkeran û rewşa wan tunebû. Hevalê Serdar rewşa heyî ji Rêdar re ragihand. Piştî ku Serdar rewşê vegot, yekser tatêla Rêdar zêdebû. Ev jî hişt ku dest bavêje dûrbînê û li derdora xwe binêre. Lê keşfa wî jî bi xemsarî xuya dikir û di ber re jî digot, “Ciyê me zêde xweş nîn e” Derûniya wî zahf tevlihev bûbû, mirûzê wî tirş bûbû.

Saet dihate 6.00’an. Êdî her der di bin bandora tava rojê de bû. Tenê sîberên tahtan reş dikirin. Her der bi ronahiyê re xweş xuya dikir.

Dijminê li miqabilê me jî tevgereke biçûk di nav de çêbû. Vê tevgerê hişt ku çekên destên wan de biteyisin. Êdî ne bi dûrbînê, bi çavan dihatin dîtin. Di vê navberê de, dengê firokeyan û pirepira wan li ezmanê hêşîn veda. Dengê firokeyan berê me ji leşkeran guhezt. Em herdu jî li ezmana digerin. Çavên min li ciyekî, yê Serdar li ciyekî din. Li ser pirepira perwaneyên firokeyan, çavên xwe li ezmanan digerînin. Heçku em di pêşbirka bê ka kî zû wê bibîne de bûn, wekî her carê hevalê Serdar berî min destê xwe li hilê da û got; “Wa haye” û bi destê xwe nîşanî milê Çele Cengê kir.

Belê, firokeya ku me bahs kir, ji yekê derbasbûn. Hejmara wan çû çaran. Dengê wan wekî dengê ewrên biharê li nav hev diketin û her yekê li ciyekî leşker datanîn. Li gorî ku em di qirika Çele Cengê de didîtin, me fêm dikir ku rabûna wan ji Tûgaya Qomandoyan a Çiya ya Colemêrgê tên.





Di berxwedaniya Çiyayê Katoyê ya sala 98’an de di topavêtinên dijmin de hevalê Serdar birîndar bûbû. Her ku min alîkarî bi hevalê Serdar dikir, kezeba min ji ber wî dişewitî. Ka Serdarê berê, mala min xira be. Xwîneke sor î zelal ji birînên wî diherikî. Xwîn dilop dilop ji birînê diniqutî ser axê. Cilên wî yê zerî zagrosî kunkunî bûbûn. Lê baş bû ku birîna wî ne di cihê hesas ê mirinê de bû û çar parçeyên roketê lêketibûn. Min parçeyek ji şûtika xwe jêkir, xwîna wî paqij kir û birîna wî girê da. Min hindekî cihê wî xweş kir, li ser piştê min ew dirêj kir. Min dikir û nedikir kela giriyê min nesekinî. Hêdî hêdî çavên Serdar vedibûn, ez li raserî wî bûm, destê wî di destê min de bû. Piştî ku çavên xwe vekir, yekser çavên wî bi çavên min ê şil ketin û got.

-Heval, ez birîndar bûm. Înşelah tiştek bi te nehatiye.

“Na, Na tiştek bi min nehatiye. Xema min nexwe. Ka hindekî hêza xwe kom bike ez ê xeber bidime Mazlûm wanan.” Gotina hevalê Serdar tevzek bi bedana min de anî xwarê. Di vî halî xwe yê birîndar de, li halê min dipirsî, ev yek min gelek hestiyar kir.

Hîna em di nava vê kelecanê de bûn, berî ku ez bang li Mazlûm bikim, wî bang li me kir, “Çi bi we hatiye!”

Vê pirskirina Mazlûm ez pir dame hizirandin. Ji aliyekê ve ez kêfxweş kirim. Ji ber ku tiştek bi wan nehatibû. Ji ber ku bi qasî ku kobrayê li cihê me dida, zêdetirîn jî li cihê wan jî dida. Min ji xwe ve digot pêwîst e fermandar wisa be û di eniya şer de li herî pêş be. Rewşa wan ji ya me

Erê penc sal berê wekî van çaxan payîz bû. Em li Dêrikê li gund, bi hev re di perwerdehiyê de bûn. Em hê nû fêrî jiyana rêxistin û partiyê dibûn. Pênc sal berê warê me xaniyekî kerpîçî bû. Em bi hêvî bûn ku rojekê em bibin gerîla. Hemû hesret û xwesteka me çiya bûn. Me digot, em ê herin welat.

Kê bawer dikir ku rojek were em bi hev re têkevin nava cengeke wisa de û di yek tîmê de mil bi mil di çeperên herî pêşde em bi hev re bin. Loma jî gotineke pêşiyan heye. Tam jî li gorî rewşa me ye. "Çiya bi çiya nakeve, lê çav bi çav dikeve" Ev gotina pêşiyan îro di van çeperan de rastiya xwe selmande. Wexta cara yekem min di nav gerîla de ew dît, min bi hestekî zahf germ ew hemêz kir. Wî jî wisa ez hemêz kirim. Carnan tişta herî xweş ku mirov texmîn nake çêdibe. Jiyan her tim neyînî nîn e. Pirî caran tişta herî xweş tê pêşberî mirov. Wekî hev dîtina min û hevalê Xişman. Ew hevdîtin niha jî her cara ez dengê wî yî koçerî dibihîzim di hundirê min de lêdide. Lê îro şer e, şerekî bêminet e. Belkî jî ew banga wî ya dawî be, hîna jî tiştek diyar nîn e.

Di vê navberê de dengê çekan li jêr me li ciyê tîma hevalê Şêro lê bû pir zêde bû û pir di nav hev de xuya dikir. Me fêm kir ku dijmin li cem wan ketiye dûrbûneke pir nêzîk de. Bi zêdebûna dengê fîşekan re jî kobra di ser me de tûrên xwe diavêtin û şelîta fîşekên agir vala dikirin. Rasterast çeperên me hedef dihatin girtin. Şikir yek ji wan îsabet nekir. Agirê ji lûleya doçkaya kobra wekî agirê ji devê ejderhayekê difûriya di bin ezmanê şînî de…

***





Hîna tu şer û pevçûn dest pê nebûye. Lê li gorî ku heta niha sê firoke bi hev re dihatin herêma operasyonê, xwedê dizane şer dest pê bike. Wê çend herin û werin. Jixwe ji niha ve sê bi sê hevdu diguherin. Sê diçin sê tên. Hindekan çekê giran datanîn, hinek ji wan leşker datanîn, hinek jî erzaq belav dikirin. Her wiha di her girekî de gelek leşker danîn û du-sê refê leşkerên bi piyade xwe gihandin leşkerê li Katoyê. Ji ber ku ev planê dijmin ji nav planê tunekirinê yê 98'an bû, loma her tim hêzên wan ê cîgir amadebûn û yekîneyên wan ê firok her tim amadebûn. Niha jî tev sewqî herêmê kirine. Her ku firoke diçûn û dihatin, hewaya şer hêdî hêdî dihate çêkirin. Bêguman ev rewşa heyî hemû hevalên me yê din jî dibînin û dinirxînin û kefa destê xwe dixwirînin. Me jî kefa destê xwe dixwirand û bendewariya ku heyî em ji hundir de dihelandin. Her wiha çawa ku derziyê saetê ji milê rastê ber bi çepê ve dizivirî û dikire tirkînî, çavên me jî li çep û rastê temaşe dikir. Tirkîniya dilê me jî wekî tirkîniya derziya saetê lêdida. Ne zede ne kêm.

A niha saet ber bi 8.00'an ve tê. Di tevgera leşkerên di nav Katoyê de guhartineke cidî çêdibû. Hemû leşker jî ber beran û keviran derketin. Cilên wan reş dikirin wekî moriyan bûn. Ji nivî wan zêdetir çentê xwe dane pişta xwe û bi vî rengî belave yek bi yek xwe di nav tahtên Katoyê de berdan. Berê leşkeran yekser li ciyê me ye. Hingê kronometra saetê kete tevgerê û nîşaneya destpêka pêşbirka şer da.

Piştî ku me tam zelal kir ku berê leşkeran li çeperên me ne, careke din me dawiya xwe bi erdê ve xişand, destê

xwe dirêjî çekên xwe kirin. Jixwe di şeva berê de, me fîşek dabû ser. Serdar ji min re got; “Heval heta nekevin nêzbûna narîncokan, em lê nedin”

Li gorî ku leşker saet di 8.00’an de ketin tevgerê herî kêm heta ku bigihîjin çeperên me wê saetek derbas bibe. Ev yek jî dîsa baş e. Hê ji cengê re saetek heye. Ji ber ku pevçûnên roj pir zêde li aliyê me nebûn. Lê ev pevçûn neçarî bû. Dîsa ger heta niha tu pevçûn ne qewimiye, ev tê wê wateyê ku heta niha dijmin tu dîmen ji me nedîtine. Loma heta niha her tişt li gorî planê diçû.

Piştî van dîmenan û van guhartinan, me xwest em Rêdar agahdar bikin. Vê carê min Rêdar agahdar kir; “Hevalê Rêdar, dijmin di nava Katoyê de kete tevgerê. Berê wan jî rasterast li çeperên me ne. Lê hîna qederekê dûr in. Meşa wan pir giran e.”

***

Êdî ceng destpêkiribû. Li her dera Kato dengê reqereqa çekan olan dida. Piştî ew kêliyên dijwar min û hevalê Serdar bawer nedikir ku em bi saxlemî gihîştine çeperên xwe. A rast min jî gelek zehmetî kişand. Vê carê gelek cuda bû. Hîna em di nava sohbetê de bûn. Vê carê hevalê Xişman bi dengekî nîvkoçerî bang kir û got; “Heval tedbîrên xwe baş bigirin. Kobra hatin” Gotina hevalê Xişman peroşiyeke bê ser û bin xiste nava dilê me û hevalê Serdar bersiv da.

Rewş gelek cidî bû, pêwîst e em gelek hişyar bin. Ev demeke xweş e, şer destpêkiriye. Tê bibînî, hîna dijmin pir





zêde di pêş de ne hatiye. Newêrekbûna wan xwe daye der, ev nahêle ku zêde di pêş de xwe berdin. Hemû hêviya wan jî ew kobrayên şer in. Dijmin hemû hêza xwe di teknîka xwe de dibîne. Her tim di bin siya kobrayan de pêş de tên. Ev teqtîka wan a her carê ye. Niha jî wê dixwazin heman tiştî bikin. Lewre divê em bikaribin hem xwe biparêzin hem jî di ber êrîşên kobrayan de jî bersiv bidin leşkeran. Herî kêm pêşde hatina wan giran bikin. Ger em vê yekê nekin, wê hevalê me yê li pêş gelek tengav bibin. Heta dibe ku nikaribin çeperên xwe jî biparêzin. Mêze bike, wan em parastin, heta ku me gihande çeperên li paş. Niha jî dor hatiye me ku em alîkariya wan bikin.

Min serê xwe hejand û got erê. Hevalê Serdar pirseke din ji min kir, tu hevalê Xişman nas dikî ne wisa? Wê demê hevalê Xişman mîna xeyalekê di ber çavên min re çû û hat. Hevalê Xişman bejndirêj bû. Xwediyê rûyekî kardînî û rû genimî bû. Bi çavên xwe yê reşîbaz, zû bi zû tişt didîtin. Hizrê wî yî bihîstinê gelek xurt bûn. Şaneyeke reş î xweşik li ser rûçikê wî yê rastê hebû. Bi lewadiyeke xwezayî ve ji dayîk bûbû hevalê Xişman. Min pir ji nêz ve ew dinasî. Di pratîkê de car bi car me bi hev re stranên koçerî digotin. Di nav refê gerîla de li gelek ciyan geriyabû. Lê hîna jî devoka xwe ya koçerî ji bîr nekiribû. Tevlîbûna min û wî bi hev re çêbûbû. Sal jî 93’ê bû. malbata wî pir welatparêz û niştimanperwer bû. Di welatparêziyê de gihîştibû asta milîtantiyê. Ciyê wî jidayîkbûnê navçeya Dêrka Hemko bû. Dêrika Hemko, navê xwe yê tevgerê ji navê xalê xwe yê şehîd girtibû. Pir kedkar bû. Pişta mirov ji karê wî rast bû. Aliyê wî yî kedê gelek li pêş bû. Vê yekê jî dihişt ku peywir û erka xwe bi serkeftî pêk bîne.